



K. T.

Zanîngeha Artukluyê ya Mardînê

Enstîtûya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

***Xwêndinewey Dû Romanî Pêşbaziya Çîrokên  
Neqediyayî û Gabor be Gwêrey Teorîy Rexneyî Louis  
Althusser***

Seyed Mazhar Ebrahimi

(17711011)

Doç. Dr. Hayrullah Acar - Doç. Dr. Seyed Bakhtiar Sadjadi

Mêrdîn – 2019

K. T.  
Zanîngeha Artukluyê ya Mardînê  
Enstîtûya Zimanên Zindî  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsans a Bilind

**Xwêndinewey Dû Romanî *Pêşbaziya Çîrokên*  
*Neqediyayî û Gabor* be Gwêrey Teorîy Rexneyî Louis  
Althusser**

Seyed Mazhar Ebrahimi  
(17711011)

Doç. Dr. Hayrullah Acar - Doç. Dr. Seyed Bakhtiar Sadjadi

Mêrdîn - 2019

## PÊŞGOTIN

*Berztirîn hevîyazî û taybetmendîy mirov, nafermanî ye.*  
(Oscar Wilde)

Mijarî têzî berdest, pirsî Kurd e be pêdagirî le ser pirsî here girîngî ziman. Kurdan, be damezranî sîstemî dewlet-netewe lem nawçeye da, tundtir le caran, kewtine ber heşey hemelayene û lem nêwe da, ziman, zortirîn zextî kewte ser. Le parçe ciyakanî Kurdistan da, bo nimûne Bakûr û Rojhelat, êstaş le zorêk le mafe zimanîyekanyan bêbeş in û zimane serdestekan tengyan be zimanî dayikî helçinîwe. Bo tawtwêkirdinî em pirse girînge û şewey heşûkewtî her dû layenî baladest û jêrdest, dû roman le dû nûserî parçeyên berbas hebijêrdiran û dirane ber tîşkî têgehe rexneyîyekanî Althusser. Em çeşne lêkolînewane detwanêt astî zanyarîy gel bibate serewe û lem nimûneye da, dekarêt bibête hoy hestyarîy ziyatirî zimanî. Be witey Althusser, têgeyiştinî rexneyîyane le îdeolojî, debête hoy hoşyarîy cemawer û bem çeşne, gel helî rewandinewey îdeolojîy zal be dest dehênin.

Şiyawî amaje ye ke binefetî teorîkî em têze le ser witarî “Îdeolojî û Dezga Îdeolojîkekanî Dewlet” le kitêbî *Lenin û Felsefe û Witarekanî Tir* (1971) damezrawe. Be watayekî dîke, jêderî serekîy xwêndinewey dû romanî berbasî têzeke em witarey Louise Althusser e; boye kemtir awîrman le nûsînekanî tirî nawbiraw dawetewe. Eîbet le şiwênî pêwîst da, be mebestî lêkdanewe û rûnkirdinewey riwangekanî em bîrmende, le berhemî kesânî dîke û her wehaş berhemekanî tirî xoy kelkman wergirtûwe. Pêwîst e eweş bilêm ke wergêranî boçûn û riwanganî Althusser û ravekaranî bîrî ew, bo nûsînî beşî çîwarçêwey teorîkî em têze le estoy xom da bûwe û bo em mebeste yarmetîm le mamostayanîş wergirtûwe.

Lêre da be pêwîstî dezanîm spas û pêzanînî xom pêşkeş be ew kesane bikem ke le nûsînî em têze da yarmetîyan dam. Zor spasî beîêz Doç. Dr. Hayrullah Acar dekem ke le pê naw serxistinî em erke da alîkarîy kirdim. Pir be diîl spasî mamostay lêzan, beîêz Doç. Dr. Bakhtiar Sadjadi dekem ke Althusserî pê nasandim û şewey zanistîyaney nûsînî têzekey bo şirove kirdim. Spas û pêzanînim bo beîêz Prof. Dr. Abdurrahman Adak, serokî beşî masterî ziman û çandî Kurdî û berêz Doç. Dr. Ayhan Tek Geverî mamostay ziman û wêjey Kurdî le Zanistgey Muş Alparslan û her weha hemû mamostayanî hêjay beşî Kurdîy Mêrdîn Artuklu. Her wisa spas û

pêzanînim arastey berêzan kak Eyûb Sûbaşî, xuşke Zeyno Beledê û kak Îbrahîm Şadiman dekem bo alîkarîyan le wergêianî kurtey Turkî û Îngilîzî da. Destxoşî le rajey maîperî kurdnus.com dekem ke yarmetîm le nermamêrî bigoî elifbêkeyan wergirt. Eîbet em bigoie hêşta hendêk kemûkûî û kêşey heye; boye bo seriastkirdinewey helekan be naçar çend car be deqeke da çûmewe û her weha goiankarîm le şêwey hendêk pîtîş da kird.

Diwa spasim bo "Hêvîn" û "Hêjîn" û hawjîn û dê û bira, ke lexoburdûwane, katekanî geme û geşt û geian û serdanyan pê bexşîm û erkekanyan bo sûk kirdimewe, ta bitwanim em vekolîne le katî xoy da amade bikem. Le kotayî da em têze pêşkeş dekem be hemû mirove yaxî û nafermanekan û her weha be bîrewerîyekanî bawikim.

Mazhar Ebrahimi

Mêrdîn - 2019

## KURTE

Twêjînewey berdest, be zorî, perjawete ser pirsî ziman le Bakûr û Rojhelatî Kurdistan û bandorî îdeolojî le ser pêvajoy besûjebûnî takî Kurd le rûberûbûnewe legel ew pirse da. Bem pêye, romanekanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* nûsînî Şener Ozmen û *Gaboî* berhemî Seyid Qadir Hidayetî be gwêrey çemkgelî ‘îdeolojî’, ‘dezgayên serkut û îdeolojîkî dewlet’ û ‘sûje’ le teorîy Louis Althusser, xwêndirawnetewe. Lêkolîneweke pîşan dedat, hawkat legel serkutî fizîkî, le rêgey dezga îdeolojîkekanewe, pêvajoy perawêzxistinî zimanî Kurdî pêş xirawe. Çiwar dezgay çalakî hawdestî dewlet lem pêvajoye da, be pêy teorîyekey Althusser, maibat, xwêndinge û dezgayên ayînî û mîdiyayî n, ke twanîwyane le çekirdinî sûjey milkeç da serkewin. Em sûjegele, hawkat legel kirdey îdeolojîk, le rêy bekarhênanî serkutewe, zortirîn astengiyan bo sûje serbizêwekan çê kirdûwe. Serlehengên her dû roman, wek sê sûjey zimanparêzî gemarodirawî, xo deparêzin û milkeçî îdeolojîy zaî nabin. Boye, dekewine ber heîş û yekyan be destî sûjeyekî xapênrawî dezgay ayînî dête kuştin û ewanî dîkeş, rêy helatin degrine ber. Sûje gwêrayelekan le her dû deqeke da, le jêr karîgerîy her dû cor dezgay serkut û îdeolojîk da heîsazrawin, belam le deqe Soranîyeke da, serkut zaîtir e. Le deqe Kurmancîyeke da, dezgayên îdeolojîk baladest in û tiwanîwyane sûjey destajoy zimanî be serkewtûyî çê biken; be corê ke, sûjekan bo xoyan, ‘azadane’ rewşî dasepaw berhem dehêninewe. Ke wa bû, be serincdan be hêzî şarawey îdeolojî û tundtîrbûnî serkutî zimanî le Bakûr, deselatî ewê serkewtûwanetir amancekanî pêkawe. Le *Gaboî* da, egerçî helwêstî sûje gwêrayelekan le beramber pirtûkî Kurdî da ta radeyek be ~~her~~ şêwe ye, belam ewan ziyatir le ber tirsyan le dezgay serkut, dijayetîy zimanî xoyan deken û îdeolojî neytiwanîwe be tewawetî mêşkyan dagîr bikat. Be giştî, keşî zaî *Gaboî*, serkut û hîwa ~~ser~~heldan û keşî zaî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, îdeolojî û nahumêdî û doîan e. Serêay emane, peşîmanîy bikujî romanî berbas, le kuştinî serlehengî mamostay û famkirdinî rastîy riwangekanî û milnedanî serlehengên *Gaboî* û serheldanyan le pê naw ziman, pîşanderî berdewamîy berengarî n.

**Peyvên Serekî:** Zimanî Kurdî, îdeolojî, dezgay serkutî dewlet, dezgayên îdeolojîkî dewlet, sûje, pêvajoy besûjebûn, Bakûr û Rojhelatî Kurdistan, *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, *Gaboî*.

## ÖZET

Bu çalışma çoğunlukla Bakûr ve İran Kürdistanı'nda dil sorunu ile ideolojinin Kürt bireyinin bu sorunla yüzleşme sırasındaki özneleşme sürecine etkisine eğilmekte. Bunun için Şener Özmen'in *Pêşbazîya Çîrokên Neqedîyayî* adlı romanı ile Seyed Qader Hidayeti'nin *Gabor* adlı romanı Louis Althusser'in “ideoloji”, “devletin baskı ve ideolojik aygıtları” ve “özne” kavramları bağlamında ele alındı. Çalışma fiziksel baskının yanı sıra Kürtçenin ideolojik aygıtlar yoluyla marjinalleştirme sürecine maruz bırakıldığını göstermekte. Bu süreçte, Althusser'in teorisine göre, devlet ile işbirliği içerisinde dört etkin aygıt olan aile, okul, din ve medyanın itaatkâr bir özne oluşturmayı başardıkları görülmüştür. Bu oluşturulan özneler ideolojik uygulamalarla beraber baskı kullanma yoluyla itaatkâr olmayan özneler için en çok engel oluşturan kişilerdir. Her iki romanın başkahramanları dil savunucusu üç özne olarak egemen ideolojiye itaat etmezler. Bu yüzden tehditle karşı karşıya kalırlar ve bu kahramanlardan bir tanesi dini kurumlar yoluyla kandırılan bir özne tarafından öldürülür. Diğerleri ise zorunlu olarak kaçma yolunu seçerler. Her iki metindeki itaatkâr özneler baskı ve ideolojik aygıtların etkisi altında oluşturulmuşlardır. Fakat *Gabor* adlı romanda baskı daha egemendir. *Pêşbazîya Çîrokên Neqedîyayî* adlı romanda ise ideolojik aygıtlar baskın olup bu aygıtlar Kürt dilini marjinalleştirme sürecinde başarılı olmuşlardır; öyle ki özneler zorla benimsetilen durumu “özgürce” yeniden üretirler. Bundan dolayı ideolojinin gizli gücü ve Bakûrdaki dil baskısının şiddeti göz önüne alındığında Bakûrdaki egemenlerin daha başarılı bir şekilde hedeflerine ulaştıkları söylenebilir. Bununla beraber *Gabor* adlı romandaki itaatkâr öznelerin yazılı Kürt diline karşı olan tutumları *Pêşbazîya Çîrokên Neqedîyayî* adlı romandaki öznelerin tutumlarına bir dereceye kadar benzese de fakat onlar baskı aygıtına karşı duydukları korku ve yıldırma yüzünden dillerine karşı çıkarlar ve ideoloji tam anlamıyla beyinlerini işgal edememiştir. Genel olarak *Gabor*'daki baskın ortam; baskı, umut ve başkaldırı iken *Pêşbazîya Çîrokên Neqedîyayî*'nin baskın ortamı ise ideoloji, umutsuzluk ve başarısızlıktır. Buna rağmen adı geçen romanda hocasını öldüren katilin pişman olması, onun fikirlerinin hakikatini anlaması ve ayrıca *Gabor*'daki başkahramanların yılmayıp dil uğruna isyan etmeleri direnişin sürekliliğinin göstergesidir.

**Anahtar Kelimeler:** Kürtçe, ideoloji, baskı aygıtı, özne, Bakur, İran Kürdistanı, *Pêşbazîya Çîrokên Neqedîyayî*, *Gabor*.

## ABSTRACT

The present study mostly sets out to shed light on the question of language in the North and East of Kurdistan and the impacts of ideology on the process of being subjected for the individual Kurd encountering with the question. Accordingly, two novels, *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* by Şener Ozmen and *Gabor* by Seyed Qader Hidayeti, have been examined with respect to the critical concepts of “ideology”, “repressive and ideological State apparatuses” and “the subject” in Louis Althusser’s critical approach. The study indicates that, the physical suppression, through ideological systems, and the process of marginalizing the Kurdish language have been on progress simultaneously. Cooperating with the State in this process, according to Althusser's theory, four systems including family, school, religion and media have been successful in creating the given up subject. These subjects in sync with the ideological practice have created obstacles for the disobedient subjects through using the suppression. The protagonists of both novels, as three subjects of language protector, do not give in to the predominant ideology; for this, they found themselves in a great hazer, which, later on, caused one of them to be killed by one of the dishonest subjects of the religious system, and the rest of them ran away helplessly. Being under the influence of the two systems of suppression and ideology, the obedient subjects in both texts have compromised. However, whereas in Sorani text suppression is more prominent, in Kurmanji text the ideological system is more prominent and has been successful in the process of marginalizing Kurdish language. Therefore, regarding the hidden force of ideology and the condition of language suppression in the North of Kurdistan, the authorities in this region have more successfully met their objects. In *Gabor*, although the obedient subject’s requirement for Kurdish written language is to some extent the same as the North section, people here are opposing their own language mostly because they are scared and terrified by the authority, and ideology, here, does not succeed to capture all their mind. Generally, the most recurrent themes in *Gabor* are suppression, hope, and uprising, while in *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* the themes include ideology, helplessness, and failure. Despite of these, the murderer’s regret - in the forgoing novel - of the killing the protagonist, his master, and understanding the reality of his opinion, and the persistence of the protagonist in *Gabor* and their insurrection for language indicate the continuity of resistance.

**Key Words:** Kurdish language, ideology, responsive State apparatuses, ideological State apparatuses, the subject, subjectivation, North and East of Kurdistan, *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî, Gabor*.





# PÊRIST

|                                                                    |     |
|--------------------------------------------------------------------|-----|
| PÊŞGOTIN .....                                                     | I   |
| KURTE .....                                                        | III |
| ÖZET .....                                                         | IV  |
| ABSTRACT.....                                                      | V   |
| PÊRIST .....                                                       | VII |
| DESTPÊK.....                                                       | 9   |
| METODOLOJÎ: AMANC, GIRÎNGÎ Û SINÛRÎ MIJAR .....                    | 9   |
| Mijar.....                                                         | 9   |
| Girîngî.....                                                       | 15  |
| Amanc û Pirsyar.....                                               | 17  |
| Mîtodnasî, Rêbazî Rexneyî û Pêkhatey Têz .....                     | 18  |
| Astengî.....                                                       | 19  |
| Pêşîney Lêkolînewe .....                                           | 20  |
| Awîîek le Mêjûy Romanî Kurdî .....                                 | 23  |
| BEŞÎ YEKEM.....                                                    | 26  |
| ÇIWARÇÊWEY TEORÎK .....                                            | 26  |
| 1.1. Pêşekî .....                                                  | 26  |
| 1.2. Louis Althusser .....                                         | 27  |
| 1.3. Marxîsmî Pêkhatewazane û Riwanney Rexneyîy Althusser .....    | 28  |
| 1.4. Têgehe Rexneyîyekanî Althusser.....                           | 31  |
| 1.4.1. Îdeolojî .....                                              | 31  |
| 1.4.2. Dewlet û Damûdezwazay Serkut û Îdeolojîk .....              | 34  |
| 1.4.3. Sûje û Pêvajoy Lêpêçînewe û Besûjebûn.....                  | 40  |
| BEŞÎ DÛWEM .....                                                   | 46  |
| XWÊNDINEWEY PÊŞBAZIYA ÇÎROKÊ NEQEDIYAYÎ LE RIWANGÊY BOÇÛNÎ REXNEYÎ |     |
| MARXÎSMÎ PÊKHATEXWAZANEWE .....                                    | 4   |
| 6                                                                  |     |
| 2.1. Pêşekî .....                                                  | 46  |
| 2.2. Rengdanewey û Banderî Îdeolojî.....                           | 48  |
| 2.3. Mîkanîzm û Dewrî Dezgay Serkut û Îdeolojîkî Dewlet .....      | 53  |
| 2.4. Sûje û Pêvajoy Besûjebûn.....                                 | 61  |

|                                                                   |     |
|-------------------------------------------------------------------|-----|
| 2.5. Encamî Xwêndinewey <i>Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî</i> ..... | 69  |
| BEŞÎ SÊYEM .....                                                  | 71  |
| XWÊNDINEWEY GABOR LE RIWANGEY BOÇÛNÎ REXNEYÎ MARXISMÎ             |     |
| PÊKHATEXWAZANEWE .....                                            | 7   |
| 1 .....                                                           | 1   |
| 3.1. Pêşekî .....                                                 | 71  |
| 3.2. Rengdanewey û Bandorî Îdeolojî .....                         | 73  |
| 3.3. Mîkanîzm û Dewrî Dezgay Serkut û Îdeolojîkî Dewlet .....     | 79  |
| 3.4. Sûje û Pêvajoy Besûjebûn .....                               | 84  |
| 3.5. Encamî Xwêndinewey <i>Gaboî</i> .....                        | 90  |
| ENCAM .....                                                       | 91  |
| ÇAVKANÎ .....                                                     | 102 |

# DESTPÊK

## METODOLOJÎ: AMANC, GIRÎNGÎ Û SINÛRÎ MIJAR

### Mijar

Wîlatanî zilhêzî Ewrûpa paş serkewtinyan be ser împiratorîy Osmanî û dabeşkirdinî, be bê leberçawgirtinî ciyawazîy neteweyî, zimanî, ayînî û be damezranî sîstemî dewlet-netewe le layen berjewendîparêzanî xocêyîyanewe le seretay sedey bîstem da, berdî bineîetî şeî û milmilanê û paktawî hemelayeneyan le nawçeke da dana. Berhemî em sîsteme niwêyey Rojava bo gelanî perawêzxirawî wekû Kurd nek pêşkewtin û behremendbûn le ezmûnî ewê, belkû çermeserî û çewsandinewe û hêriş û heîşey dewlet-netewe tazedamezrawekan bû le dijî ziman û ferhengekey.

Gelî Kurd ke pêştir le serdemî şeî û pevçûnî nêwan Êran û Osmanî da, wek Ehmedê Xanî le dîbaçey *Mem û Zîn* da dibêjêt “bi xûn mulettex” bûn, paş çend sede dîsaneweş ewey berî kewt her malwêranî û komelkujî û koiew û kuştubî bûwe. Lem serûbende da û be dirêjayî em şad saley diwayî, zimanî Kurdî be şewey ciyaciya û be hêz û keristey corbecorewe rûbeûy hawsansazî û paktawkirdin bûwetewe; be çeşnê ke Amir Hassanpour (1992: 458) siyaseti dewlet-netewekanî baskiraw le hember zimanî Kurdî be ‘linguicide’ wate ‘zimankujî’ nawdêr dekat. Em rewşe heta êstaş berdewam e û wek debînîn le Kurdistanî jêr deselatî Turkiya û Êran da mindalî Kurd le hezarey sêyem da le xwêndin be zimanî xoyan bêbeş kirawin û heta dê gêjawî zimanî serdestan zimanî Kurdî, be taybet le Bakûrî Kurdistan, berew nixrobûn û xinkan debat.

Le Êran da, “hem le serdemî Pehlewî û hem le dewrey êsta da le xwêndingakan bergirî le qisekirdinî mindalan be zimanî xoyan kirawe (Hendê carîş bo em kare temê kirawin), girdbûnewey cemawerî le pê naw parastinî ferhenge perawêzxirawekan da be şewey şêlgîrane pekxirawe û çalakanî em biware qolbestkirawin” (Hassanpour, 1992; le: Kelan, 2018: 16). Doxî edebî Kurdî le Êran û Turkiyay paş damezranî dewlet-netewe ta salanî kotayî sedey rabirdû, zorlêk deçêt. Le Rojhelatî Kurdistan da, cige le mawey kurtî serdemî Komarî Kurdistan le salî 1946,

rewşeke baştir le Turkiya nebûwe. Bo nimûne, le mawey saîanî 1959 ta 1965 dozînewey kitêbêkî Kurdî û tenanet nûsraweyekî nasîyasî le maîe Kurdêk da, lanî kem dû sal zîndanî be diwawe bûwe (Ehmedzade, 2018b: 165, 174). Eger çî êsta barûdax le hendêk layenewe ta radeyek goiawe û bilawkirdinewey kitêb û govarî Kurdî le çend bajarêk da zortir bûwetewe û her weha le zanistgey Kurdistan le şarî Sine beşî ziman û edebî Kurdî le astî lîsanis da kirawetewe, belam hêştî pîrsî girîngî xwêndin be zimanî dayikî le xwêndingakan da çareser nebûwe û emeş heîşeyekî gewre ye bo ser zimanî Kurdî le em parçeye da.

Emioke, nek her pîrsgirêkî xwêndin be zimanî dayikî çareser nekirawe û dewlet gwêy xoy lê nawetewe û madey panzdey destûrî bineîetîy xoyşî cêbecê nekirdûwe, tenanet be pêçewanewe, wezaretî perwerde û fêrkarî gelaleyekî niwêy hênawete goîe ke heîşey zimanî degwazêtewe bo dû sal pêş destpêkirdinî qutabxane. Em gelaleye, ke êsta le çend nawçeyekî Azerîziman da cêbecê dekirêt û biyar e be ser hemû mindalanî nafaris da bisepênrêt, ‘terhê besendêgîyê zebanê Farsî’ be watay gelaley şiyawêtîy zimanî Farsî û şiyawbûn bo xwêndinî em zimane ye. Mebest le em gelaleye hêlsengandinî tiwanistî Farsî ew zarokane û rahênanyane pêşle wergîranyan le qutabxane. Bem pêye, leger zarokên çîwar pênc salanda, be tawanî nezanînî zimanî serdest, wek ew mindalane mamele dekirêt ke bo nimûne kêşey zeynî û fêrbûnyan heye û wek bîrkoî le berçaw degîrdirên. Elbet beîewebirdinî kirdarekîy em çeşne gelalane maweyekî dûrûdirêje destî pê kirdûwe û çendîn sale qonaxêk be nawî ‘pêş debistanî’, be taybet le nawçekanî derewey aqarî zimanî Farsî da û bo axêweranî zimane kanî tir bûwete naçarî û heta ew bîrwanameyeyan nebêt, le polî yek da wernagîrên. Êstaş le dirêjey em siyasete da, mindale zor biçûkekanîş kirawnete amanc û ta dêt ziyatir paşekşê be zimanî perawêzxirawî şîst le sedî gelanî Êran dekirêt.

Dijayetîy mafî kemînekan û lewane mafî zimanî, tenya bo dewletekan nageîetewe û em zeynîyete weha le qûlayî mêşkî hemûwan da cêgîr bûwe, ke nek her xelkî asayî, tenanet roşinbîr û bijarde û bilîmetekan û çalakanî siyasî û tenanet ewaney derewey wîlatîş le beramber her çeşne mafxwazîyek da demargîrjane helwêst deşîr û tundajoyane dujminayetîy dekan. Le rêkewtî yekî Junî 2012 ke parte Kurdîyekan rêkkewtinnameyekyan sebarete be mafî çarey xonûsînî gelan û sîstemî fîdralîzmî neteweyî-cugrafyayî wajo kird, zorbey ewaney xoyan wek roşinbîr û parêzerî mafî mirov le qelem deda, be derkirdinî rageyendirawêk dijayetîy qurs û qaymî xoyan lem pêname da derbiî û rêk heman helwêst û kardanewey deselâtî baladestîyan pîşan da. Şafî

Sedir, parêzer û dakokîkarî çawnetirs û rasteqîney mafî mirov û yek lew degmen kesaney gelanî bêmafîkirawî nêw sinûrî Êran be netewe naw debat nek be qewm, le beramber ew taqime da û le berjewendîy milyonan mirovî mafîxurawî cugrafyay siyasîy Êran helwêst denwênêt û denûsêt:

Hoy ewey ême emioke legel weha waqî'êk da berewîûyn, nek her bo siyasetî serkutkaraney dewlete nawendîyekanî îran degeîetewe, belkû ziyatir, regî le [têwanîn] û kirdewey yekebeyekey êmemanan da dakutawe; çi ew katey wek xelkî kûçe û kolan, regezperistîman be witinî 'Erebî sûsmarxor' û 'Kurdî serjêker' derdexeyn û çi ew katey wek rûnakbîr, rageyendirawî siyasî denûsîn û le rastî da nasyonalîzmî tundajoyaneman le piştewey em wişe alwwalayena da deşarînewe ([www.tiribun.one](http://www.tiribun.one)).

Kamiran Metîn (2013) jî le wîlamî nasîyonalîste Êranîyekan da, ke pêwendîy lemêjîney gelanî Êran le çîwarçêwey wîlatêkî hevgirtû be naw Êran dekene pasawî nawhênanî netewey Kurd be 'qewmî Kurd' û lewre legel mafî çareyxonûsînyan dijayetî deken, denûsêt, Sêwe û çîyetîy em pêwendîyane gengeşey zorî le ser bûwe û nihaş her heye. Lanî kem, le hefta safi diwayî da çîwarçêwey siyasîy em pêwendîyane le ser binemay sepandinî tundûtîjaney pêwendîekî ferhengî-nasnameyî nahawseng da bûwe û têy da, zimanî Farsî be kolekey ferheng û nasnamey Êranî danirawe û zimanekanî tir be 'mehelî' û astnizim seyr kirawin. Be giştî, "eger çî çendferhengî û çendzimanî hêmagelî serekîy jiyanî Êranî n û gelanî Êran be ziyatir le 70 ziman deaxifin, zor kem awî le fêrkarîy çendzimane çi le zankokanî nawxo û çi le nawende akadêmîkekanî Rojava da dirawetewe" (Kelan, 2018: 5).

Diyar e Kurdanî Bakûr lem layenewe zext û zorî ziyatiryan le ser bûwe û tewijmî paktawî zimanî û ferhengî lewê da gelêk tundtir bûwe. Le safanî kotayî deselatî Osmanî da, wate le safi 1876, le destûrî bineietî da zimanî Turkî bû be zimanî fermî û perwerdeyî û zimanî Kurdî bo mebestî fêrkarî qedexê kira. Herweha mercî damezran le damezrawe dewletîyekan da zanî zimanî Turkî bû (Çiçek, 2013: 4). Paş helweşanewey sîstemî xîlafetîy Osmanî û damezranî dewletî Kemalîstî jî le safi 1923 û pesindkirdinî destûrî niwê le nîsanî 1924 da, be pêy madey 2î destûreke, zimanî Turkî bû be zimanî resmî û yasayî û le madey 88îş da hemû danîştûwanî Turkiya be Turk daniran (Xoşnaw, 2018: 113). Be witey Seydo Aydogan (2014: 102), "li Tirkiyayê Kurdî heta sala 1991ê jî ji binve qedexê bû û bandora vê qedexeya zimanî heta sala 2002an jî dewam dikir". Çiçek (2013: 4) jî denûsêt: "Ligel ku asîmîlasiyona Kurdan hîn di dema Osmanî de dest pê kir, ev siyaseta bi avabûna Komara Tirkiyayê bû dînamîkeke avakar di

teşegirtina dewleta nû de û bi awayekî sistematîk heta îro li ser gelê Kurd hate pêkanîn”.

Dewletanî paş rûxanî împiratorîy Osmanî, be girtine berî siyasetî ‘Yek Netewe Yek Ziman’ û be yarmetîy hêzî serbazî û her weha be piştîwanîy akadêmîsiyenên zanistfiroş, nikolîyan le bûnî zimanekanî tir lewane Kurdî kird; yan hemûyan kirdine jêrlîqî zimanî Turkî; wişegelî wek Kurd û Kurdî û Kurdistanyan sîfîyewe; Kurdanyan be Turkî şaxî, Turkî Rojhelatî û tenanet Turkî Kurd nawdêr kird (Barak, 2002:74). Siyasetmedaran be pişt bestin be rawêjî bîrdafêjanî siyasetî zimankujî, le hember waqî berçaw, wate gelêkî pîrhejmarî nawçeyekî berînî cugrafîyay Turkiya da, zimanî Kurdîyan bo bîst wişe dadebezand û deyangut bêcge le em bîst wişeye, ewanî dîke hemû le zimanekanî dewrûberewe werğîrawin. Încê her kesîş be em zimane bîst peyvîye qisey bikirdibaye, berewûy ceza û cerîme debûwewe (Çiçek, 2013: 3; 6; 14). Kazim Polat le kitêbî *Êşa Zimanê Min* da bîrewerîy yekem rojî çûnî bo qutabxane degêtewe û amaje bo betawandanî axaftin be zimanî Kurdî û kardanewey beîweberî xwêndingakeyan, ke bo xoy Kurd e, dekar û aweha denûsê:

Zarokên ku ji hev hez nedekirin û yê ku di navbera hev de pîrsgirêkek hebû hev îxbar dikirin ku yê din bi Kurdî li mal an jî li derve axaviye. Paşê paşê min fêhm kir ku midûr li ser qedexekirina Kurdî disekîn; di her roja duşemê piştî merasima ‘korkima sonmez’ê di axaftina xwe de digot ku “kim Kurtçe konuştursa gelin bana soyleyin.” (Kî bi Kurdî bi axave werin jî min re bibêjin.). (Polat, 2015: 71)

Ciya le qedexey axaftin, rewşî nûsîn û bi lawkirdinewey kitêb le Turkiya hênde di jar bûwe ke le mawey nêwan salî 1923-1965 tenya dû kitêbî Kurdî bi law bûwetewe. Paş em rêkkewteş ta salî 1979 kitêbxaney Kurdî her be hejarî mawetewe û jimarey kitêbe çapkirawekanî ew maweye le bîstî tenepeîandûwe. Le salanî 1980 ta 1989 tundûtîjîy perey sendûwe û cêy ew takutura kitêbeşî girtûwetewe û lem de sale da taqe kitêbêkîş çap nekirawe. Le salanî diwatir da, lege ewey bi lawbûnewey kitêbî Kurdî wirde wirde berew ziyadbûn deçê, hawkat qolbestkirdin, eşkence û toqandin û tenanet têrorîş zortir debêtewe; be çeşnêk ke lew maweye da dû nûserî nawdarî Bakûr, Mûsa Enter û Mûsa Dênîz be tawanî nûsîn be zimanî dayikî dene kuştin. Her wehaş, be pêy raportî ‘Encumenî Rojnamewananî Hawçerx’ le mawey nêwan 1992-1996 çîwarde çalakî biwarî rojnamenûsîy Kurdî tîror kirawin. Her ew serçaweye amaje bo kujranî çîwarde hewalnêr tenya le salî 1993 da dekar (Malmisanij, 2006: 18-22). Lem deye da, eger çî siyasetmedaran be şewey fermî danyan be hebûnî Kurd le Turkiya da na, belam lege ewe da,

“her roj bi dehan insan dihatin kuştin, bi hezaran gund hatibûn şewitandin, bi milyonan insan ci û warên xwe terk kiribûn. Rojnamevan û rewşenbîrên Kurd dihatin kuştin” (Acar, 2010: 577).

Her wek çon le Êran da tîşkman xiste ser ew rastîyey ke pêşelkarîy mafî zimanî tenya taybet be dewlet û damezrawegelî hikûmî nîye, le Turkiyaş da têwanînî cemawerî asayî Turkziman le hember zimanî Kurdî da nadadperwerane û nîşanderî nepejrandinî em mafe seretayîye ye bo Kurdan. Le lêkolîneweyekî em diwayîyane le seretay sedey bîst û yekem da, be beşdarî 1492 kes le 23 bajarî ew wîlate, sereşay layengirîy pîfanîyan le mafî bekarhênanî ziman bo gişt takêk, lê le beramber pirsyarî “li gorî we lazim e ku dewlet îmkanan çêbike ji bo kesên ku dixwazin zimanê Kurdî di dibistanên dewletê de hîn bibin?”, tenya 11,4%î beşdarbûwan wîlamî "erê"yan dawetewe (Çarkoglu û Toprak, 2006 le: Çiçek, 2013: 89).

Le salî 1991 da, dewletî Turkiya, le ber hendêk hokarî wek berxwedanî Kurdanî zimanparêz û hewlîdan bo çûnerîzî wîlatanî Yekêtîy Ewrûpa, qanûnî qedexey axaftinî Kurdî û çapkirdinî fikr û raman helweşayewe û diway yazde sal, wate le 2002 da, hendêk çaksazîy sinûrdar encam dira. Bem pêye, be bê nawhênanî zimanî Kurdî û be pêy qanûnî girêdirawî zimanên biyanî, rê bo fêrkarî em zimane le nawende taybetekan da û her weha bo weşanî Kurdî le radyo û televîziyon da kirayewe. Em çaksazîye geyişte astêk ke le salî 2009 da kenalêkî 24 katjimêre (TRT-6) be zimanî Kurdî damezra û paşan dû kenalî nahikûmî jî (Rehber TV & Dünya TV) weşanî Kurdîyan dest pê kird. Her weha le jêr nawnîşanî ‘Zimanên Zîndî’ dergay zankokanî Mêrdîn, Dersîm, Bîngol, Wan, Sêrt, Diyarbekir û Mûş be rûy ziman û çand û wêjey Kurdî da kirayewe. Le salî 2012-2013eş da waneyek be Kurdî, wek waney bijarde, kewte nêw pêistî wanekanî xwêndinge dewletîyekanewe (Çiçek, 2013: 21-23).

Doxî çapemenîy Kurdî ta em rêkkewte zor nalebar bû. be witey Acar (2010: 563), lew maweye da û tenanet diwayeş ta salî 2000, çalakan û roşinbîran rûberûy girtin û kuştin debûnewe û zoryan benaçar wîlatyan be cê dehêşt. Elbet le salî 1974 da qanûnî ‘Affê’ rageyendira û gelêk roşinbîr û nûser azad kiran. “Ji ber vê, di nav salên 1975-1980yî de wekî tevgerên siyasî yên Kurd, rojname û kovarên Kurdî jî ketibûn nav pêşdeçûyîneke berbiçav” (Acar, 2010: 574). Keşî siyasîy Turkiya le paş 91, karîgerîy erênîy le ser çapemenîy Kurdî dana. Le salî 1992 da heftenamey *Welat* derçû û diway çîwarde sal rojnamey *Azadiya Welat* û govarî *Nûbihar* jî le 2006 da le dayik bûn. Her weha biawkirdinewey pirtûk perey send; bo nimûne le newedekan da

212 kitêb çap kiran. Hawkat lege<sup>l</sup> geşey weşangerîy Kurdî, ‘Navenda Çanda Mezopotamiya’ le safî 1991 û ‘Enistîtuya Kurdî ya Stenbolê’ le safî 1992 da damezran (Çîçek, 2013: 25).

Le pêwendî lege<sup>l</sup> ciyawazîy barûdoxî zimanî Kurdî le Turkiya û şewey mameley deselat le êsta û rabirdû da, Çîçek amaje bo kardanewey tundî dewlet le safî 2001-2002 le hember daxwazî xwêndkaranî zanko bo beêweçûnî waneyekî zimanî Kurdî dekat û denûsê:

Ev daxwaza biçûk bi şideteke dewletê ya gelek tund re rû bi rû ma. Encam: 871 xwendekar hatin binçavkirin, 43 bûyera îşkenceyê hate qeydkirin, 91 kes bi tawanbariya endambûn an jî alîkariya rêxistinên hatin girtin, 980 kes ji hefteyek heta salek ji zanîngehan hatin avêtin. Lê piştî deh salan zimanê Kurdî wekî dersekê kete mufredata dibistanên dewletê û îro dewlet bi vî zimanî 24 saet weşana televîzyonê dike. (Çîçek, 2013: XI)

Wek debînîn lem salaney diwayî da barûdox goiawe û qedexey axaftin be zimanî Kurdî le yasay bineîetî Turkiya da helgîrawe û roçneyek be rûy çapemenîy Kurdî û çap û bihawbûnewey pirtûk û govar be zimanî Kurdî kirawetewe û beşî ziman û çand û edebiyatî Kurdî le hendê zanistge da tenanet ta astî duktora xwêndkar werdegrin. Belam, seferay em gofankariyane, doxî zimanî Kurdî le nêw cemawer da nek her berew başî neçûwe, xiraptirîş bûwe; be çeşnê ke êstake zimanî Kurdî bo pîfanî gencan û bo zorbey zorî zarokan zimanêkî neaşina û nezanraw e (bnr: Çîçek, 2013: 142). Em pirsgrêke be taybet bo kesêk ke yekem car geştî Bakûrî Kurdisdayiktan bikat, zor berçawtir e û yekem şit ke serincî rabikêşê, axaftinî asayîyaney zorîney Kurdanî ewê ye, le bazar û nêw maîan da, be zimanî Turkî. Lêre da ye ke pirsyarêk le mêşkyewe ser heldênê û depirsê: Çima şewey rûbeûbûnewey gel lege<sup>l</sup> zimanî dayikîyan da weha ye?

Em lêkolîneweye, bo geyîştin be wilamî em pirsyare, le dû romanî dû parçey Bakûr û Rojhelatî Kurdistan, be gwêrey têgehe rexneyîyekanî ‘îdeolojî’, ‘dezga serkut û îdeolojîyekanî dewlet’ û ‘sûje’y Louis Althusser (1918-1990), bîrdaiêjî gewrey Ferensî, dekolêtewe. Bo em mebeste dexwazê le em dû romane da şewey mameley deselatî serdest û Kurdan le hember em pirsê girînge da şirove bikat û be diway bersvî ew pirsyare tejî le jane da bigeîet. Bo em mebeste, *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, nûsînî Şener Ozmen û *Gaboî*, nûsînî Seyid Qadir Hîdayetî wek niwênerî civakî Kurdî le Bakûr û Rojhelatî Kurdistan, depîşkênrên û hokare berçaw û şarawekanî



asimîle û xoasimîlekirdin û berhemhênanewey ew barûdoxe le pêwendî leger ziman da rûn dekirênewe.

Be mebestî şirovey çimayî û çonyetîy rewşî amade û lêkolînewe û lêkdanewey çonyetîy befêwebirdinî pêvajoy paktawîy zimanî û kardanewey layenî beramber, dû romanman le dû parçey amajebokiraw hebijard. Bo hebijardinî romanî guncawî em twêjîneweye, pêwîst bû çend merc le ber çaw bigîrdirên ke birîtî bûn le emane: Yek, romanekan perjabine ser pêwendî Turk/Fars-Kurd û lew nêwe da cextyan le ser pirsî ziman bêt; dû, şiwên-katî rûdawekan, çaxî hawçerx û rewşî zimanî Kurdîy em diwayîyane le dû parçey berbas da bigrêtewe; sê, nûserekanyan le diî rûdawekan da jiyabin; çîwar, astî nûser û romanekanyan berz bêt û serincî rexnegiranyan rakêşabêt.

Bem pêye, diway maweyek geian û xwêndinewey û pirsîn û bediwadaçûn, *Gabo* le nûsînî Seyid Qadir Hîdayetî û *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, nûsînî Şener Ozmen hebijêrdiran. Hengawî dûwem, diyarîkirdinî çîwarçewey teorîk û mîtodî twêjînewe be mebestî tawtwêkirdinî pirsî ziman û şewey rûbeûbûnewey kesayetîyekan û têgeyîştin le hoy helwêstekanyan bû. Bo em mebeste, diway beserkirdinewey teorîye rexneyîyekan û ragorînewe leger mamostayan, bîyar dira bo xwêndinewey pirsî berbas, le çemke rexneyîyekanî Louis Althusser kelk werbigîrdirêt. Bem pêye, çemkekanî ‘îdeolojî’, ‘dezgay serkut û îdeolojîkî dewlet’ û ‘sûje’ le teorîy rexneyî nawbiraw kirane çiray rûnakîbexşî em rêgaye.

## Girîngî

Ziman, parêzer û nasênerî ferheng û pêkhênerî subjêktîvîtey mirov û her weha estûnî serekîy nasnamey her gelêk e. Tirazanî em estûne be watay lêktirazanî parçe pêkhênerekanî nasnamey ew gele ye. Le cîhanî tejî le pêşelkarîy mafî mirov le rabirdû û êsta da, serdestan be mebestî kipkirdinî dengî bindestan, demî tîjî şimşêryan berewrûy ziman kirdûwetewe. Perawêzxistinî ziman, rêgeçareyekî zor karîgerî deselatdaran e bo paktawkirdin û bêbeşkirdinî netewekanî dîke. Rojhelatî Nawîn, lem sed saley diwayî da û be damezranî pergali dewlet-netewe, taqîgayekî gewrey em şewe siyaset e bûwe. Gelî Kurd, yekêk le baştirîn nimûnekanî berkewtûy hefeşey zimanîy dewlet-netewekanî baladest e.

“Ziman û nasname her kamyar ewî tir berhem dehêninewe.... Ziman, nasnamey sûje desazênê û diwatir dewr degêrê le pênav misogertirbûnî rehend û taybetmendîyekanî heman

nasname. Nasnameş bo xoy dîsanewe le rêgay zimanewe dewrî serekî degêrê le dûbarebûnewe û berhemhênanewey heman taybetmendî û rehend le ziman da” (Sadjadi, 2018b: 111). Ême lem lêkoîneweye da, be serincdan be çonyetîy rûberûbûnawey dû layenî serdest û bindest û her weha be awirdanewe le helwêstî kesetîyekanî romanên berbas le pêwendî legel zimanî Kurdî da, wêay hêlsengandinî rûy diyarî helwêst, hêlsûkewt, riwange û rûdawekan, tîşk dexeyne ser layene şarawekan û hewl dedeyn hokare nadiyarekanîş rave bikeyn.

Bîrokekey nûsînî em têze, bo em girifte gewreye û pirsyar le meî bandorî hêjêmonîy zimanîy netewe serdestekan û astî hefeşe û metirsîy le ser zimanî Kurdî, çonyetîy mameley Kurdan legel rewşî dasepaw û astî xobedestewedan û milkeçbûn yan xoparastin û berxodanyan degeftewe. Be serincdan be barûdoxî metirsîdarî zimanî Kurdî le Bakûr û Rojhelatî Kurdistan û siwarbûnî zimane piçekekani Farsî û Turkî û pişûsiwarbûnî zimanî bînpêkirawî Kurdî, em çeşne twêjînewane, gelêk pêwîst û girîng in û wêay derxistinî layene şarawekanî em barûdoxe metirsîdare, dekarin bandorî erênî le ser hoşyarî û agamendîy takî Kurd dabinên.

Be gwêrey rageyandinî UNESCO le koy ziyatir le şeş hezar zimanî zîndûy êstake, zorbey here zoryan le mawey em sedeye da le bîr deçnewe û demirin (Çîçek, 2013: 61). Netewe Yekgirtûwekan le safî 1999 da rojî 21î February, be mebestî webîrhênanewey hefeşey lenawçûnî safaney ziman û zare zîndûwekan û girîngîy parastinyan, destînîşan kirdûwe. Kurdan, le bin bandorî siyasetî ‘yek netewe, yek ziman da’, lem layenewe tûşî daîman û lawazî bûne û wek debînîn êstakeş bo nimûne le Rojhelat û Bakûrî Kurdistan xwêndin be zimanî dayikî rêpênediraw e û tenanet le Bakûr ta em diwayîyane axaftin be zimanî Kurdî be pêy yasay Turkiya be tawan ejmar dekira.

Eger çî niha rewş tozêk goiawe û çapemenîy Kurdî ta radeyêk geşey kirdûwe û le hendê zanistge da beşî ziman û edebî Kurdî kirawetewe, belam rewşî zimanî Kurdî le nêw civak da, her weha berew lawazî derwat û le rastî da gel bo xoy xerîkî berhemhênanewey rewşî dasepaw û xopaktawkirdinî zimanî ye. Pêvajoy perawêzxistin û paktawkirdinî ziman le Rojhelat û Bakûrî Kurdistan û hêjêmonîy zimangelî serdest, heta dêt ziyatir Kurdan le zimanî dayikîyan dîr dexatewe. Em kêşeye be taybet le nêw Kurdên Bakûr da zor qûltir e; be corêk ke "li Tirkîyeyê di nav Kurdan de duzmanîyeke asîmetrîk heye ku berê wê ber bi yekzimaniya Tirkî ve ye" (Çîçek, 2013: 87). Be serincdan be girîngî û hestiyarbûnî em barûdoxe, em lêkoîneweye deyewêt

roçneyêk be rûy em tarîkayîye da bikatewe û perdey şewezeng le ser em rastîye la bidat û hokarekanî çêkerî em barûdoxe rûn bikatewe û raveyan bikat.

Layenêkî dîkey girîngî em têze ewe ye ke, le pêwendî lege! edebî Kurdî da, ta ew cêgayey ême agadar bîn, ta êsta hîç twêjîneweyek, le goşenîgay Althusserewe, le ser romanî Kurdî û be zimanî Kurdî encam nedarawe û detwanîn bilêyn em name zankoyîye yekem hengaw û riçeşkênî em rêgaye ye. Ême lem têze da dû roman le dû parçey Rojhelat û Bakûrî Kurdistan, *Gaboîr* nûsînî Seyid Qadir Hîdayetî û *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* nûsînî Şener Ozmen, be gwêrey têgehe rexneyîyekanî ‘îdeolojî’, ‘dezgay serkut û îdeolojîkî dewlet’ û ‘sûje’ le teorîy Louis Althusser rave dekeyn. Her weha, be serincdan bewey em têze deperjête ser dû romanî Soranî û Kurmancî, hengawêkî biçûk e le pê naw lêknizîkkirdinewe û nasandin ziyatirî edebî çîrokî em dû zarey zimanî Kurdî.

### **Amanc û Pirsyar**

Amancekanî lêkolînewey berdest birîtîn lem xalaney jêrewe:

1. Diyarîkirdinî şewey rengdanewey çemke rexneyîyekanî Althusser le dû romanî *Gaboîr* û *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da;
2. Şirovey şewe û radey bandorî îdeolojî le ser kesetîyekanî dû romanî berbas le pêwendî lege! pirsî zimanî dayikî da;
3. Şirovey şewey rûbeûbûnewey takî Kurd le Bakûr û Rojhelatî Kurdistan lege! zimanî Kurdî da û astî besûjebûnyan lem pêwendîe da;
4. Diyarîkirdinî şewey hêlsazranî nasnamey kesetîyekan le pêwendî lege! zimanî xo da;
5. Rûnkirdinewey ciyawazî û hevparîy nêwan dû romanî berbas le pêwendî lege! pirsî serekîy lêkolîneweke da.

Be serincdan bem amancaney serewe, detwanîn pirsyare serekîyekanî têzî berdest bem core biwrûjênîn:

1. Rengdanewey çemke rexneyîyekanî Althusser le dû romanî *Gaboîr* û *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* be çi şeweyeke?
2. Îdeolojî ta çi radeyek û be çi şewegelêk bandorî le ser kesetîyekanî dû romanî berbas le pêwendî lege! zimanî dayikî da danawe?

3. Şêwey rûbeîûbûnewey takî Kurd le Bakûr û Rojhelatî Kurdistan legel zimanî Kurdî da û astî besûjebûnyan lem pêwendîe da çonawçone?

4. Nasnamey kesetîyekan, le pêwendî legel ziman da, be çi şêweyek heksazrawe?

5. Çi ciyawazî û hevparîyek le nêwan dû romanî baskiraw da, le pêwendî legel pirsî serekîy lêkolîneweke da heye?

### **Mîtodnasî, Rêbazî Rexneyî û Pêkhatey Têz**

Têzî berdest deçête xaney twêjînewey çonayetîyewe û le ser serçawey kitêbxaneyî damezrawe. Le ber ewey ke be giştî deçête xaney zaniste mirovîyekanewe, le ciyatî şîkarî amari û serjmêrî, kelkî le riwangeyekî teorîk wergirtûwe û lew rêgeyewe cestey lêkolîneweke rave dekat. Cestey lêkolîneweke be giştî birîtîye le romanî Kurdî û be taybetî dû nimûne romanî Soranî û Kurmancî le Rojhelat û Bakûrî Kurdistan da. Romanên berbas birîtîn le *Gabo* nûsînî Seyid Qadir Hidayetî û *Pêşbaziya Çêrokên Neqediyayî* nûsînî Şener Ozmen.

Em lêkolîneweye be pêy çemke rexneyîyekanî Louis Althusser, bîrdaijî Ferensî, sebarete be îdeolojî û karîgerîy le ser tak û goşnyan bo sêje, le pêwendî legel rewşî zimanî Kurdî û paktawî zimanî da encam dedirêt. Bem pêye, dû romanî gorîn, wek nimûney rengdanewey civakî Kurdî le Rojhelat û Bakûrî Kurdistan, dextirêne ber lêkolînewe. Bo em mebeste, nimûney ew pardeqaney helwêstî kesetîyekan le hember zimanî Kurdî da pîşan deden destnîşan dekirên û be gwêrey çemke rexneyîyekanî Louis Althusser rave dekirên. Ew çemke rexneyîyaney em tîzey le ser binyat denirêt ‘îdeolojî’, ‘damûdezugay serkutkerî dewlet’, ‘damûdezugay îdeolojîkî dewlet’, ‘sêje û pêvajoy besûjebûn’î Althusser in.

Pêkhatey tîzeke bem coreye ke le beşî destpêk da, paş şîrovey giştîy mijarî berbas, romanên helbijêrdiraw û nûserên wan nasêndirawin. Le binbeşî pêşîney twêjîneweş da, çend witarî peywendîdar bew dû romane tawtwê kirawin. Paşan, girîngêtî, pirsyar û amancekan û mîtodnasî tîzeke xirawnete ber çaw. Le kotayî em beşe da, be kurtî, awîf le mêjûy romanî Kurdî dirawetewe. Beşî yekemî tîzeke, bo çîwarçêwey teorîk danirawe, ke tîy da paş kurtebasêk le ser Marxism û jîyan û çalakî û axêzgey hizrîy Althusser, riwange û boçûnekanî le witarî “Îdeolojî û Dezgayên Îdeolojîkî Dewlet” le pirtûkî *Lenin û Felsefe û Witarekanî Tir* da (1971) şîrove kirawin. Bo palpiştî em beşe, le kitêb û witarî dîke be pênuşî xudî Althusser û rexnegiranî tir kelk wergîrawe. Em beşe, le ber ewey teorîy amajepêdiraw le aqarî lêkolînewey wêjey Kurdî da

ta radeyek taze ye, be têrûteselî şirove dekirêt.

Beşî dûwem, xwêndinewey rexnegiraney yekêk le romanekanî le xo degrêt. Em beşe le sê binbeşî pêşekî, xwêndinewey romanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* be gwêrey çemke rexneyîyekanî Althusser û encam pêk dêt. Lem beşe da, paş nasandinî buyerên girîngî romaneke û hendêk le taybetmendîye balkêşekanî, bandorî îdeolojî, dewrî dezgayên serkut û îdeolojîkî dewlet û pêvajoy sêje û besûjebûn, be nimûnehênanewe le deqî romaneke, şirove dekirên. Le kotayîş da, encamî em beşe, be kurtî, pêşkeş dekirêt. Beşî sêyem, helgirî xwêndinewey rexnegiraney romanî *Gaboî* e. Em beşe le sê binbeşî pêşekî, xwêndinewey romanî *Gaboî* be gwêrey çemke rexneyîyekanî Althusser û encam pêk dêt. Lem beşes da, paş nasandinî rûdawe girîngekan û hendêk le taybetmendîye serinciakêşekanî em romane, le binbeşî dûwem da, bandorî îdeolojî, dewrî dezgayên serkut û îdeolojîkî dewlet û pêvajoy sêje û besûjebûn, be nimûnehênawe le deqî berbas, şirove dekirên. Le diwa beşî têzekeş da, encamî twêjînewey berdest pêşkeş dekirêt.

### **Astengî**

Le astengî û berbestekanî lêkolînewey berdest, sinûrdarbûnî helî destfageyiştin be serçawey Kurmancî bû; be çeşnêk ke le Êran da dozînewey pirtûkî pêwendîdar, be taybet be elfbêy Latînî, zor estem e û detwanîn biêyn karêkî nelûwaw e. Tenya derfet bo bedesthênanî em kitêbane girtine berî rêgey dûrî Bakûr bû, ke em kareş zûbezû nedekira.

Bo helbijardinî romane Kurmancîyekeş em berbeste ziyatir xoy deniwand û em qonaxe yekêk le qonaxe diwarekanî têpefandinî em erke bû. Le encam da paş maweyek xwêndinewe û pirsyar û bediwadaçûn, romanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* helbijêrdira, ke be serincdan be serkewtûbûnî nûserekey û her weha le ber ewey meraq û kelkeley serekîy serlehengî romaneke heman pirsgirêkî têzeke ye, detwanîn biêyn bijardeyekî guncaw e. Sereray emane, katî nûsîn û katî rûdawekanî nêw deqeke û her weha serekwata û binwatakanî romanî berbas legel romane Soranîyeke da, *Gaboî*, xawen gelêk xalî hawbeş e û legel yektir da deguncên.

Şiyawî amajepêdan e serçawekanî berdestî ême le pêwendî legel em teorîye rexneyîye da be zimanî Îngilîzî û Farsî bûn; boye xoman beşe pêwîstekanman wergêrane ser zimanî Kurdî. Lem pênawe da hewlman da hawwatagelêk helbijêrîn ke ta radeyekî zor pîr be pêstî çemke bekarhênrawekanî ew bîrmende bin. Wek debînin beşî yekemî têzeke, wate beşî çîwarçêwey

teorîk, be têrûteselî şîrove kirawe û hoyekey bo tazeyî teorîyeke le aqarî twêjînewey wêjey Kurdî da û be mebestî têgeyandinî çemke rexneyîyekanî degefêtewe.

## **Pêşîney Lêkoînewe**

Kitêbî *Sêberî Zîndûy Nûsîn* heşgirî hewt wîtare le ser romanî *Gaboî*. Lem komele wîtare da le dû nimûneyan ke merc û taybetmendîyekanî wîtarî zanistîyan tê da reşaw kirawe wird debînewe. Sadjadi le wîtare têr û teselekey da be nawî “subjêktîvîte le nêwan îpêfêni û sinûrekan da” deperjête ser wediyarkewtinî ‘epiphany’ û her weha agadarîy sêjey axêwer le heqîqetî zimanî Kurdî û paşan rewî ‘pêkhatinî subjêktîvîte’ le kesayetîy serekî da û her weha ‘doxî xermaneyî’ zimanî Kurdî û watay sinûr le romanî *Gaboî* da şîrove dekat û le kotayîş da hendê taybetmendîy sîstemî gêfanewey romaneke lêk dedatewe. Nûser le beşêkî wîtarekey da le peywendîy legele ziman da denûsê:

‘Lexonamoyî zimannasane’ wekû zaraweyekî Lacanî, ziyatir lew satewextane da rû dedat ke sêje le hember tewijmî rastewxoy zimanêkî tir da yan şêweyekî tirî ziman û delaleta niwêkan cêgir dekirê. Ziman, nek her le pêgey sîstemêkî pêkhatû le dal û nîşane, belkû tenanet be corî pêkhate û riwalet û şêwey ristesazîşewe, kar le nasnamey sêje dekat û le naxudagay sêje da cêgeyek le bo xoy desazênê û bem çeşne sêje debête heşgirî morkêkî ciyawazî nasname ke dekirê be subjêktîvîte nawbirde bikirê. Sêje be hoy em zimane tazeyewe le xudî xoy û lewey pêştir pêkî hênawe namo debê. (Sadjadi, 2018a: 21)

Ehmedzade le wîtarî “Roman û Riwange” da teknîke edebîyekanî ‘riwange, diyalog, xufawgey bîr, karaktêr, alîgorî û gêfanewey hawterîb’ xistote jêr “neştergerîy xwêndinewe” û her weha perjawete ser hendê pirsî girîngî wek nasname û ziman û lem pêwendîe da sebarete be dû kesayetîy serekîy romaneke denûsê:

Kerîm û Ebdulmutelîb niwênerayetîy komelegeyek in ke le nêwan dû nasnamey ciyawaz da be heşwasrawî mawnetewe. Kerîm û Ebdulmutelîb le layen deselatdaranî êstawe serkut dekirên, belam ewan pêmilîyan nabin û berberekanêyan legele deken, encamî ew berxodan û serkutkirdine debête mîkanîzmî cûfey komeleyetî û nasnameyî dû hêzî dijber. (Ehmedzade, 2018a: 162)

Witarekanî tirî em komeleye birîtin le: “Lojîkî Meyl le Kempewe bo Gîlgemêş” nûsînî Reza Elîpûr, “Le Gêfanewey Bazneyî *Toqî Ezazîlewe* ta Gêfanewey Çîrîkîy *Gaboî*” nûsînî

Siyawêş Kerîmzade, “*Sêberî Zîndûy Nûsîn*” nûsînî Elî Xulam Elî, “*Gaboîr* Meylî Beîavekirdinî Mêjû” nûsînî Kawan Mihemedpûr û “Bîst û hewt Gêfanewe û Bîst û şeş Meslex” nûsînî Leyla Salihî.

Ciya lem komele wîtare, çend nivîsêkî tir sebarete be *Gaboîr* nûsrawin, ke lewane, Menîtk le wîtarî “Gemey Cênawekan le Romanî *Gaboîr* Seyid Qadir Hîdayetî da” perjawete ser çonyetîy gêfanewey em romane û şewey niwêy bekarhênanî vegêfekan (azhans.kird). Emcedî jî be gwêrey teorîy gêfanewenasîy Roland Barthes em romaney tawtwê kirdûwe (kurdishbookhouse.com). Her weha, Debaxî le wîtarêk da be nawnîşanî “Helweşandinewey *Gaboîr*”, be pêy çemke rexneyîyekanî bîrdafêjanî qutabxaney Frankfurter, em romaney xwêndûwetewe. Nûser le akamî wîtarekey da, be cextkirdinewe le ser girîngêtiy pîrsî ziman le romanî *Gaboîr* da û be serincdan be dû gêfanewe hawterîbekey, denûsêt:

Ajelêk/îsanêk ke zimanî nîye le rastî da bûnî tem û mijawî ye. Eger gutnekey Derrida be qerz werbigrîn ke hîç şitêk le derewey ziman da bûnî nîye û wicûdî zimanî ye ke wicûdî rohîy îsan le gerdûney hestînasane da mana dekatewe, axo îsan/netewey bêziman çon bitwanê basî renc û bûnî xoy bika? Rencêk ke berdewam dûpat debêtewe û wîstêk ke berdewam serkut dekirê. (Debaxî, 2019)

Be pêçewaney *Gaboîr*, ke komele wîtarî benîrxî *Sêberî Zîndûy Nûsîn* û çend wîtarêkî dîkey le tofe komelayetî û govare roşinbîrîyekan da le ser biław bûwetewe û be gwêrey riwangey corawcor hêlengênrawe, rexnegran be şewey pêwîst neperjawnete ser *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*. Le nimûneyekî degmenî zankoyî da, Emîn Guler, bem diwayîyane, le têzek da be nawî *Karakter di Romana Kurmancî de: Girê Şêran, Mirina Bêşî, Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî, Qerebafon, Sobarto* (2019), pênc romanî tawtwê kirdûwe ke yekêkyan em deqey berbasî ême ye. Nûser le beşî dûwemî têzekey da (23-31) perjawete ser nasandinî kesayetîyekan û le pêwendî lege romanî berbasî ême da pênc karakterî, be serincdan be dewryan le pêşvebirdinî gêfaneweke da, be kurtî nasandûwe (29-30).

Le beşî sêyemî em têze da, le boçûnekanî Benedict Anderson le meî netewe-dewlet, riwangekanî Freud, Jung û Adler û bo analîzî layenî derûnîy karakterekan, boçûnekanî Frantz Fanon sebarete be dû layenî serdest û bindest û nûsînekanî Haşim Ehmedzade le pêwendî lege romanî Kurdî û nasname da kelkî wergirtûwe û lem songanewe hewlî nîrxandinî rehendekanî

girêdiraw be karakterî em pênc romaney dawe. Encamî têzeke, hendê kemayesîy em romanane derdaxat ke lewane, kembûnî diyalog û zorbûnî monolog eê wate, "piranî karakter ne diyalojîk, berevajiyê vê monolojîk in" (Guler, 2019: 113). Herweha nûser pêy wa ye karakterekan, be zorî, serbest nîn û karîgerîy hez û têîwanînî romannûsan le meî pirsên peywest be netewe û nasname û wîlat be seryanewe diyar e (113). Serefay emane, Guler bem encame degat ke karakterekanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî û Sobarto*, le çaw ewanî dîke, be şewey serkewtûwanetir daiêjrawin û baştir niwênerayetîy komeļgey xoyan deken (III; 113).

Bêcge le em lêkolîneweye, çend nivîs le ser malpefekan da le pêwendî lege em romaney Ozmen da biław bûnetewe. Lewane, Orhan Vural be nûsînî "*Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî û Şener Ozmen*", paş şirovey zincîrey rûdawekanî romanî berbas, analizêkî giştî, nek be gwêrey boçûnêkî diyarîkiraw, pêşkeş dekat. Her weha le dirêjey nivîsekey da be kurtasî deperjête ser girîngî, dem, şiwên, şewey gêfanewe, karektêrekan û zimanî deqeke. Nûser sebarete be kesayetîy serekîy romaneke, denûset: "Mirov dikare Sertac karan wekû civaka Kurd bihesibîne. Yanî gava ku Sertac karan dibêje 'ez', dixwaze bibêje 'civaka min' (bendname.wordpress.com).

Her lem pêwendîe da Ferzan Şêr le kurte nivîsêk da be nawî "*Çîrokên Şener yê Neqediyayî*" awîfî le dem, teknîk û şewaz û nûsînî em deqe dawetewe. (www.academia.edu). Dilawer Zeraq, Xelîl Semed û Çetoyê Zêdo jî, be hênanewey hendê pardeqî em romane, hewlî nasandin û şirovey giştîy beşe ciyaciyakanyan dawe (amidakurd.net & cetoyezedo.blogspot.com). Her weha Ergîn Opengîn le witarêk be nawî "*Repertuara Zimanî û Afrandina Edebî: Nirxandineke Zimannasî li ser Edebiyata Kurmancî ya Hevçax*" le romanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, wek nimûneyekî lawekî, kelkî wergirtûwe û le barî zimanîyewe tawtwêy kirdûwe. (Alan û Opengîn, 2014: 208-173).

Le pêwendî lege twêjînewey edebî, be gwêrey çemke rexneyîyekanî Louis Althusser, be pêçewaney wêjey Kurdî, le wêjey gelanî tir da û bo nimûne le edebiyatî Farsî da, çendîn xebat û twêjînewe le ser çîrok û romanî Farsî encam dirawin. Lewane, Sadjadi û Ehmedîfîrad (2018), Sefayî û Karger (2016), Tacbexş û Qasimîpûr (2014) û Sadiqî (2008), le witarên ciyaciya da, romanî *Çeşmhayêş* [Çawekanî] nûsînî Buzurg Elewî, çîrokî 'Lebxendê Enar' [Pêkenînî Henar] nûsînî Hûşeng Muradî Kêrmanî, çîrokî 'Beçeyê Merdum' [Mindalî Xelkî] û romanî *Bamdadê Xumar* [Şebengî Xumar] nûsînî Fetane Hac Seyid Cewadyan tawtwêy kirdûwe.



## Awîrêk le Mêjûy Romanî Kurdî

Roman, wek sercemî edebî Kurdîy sedey bîstem, kewte ber bandorî qedexey zimanî û berbestî dewletanî baladest bo pêşgirtin le geşey hemelayeney komelgey Kurdî; boye, leçaw edebî Erebi, Turkî û Farsî direngtir serî heîda. Seretay serheîdanî roman le edebî Kurdî da bo salî 1930 yan 1935 û çapî *Şivana Kurmanca* nûsînî Erebe Şemo le Yêrîvan degefêtewe. Em destpêke, ke saîanêkî zor û ta kotayî heftakan dirêjey kêşa, be witey Ehmedzade (2018b: 198), “lawaz û leserxo” û le salî 1980 be diwawe, be şewey “pitew û berdewam” geşey kirdûwe. Jimarey romanî Kurdîy çapkiraw le katî biîawbûnewey yekem romanewe ta kotayî heftakan, zor keme û birîtin le romanekanî tirî Erebe Şemo, wek *Berbang* (1958), *Jiyana Bextewar* (1959), *Dimdim* (1966) û *Hopo* (1969); her weha *Xatê* (1959), *Dê* (1965) û *Gundê Mêrxasan* (1968) nûsînî Elî Evdirehman, *Hewarî* (1967) berhemî Hecî Cundî û *Kurdî Rêwî* (1979) be pênuşî Sihîdê Îbo. Em berhemane le layen Kurdanî nawçey Qefqazewe nûsrawin û le Yêrîvan çap kirawin.

*Pêşmerge* (1961) nûsînî Rehîm Qazî û *Janî Gel* (1972) le Îbrahîm Ehmed jî dû romanî Soranîy em qonaxe n. *Janî Gel* le salî 1956 da nûsrawe, belam 16 sal diway ew rêkkewte, le qalbî kitêb da û le şarî Silêmanî hatote weşan. Şiyawî bas e ke *Meseley Wîjdan* nûsînî Ehmed Muxtar Begî Caf jî le salî 1927 yan 1928 nûsrawe û be ray zor kes, yekemîn romanî Kurdî ye, belam kêşeke lewe da ye em deqe ziyatir le çil sal diway nûsînî, le salî 1970 çap kirawe (Ehmedzade, 2018b: 203). Elbet le ser çîrok yan romanbûnî em deqe hêştta gengeşe le gofê daye. *Pêşmerge* nawnîşanî yekem romanî çapkirawî Soranî û yekem romanî Rojheîatî Kurdistan, le Bako nûsrawe û salî 1961 le Bexdad çap kirawe. Nûserekey, Rehîm Qazî, yekêk lew gencane bûwe ke salî 1946 le layen karbedestanî Komarî Kurdistanewe rewaney Bako kirabû. Nawbiraw diway rûxanî Komar, ta piley duktoray mêjû dirêjey be xwêndin da û ta kotayî jîyanî her lewê mayewe (206).

Bakûrî Kurdistan, serefay ewey lexogirî zorîney Kurdan e, le ber serkutî tundî çapemenî Kurdî, ta kotayî sedey bîstem, rêy geşey edebî û bem pêye berhemhênanî romanî lê gîra. Bextewerane têkoşanî Kurdanî nîştacêy sovyet beşêkî em kemayesîyey qerebû kirdewe; belam le ber şalawî berdewamî zimanbîrî, tenanet piştî têpeînnî penca sal le yekemîn romanî Kurmancî, dîsaneweş le henderan û tarawge da pişûy siwarî ziman û edebî Kurdîy dîsanewe nextêk hêwir bûwewe. Romanî Kurdî, be taybet be zarî Kurmancî, wek çon destpêkekey le derewey Kurdistan da bû, le tarawge û le ser destî ew nûserane da jîyayewe ke be tawanî nûsîn be zimanî dayikî le

layan deselatdaranewe rûbeûy girtin û eşkence û zîndan bûbûnewe û be naçar zêşî le nîştimanî xoyan dabîan. “Dû qazancî girîngî koçerbûn, wate azadîy çapemenî û hebûnî hel û pêdawîstî bo pêşkewtinî wêjey koçberan, be taybet le Suêd da, le hokare zor karîgerekanî geşey edebî Kurdî, be taybet roman in” (Ehmedzade, 2018b: 196). Aweha ye ke, tarawge be nîştimanî serekîy romanî Kurdî dadenirêt (193).

Pêvajoy perepêdanî janrî girîngî roman, le heştakan da û le encamî helwêstî biwêraney nûseranî zimanperwerî lezêdder kiraw û be palpiştîy hendê wilatî Ewrûpayî, be taybet Siwêd, rêy serkewtinî dozîyewe. Bem çeşne, romanî Kurmancî le ser destî nûseranêk wek Birîndar, Mihemed Uzun û Mehmûd Baksî le Ewrûpa bûjayewe. Çalakîy xurtî nûseranî tarawge bo zîndûkirdinewey ziman û edebî nîwegiyanî Kurmancî, şiwênî erênîy le ser rewşî nawxoyş dana; be çeşnê ke êsta le Stenboî û Amed jî kitêbî Kurdî û lewane roman dêne çapkirdin. Rewtî geşey romanî Kurdî be zarî Kurmancî le henderan û nawxoy Turkiya û Bakûrî Kurdistan le newedekan bem lawe geşey ziyatirî kird û le 10 saî kotayî sedey bîstem da ziyatir le bîst roman hatine weşan. Em geşesendine legel destpêkî sedey bîst û yek da zor xêratir bûwewe û ta salî 2010 le sed romanî têpefandûwe. Hendêk le kesayetîye nasraw û çalakekanî romanî Kurmancî, bêcge le ewaney serewe, birîtîn le, Hesênê Metê, Medenî Ferho, Bavê Nazê, Jan Dost, Helîm Yûsiv, Firat Cewerî, Silêman Demîr, Lokman Polat, Îbrahîm Seydo Aydogan, Remezan Alan, Mezher Bozan, Omer Dilsoz, Ebas Ebas û Şener Ozmen (Yûsiv, 2011: 34-45).

Romanî Kurdî be zarî Soranî, le nawefastî heştakan bem lawe geşey zor û zortirî kirdûwe. Başûrî Kurdistan, le ber helî guncaw, çendîn romannûsî çalakî perwerand û lewê zor berhem biław kiranewe; bo nimûne, berhemekanî Hisên Arif û Mihemed Mukrî le heştakan da û le newedekan bemlaşewe, romane nasraw û şiwêndanerekanî Bakhtiar Elî, Şêrzad Hesên, Ferhad Pîrbaî, Eta Mihemed û Cebâr Cemaî Xerîb. Em rewte le Rojhelatî Kurdistan da, direngtir destî pîkird û ta êsta le rûy jimarewe romanî zorî tê da berhem nehatûwe, eger çî romannûsî serkewtûy lê helkewtûwe. Em parçeye, sî sal paş *Pêşmerge*, romanî be xoyewe nedî, ta dîsanewe le salî 1990 be *Hawareberey Fetah Emîrî* serî heldayewe. *Mîrza* (1993) û *Zindexew* (2003) nawî dû romanî tirî nawbiraw in. Hawkat legel em destpêkirdineweye, çend nûserî penaberî siyasî le Ewrûpaş romanekanyan biław kirdewe, ke birîtîn le, Elî Hesenyânî, Kerîm Danşyar, Siyamend Şêx Aqayî, Teyfûr Bêtayî, Kamran Hamîdî û Se'îd Kawe. Le nûseranî dîke, ke berhemekanyan le nawxoy Kurdistan da çap kirawin, detwanîn Nesrîn Ce'ferî, Omer Mewlûdî, Hisên Şêrbegî,

Ferûx Ni'metpûr, Zêneb Yûsîfî û Şaram Qewamî naw berîn. Ta êsta dû romanî Kurmancî jî be nawî *Bilican* (2002) û *Hawara Bilûrê* (2017), le layen Perwîz Cîhanî û Yûsîf Hemîdewê berhem hatûwe (Ehmedzade, 2006: 78-88).

Be witey Ehmedzade (2006: 83) “pêşkewt û geşe û neşey romanî Kurdî le Kurdistanî Êran le barî şêwazewê wêdeçê le karekanî Eta Nehayî da diyar bêt: *Gulî Şoran* ke salî 1998 biław bowe û *Balindekanî Dem Ba* ke le 2002 da hate weşan”. Em romaneyê, be pêçewaney ewaney pêşû ke beşêkyan xebatî siyasî û çekdarî û ewanî tîryan bûjanewey rabirdû û “serdeme xoşekan” û jiyanî gundnişînî be şêwey sakar û hêlî degêfnewe (82), le gêfanewey takhêlîy dîrkewtûnetewê û le barî nawerokewê, perjawnete ser jiyanî çendîfehendişê şar û derûnî alozî takekanî komeleşe. Romanekanî Nehayî le salî 1998 û 2002 û sêyem çalakîyê serkewtûwaney benawnîşanî *Girewî Bextî Helale*, le salî 2007 da çap kirawin. Lem salanê diwayî da û paşê pêşxistinî em çeşne edebîye le ser destî nehayî, em rewte be pênuşî Seyîd Qadîr Hîdayetî dirêjey pê dirawê û romanên wî, *Toqî Ezazîl* (2008) û be taybet *Gaboî* (2015), serincî rexnegîran û xwazyaranî pêşkewtinî edebî Kurdîyan rakêşawe.

# BEŞÎ YEKEM

## ÇIWARÇÊWEY TEORÎK

### 1.1. Pêşekî

Edebiyat le layekewe, niwênerewey dinyay derûnîy mirov û le layekî dîkewe, derxerî rastîyekanî dinyay derekî, wate komeleşe û pêwendîe mirovîyekane. Xwêndinewey çeşne rengamekanî wêje, detwanêt le nasînî çetirî mirov û derxistinî layene şardirawekanî jîyanî da yarmetîderman bêt. Bo em mebeste, bîrdaiêjan gelêk teorîyan dahênawe û le goşenîgay ciyaciya û lêk ciyawazewe le wêje û ferhengiyan koîwetewe. Hendêk le teorîyekanî rexney edebî û ferhengîy hawçerx birîtîn le rexney derûnşîkarane, rexney fêmenîstî, rexney niwê, rexney pêkhatexwazane, rexney paşpêkhatexwazane, rexney mêjûyîxwazîy niwê, rexney paş-kolonyalistî û rexney Marxistî.

Marxîsm wek pergalêkî hizrî, rewşî abûrîy komeleşe û çonyetîy bekalabûnî hemû çitêk û çewsandinewey zorîney pioltariya le layen kemîney borjiwazewe, be binema degrêt û lem riwangewe le pêwendîekanî nêwan mirovekan dekolêtewe. Be pêy nêrînî rexnegiranî Marxist, bedesthênan û parastinî hêzî abûrî, amancî hemû çalakîyekî siyasî û komelayetî ye û “eger teorîyek serincî nexate ser waqî'e abûrîyekanî ferhengî mirovî, xwêndineweyekî rast û dirust le ferhengî mirovî bedestewe nadat” (Tyson, 2015: 96). Ke wa bû, teorîye Marxistîyekan, waqî'î madîy û mêjûyî komeleşe û pêwendî mirovekan le ser em binemaye, wek diyaxerî hemû pêwendîekanî tir û hoy deselatî çînî baladest û bêdestîy çînî bindest, tawtwê deken. Diwa amancî Marxism le perdeladan le ser rastîyekanî komeleşe û şirovey nadadperwerî, “hênanegoî goîankarî le aqarî komelayetîdaye” (Klages, 2015: 171).

Bîrmendanî benawbang û şiwêndanerî teorî û rexney edebî û ferhengî, be kelkwegirtin le boçûnekanî Marx û Engels le sedey nozdeyem, berdewam û heta niha em pergale hizrîyeyan geşe pê dawê û goîwyane û gelêk çemkî taybet û serinciakêş û karîgeryan xistoteserî. Teorîy edebîy Marxistî be kelkwegirtin le bîr û boçûnekanî bîrmendan û felsefekaranî gewrey cîhanî wek Mikhail Bakhtin, Antonio Gramsci, Louis Althusser, Michel Foucault, Walter Benjamin, Pierre Macherey û Berthold Brecht geşey kirdûwe û çendîn liqî lê ciya bûwetewe. Rexnegiranî teorîy edebîy Marxistî “dexwazin bizanin edebiyat çonçonî detwanêt wek hêzêk bo goîankarîy

komelayetî, yan jî cextkirdinewe le ser rewşî amade yan cêgîrkirdinî kar bikat” (Klages, 2015: 176). Be gwêrey riwangey rexnegiranêk wek Brecht, Benjamin û Althusser, “edebiyat corêk le îdeolojî ye ke le şêwegelî dîkey îdeolojî û her weha le jêrxanî abûrî, ta radeyêk serbexoye” (178). Althusser, wek yekêk le bebandortirîn bîrmendanî em aqare, be sûdwegirtin le binemay fikrîy Marx û be pêdaçûnewe û rexnelêgirtinî, bûwe pêşengî têpeîn le bîrî Marxismî nerîtî û bedhênerî têwanînêkî niwê bo pêwendîekanî navberî dû çînî baladest û bindest.

## 1.2. Louis Althusser

Louis Pierre Althusser le Octoberî saî 1918 le binemaleyekî Katolîk le Birmendreis le nizîk Elcezîrey wîlatî Cezayir le dayik bû. Bawikî mamostay qutabxane bû û diway xanênşînî, erkî beîweberî bankî pê sipêrdira. Binemaleyekî saî 1930 koçyan bo Feranse kird û le Lyon û Marseille da gîrsanewe. Saî 1939 le taqîkarîy xwêndingey astberzî Ecole Normal Supérieur le Paris wergîra. Nawbiraw ke Katolîkêkî demargirj bû, bizûtneweyekî xwêndkarîy Mesîhî damezrand û çalakîye ayînîyekanî dirêje pê da. Legel destpêkirdinî şeî dûwemî cîhanî, xizmetî serbazîy be ser da sepa. Le saî 1940 da le layen hêzekanî Eîmanyawe be dîl gîra û bo mawey pênc sal rewaney ordûgayekî Bakûrî Eîman kira. Lewê le ber karî dijwar û taqetpîrûkên le nexoşxane kewt. Paş çakbûnewe, karî peristarîy nexoşxaney ordûgay pê sipêrdira û lew maweye da tiwanî biperjête ser edebiyat û felsefe. Diway rizgarbûnî, xwêndinî le École Normale Supérieure dirêje pê da û le saî 1947 têtî duktorakey le ser Hegel nûsî û saî diwatir wek mamostay felsefey ew nawende akadêmîke demezra û çalakîye zanistîyekanî lewê dirêje pê da.

Althusser saî 1948, wek zorbey roşinbîranî ewdemî Feranse, bû be endamî hizbî komonîst; belam ta seretay pencakan destberdarî kilêsey Katolîk nebû. Em bîrmend û bîrdaêje mezine le saî 1960 bem lawe, be şewey şelgîrane, be qûlayî berhemekanî Karl Marx da roçû û raveyekî lê kirdin ke be pêçewane û le dijî riwangey hawbîranî Marxismî da bû. Nawbiraw berheme zanistîyekanî Marxî le berheme îdeolojîk û nazanistîyekanî heşweyard û ta saî 1966 binewaşe serekîyekanî zanistî Marxismî rûn kirdewe. Le 10 saî kotayî temen da, ke renge le ber doxî naxoşî serdemî mindalî û her weha dîlêtîy le Eîman da bûbêt, tûşî nexoşîy derûnî û têkçûn bû, ta wehay lê hat Hélène Rytmanî hawjînî, diway 30 sal pîkewejîyan, xinkand û bo mawey 10 sal ta nizîk mergî be cêtey dîl le 22î Octoberî 1990, le nexoşxaney derûnî xiraye bin çawdêrîy pizîşkîyewe (Ferretter, 2013: 11-12; Althusser, 2017: 53-54; Lopez, 2016: 92).

### 1.3. Marxîsmî Pêkhatexwazane û Riwaney Rexneyî Althusser

Bîr û boçûn û berheme rexneyîyekanî Marx, sereîay têpeînî salanêkî dûr û dirêj, hêsta le birew nekewtûwe û ta êsta bûwete jêderî hizrîy komelek teorî û boçûnî ciyaciya. Dû jêrlîqî berçaw û şiwêndanerî em qutabxane fikrîye, Marxîsmî Orthodox û Marxîsmî Hegelî n. Em dû rewte rexneyîye ta serheldanî şepolî niwêy Marxîsm, Le ser destî Althusser, hewênî şirove û ravey rexnegiran û rûnakbîranî çepger bûn. Belam em bîrmende, be lêkdanewe û ravekirdinewey berhemekanî Marx û her weha be rexnelêgirtin û beojkirdinewey Marxîsm, rûberûy ew dû şêweîwanîne bawe bûwewe û kem wikûîyekanî xistine berçaw.

Nawbiraw le bin bandorî bîrdaiêj û perepêderî teorîy pêkhatexwazî, wate Ferdinand de Saussure, zimannasî nasrawî Siwîsî û Klaude Levi Strauss, mirovnasî benawbangî Ferensî, xoy lew rêçke fikrîye bawaney Marxîsm rizgar kird û le ser heman binyat, delaqeyekî niwêy be ser dinyay felsefe û rexney ferhengî-edebî da kirdewe. Be pêy nêrînî Saussure, zimannasî beşêk e le zanistêkî berbiawtir be nawî nîşanenasî û lem riwaneyewe le diyardey ziman “wek sîstemêkî yekekan ke girîngêtiy her kamyan lêkewtey pêwendî ew yekeyeye be yekekanî dîkewe” (Ferretter, 2013: 46) dekolêtewe. Strauss be gwastinewey em binema hizrîye bo mirovnasî û komeînasî û her weha be kelkewergirtin le twêjînewekey Vladimir Propp sebarete be morfologi çîroke efsûnawîyekan, nîşanî da ke dekirêt dab û nerît û diyarde mirovîyekan û hemû ew çitaney girêdirawî ferheng in, be heman şêwey Saussure tawtwê bikirên (Ferretter, 2013: 46; Bertens, 2003: 86).

Be pêy em riwaney, Althusser pêy wa ye “eger Marxîsm be başî binasîn, boman derdekewêt komeîge sîstemêk e le pêwendîekan; sîstemêk ke her hêmanêkî tenya le pêwendî legeî hêmanekanî tir da fam dekirên” (Ferretter, 2013: 48). Nawbiraw, le pênaw pênasay dirustî komeîgey mirovî da, bîrî mirovxwazaney xoîzgarkerî û xobiîyarderîy mirov û her weha, rehaxwazîy abûrîy û behendwernegirtinî rehendekanî tirî civakî daye ber rexne û teorîyekî niwêy hênaye goîe ke be Marxîsmî Pêkhatexwazane nasrawe. Elbet, pêwîst e bigutrêt, sereîay ewey Althusser çalakîye zanistî û rexneyîye girîngekanî le bin bandor û le keşî zalî pêkhatexwazî le Feransey şestekan da encam dawê, be ray Luke Ferretter, nawbiraw “pêkhatexwazêkî aşkira nebû û nabêt be Marxîstêkî Pêkhatexwaz nawbirde bikirêt Ew hendêk le wîtare serekîyekanî *Bo Marx û Xwêndinewey Sermayey* le keşêkî ferhengî da nûsî ke pêkhatexwazî têy da mîtodnasîy zal bû” (48). Nawbiraw bo xoyşî, be pêdagirîyewe, nikofî le pêkhatexwazbûnî dekar û be aşkira

delêt: “Ême hergîz pêkhatexwaz nebûyne”(Althusser, 1976: 205).

Le rastî da Althusser be mebestî ravey berhemekanî Marx û teorîy Marxism û peredan be boçûnekanî xoy, le dû rewî fikrîy naMarxistî kelkî wergirt ke yekêkyan pêkhatexwazî û ewî dîkeşyan me'rîfenasîy mêjûyî bû ke nerîtekî Ferensî bo têfîkrîn le mêjû û çîyetîy zanist bû û bo berhemekanî Alexandre Koyré, Gaston Bachelard û Georges Canguilhem degeîetewe. Nawbiraw sê taybetmendîy abûrîbaweyî, mêjûbaweyî û mirovbaweyîy reha û petîy rewî zalî Marxismî xiste ber rexne û be awîdanewe le berhemekanî Marxî pêgeyştû, wate behemekanî demî pîrî, selmandî ke Marxismî zanistî le çîwarçêwey economism, historisistism û humanism da cêy nabêtewe (Althusser, 2017: 56). “Têgeyînî Althusser lew şêweyey sêje pêk dehênrêt, be tewawetî, pîşanderî riwangey dije humanistîy ew e. Le katêk da ke humanism mirov be azad, xoser û hoşyar pêname dekar, be pêçewanewe, ew pêy wa ye mirov, be tewawetî, sêje îdeolojî ye û bo xoyî dewrî serekî degêrêt le berhemhênanewey barûdaxî rewî besûjebûnî xudî xoy da” (Sadjadi, 2012: 94).

Eger çî Althusser wek rexnegirêkî Marxist dête nasîn û kesanêk wek Balibar pêdagirî le ser Marxistbûnî deken û be tundî, le dijî ew riwangey dewestî ke teorîyekî niwêy afrandibêt (Althusser, 2017: 19). Belam, le beramber da, Badiou (2009: 325-326) boçûnekanî Althusser nek be dirêjepêderî Marxism, belkû be dabiian lew rewte û be pirojeyekî taqane û taybet be xoy wesfî dekar. Peter Miller (2009: 11) jî riwangeyekî hawşêwey heye û le pêwendî legel teorîy îdeolojîyekey da, delêt: “Lew teorîye da, Althusser le hewlî binaxedanan bo Marxismî ‘rasteqîne’ le ser binemay hendê deqî serekî da nîye, belkû le rastî da deyewêt le komelêk binewasey Marxistî derbaz bibêt û le bineiet da ew bîrokeyey îdeolojî ke le qalbî heqîqet/batîl [rast/naiast] da dexiraye ber bas ret bikatewe û îdeolojî be watay berhemhênanî subjêktîvîtey le cê dabinêt”. Althusser bo xoy le witarî “Qeyranî Marxism” da (1970), be amaje be barûdaxî Yekêtî Soviet le serdemî deselatî Stalin û şikistî teorîy Marxistî le goînî rewşî jîyanî çîne bindestekan da, denûsêt: “Ew qeyraney têy da dejîn naçarman dekar be pêwendîman legel Marxism da biçînewe û le encam da, le xudî Marxismîş da çitêk bigoîn” (Ferretter, 2013: 165). Nawbiraw sereîay ewey rêy rizgarî mirov le Marxism da debînêt, belam be çawbestrawî lêy nanoîet û le xojîyannamekey da be nawî *Dahatû bo Maweyekî Zor Demênêtewe*, delêt: “Min be tewawetî wefadarim bew materialismey bû be îlhambexşî Marx, herçend be serûberî qibûlim nîye, karêk ke hergîz sebarek be hîç çitêk nemkirdûwe” (168).

Yekêk le ladane girîngekanî Althusser le teorîyekey Marx, wêiy pejrandinî binemay riwangekanî ew, pênasay niwêy astekanî komejge ye. Nawbiraw, be awîdanewe le têwanînî Marx bo komejge, denûsê:

Marx komejge be pêkhatûy ‘astgel’ yan ‘rûgelêk’ dezanê ke be gwêrey diyarîkerêtiyekî taybetewe lêk girê dirawin. Em ast yan rûgele birîtin le jêrxan yan binemay abûrî (wate, ‘yekêti’y hêzên berhemhênan û pêwendîekanî berhemhênan) û serxan, ke emeyan bo xoy dû ‘ast’ yan ‘rû’y heye: rûy qanûnî-siyasî (qanûn û dewlet) û îdeolojî (îdeolojîgeli corbecorî ayînî, exlaqî, hiqûqî, siyasî û htd). (Althusser, 1971: 90)

Bem wataye, jêrxan yan binemay abûrî dewrî diyarîker degêê û xawen pêwerî kartêkerîy taybet e ; wate, ewey le serxan da rû dedat, le ‘diwa halet da’ peyweste be rûdawekanî girêdiraw be jêrxanewe. Althusser wêiy pêdagirîy le ser diyarîkerêtiy binemay abûrî, pêy wa ye “be piştbestin bem pêwerî karîgerîy ‘diwa halet’, bêguman ‘xanekanî’ sereweş bo xoyan hegirî pêwergeli kartêkerîy ciyawazin” û kartêkerî û “diyarîkerêtiyekanyan be hoy binemakewe diyarî dekirê”. Nawbiraw pêwerî kartêkerî yan diyarîkerêtiy serxan bem çeşne wêna dekat: 1. Serbexoyî serxan le jêrxan; 2. Hemberkirdey serxan le ser jêrxan (91).

Be ray ew, rûnbûnewey em pirse û têgeyiştin le çiyetîy serxan, tenya le goşenîgay berhemhênaneweyewe dekirê û wek xoy delê: “Têzî binemayî ême ewe ye ke hênanegoî em pirsyarane (û wîlamdaneweyan) nalwê, meger le riwangey berhemhênaneweyewe” (Althusser, 1971: 92). Bem çeşne, deperjête ser şirove û nasandinî dezgayên îdeolojîkî dewlet wek beşên pêkhênerî serxanî komejge. Althusser be ciyakirdinewey dezgayên îdeolojîk le dezgayên serkutkerî dewlet, teorîyekî niwê û ciyawaz le riwangekanî ewkatî Marxismî hênaye berhem. Em dezgagale eger çî hemûyan le riwalet da le bin çawdêrî û le jêr rikêfî dewlet da nîn û ser be kertî taybet in, belam le pêdaw heman amanc û siyaset û bo rewadan û dirêjedan be deselatî çewsênerane û barûdoxî nadadperwerane têdekoşin. Le rastî da emane n ke dewlet û deselat deparêzin û rewşî cêgîr berhem dehênewe.

Riwange niwêyekanî Althusser le meî Marxism û rexnegirtin le kemûkûfîyekanî hizrî Marx û her weha hênanegoî basî ‘dabîran’ le bîr û berhemekanî da, ke bew pêye berhemekanî Marxî lawî be pêçewaney ewaney qonaxî pîrî û pêgeystûyî, be nazanistî, îdeolojîk û humanistî nawdêr kird, bûwe hoy hestanî lafawî dijayetî û berhehistkarî le layen layengiranî Marxismî



nerîtiyewe; be çeşnêk ke John Lewis, felsefekarî Marxistî nasrawî Îngilîzî û E. P. Thompson, le nasrawtirîn mêjûnasanî Marxistî Îngilîzî, le dijî helwêstiyên girt û le wîtar û nûsînekanyan da be nexoş û nezan û tenegeyiştû le Marx nawyan bird (Althusser, 2017: 68-69; 322). Sereîay em dijayetîyane, boçûnekanî Althusser le ser hizrî bereyek le bîrmendanî Feranse, wekû Derrida, Kristeva, Barthes, Foucault û Deleuze şiwênî berçawî hebûwe (Payne, 2000: 61).

## 1.4. Têgehe Rexneyîyekanî Althusser

### 1.4.1. Îdeolojî

Îdeolojî çemkêkî bineietîy boçûne rexneyîyekanî Marx û Engels e; belam hîç kamyan be şewey tekûz û rêsamend şiroveyan nekirdûwe. Em têgehe bo yekem car le salî 1796 da le layen Cabanis Destutt de Tracy Ferensî û hawîyanyewe û le jêr nawî teorîy îdekan (Wedîhatin û pêgeyiştinî îdekan) hate goîê û amancyan dahênanî zanistî niwêy îdenasî bû ke bew pêye le îde û bîrokekan wek objegelî ciya le watay fizîkîyan dekolînewe (Althusser, 2017: 315). Belam Marx û Engels îdeolojîyan bo mebestêkî ciyawaz û bo pênasay pêwendî çînekanî komeleşe û hoy qibûlkirdinî nadaperwerîy abûrîy û şirovey hokarekanî çewsandinewey zorîney xelk le layen kemîneyêkî xawen keristey berhemhênanewe bekar hêna. Marx her be lawî pêy wa bû “îdeolojî, komeleşe bîroke yan wênan ke be ser birî tak yan komeleşe mirov da zaîn” (Althusser, 1971:106).

Althusser be peredan be em têgehe girîng û binemayîye, teorîyekî niwêy hênaye nêw goîepanî rexnewe, ke wek “karîgertirîn û piîbayextirîn diyarîy ew bo lêkolînewe edebî û ferhengîyekan” nawî lê debirêt (Ferretter, 2013: 104). Û be witey Bertens (2003: 117) jî, boçûn û şewey “şîkarîy Althusser, çonyetîy karkirdinî îdeolojîy le wêje da pîşan dayn”. Îdeolojî, be gwêrey lêkdanewey nawbiraw, xawen dû rehendi girîng e: yekem, le çendîn şewey rengawîeng da xoy denwênêt û dûwem, derbiî helwêstî çîneyetî ye. Nawbiraw be serincdan bem witeyey Marx ke delêt “îdeolojî mêjûy nîye” û her weha be pêy riwangey Sigmund Freud ke delêt “naxudaga ebedîye”, îdeolojî le watay giştî da be waqî'êk namêjûyî û ebedî û herma dezanêt dezanêt, waqî'êk ke le hemû şiwênêk da amade ye. Eşbet mebestî le wişey ‘ebedî’, babetêkî ewpeimêjû û ewpeizeman nîye, belkû lem wataye da, mebestî dirêjayî mêjû ye û bem pêye bew wataye le berçawî deşret ke be şewey taybet le sertaserî mêjûy teşebendîgelî komeleşetî da amade ye (Althusser, 1971: 107-108). Be pêy nêrînî Althusser:

Îdeolojî le rastî da sîstemêk e le niwandinewekan, belam em niwandinewane hîç pêwendîekyan be ‘agayî’ewe nîye: emane zortir wêne n û hendêk carîş çemk, belam le piştewey emane da pêkhategelêk hen ke be ser zorbey zorî mirovekan da dadesepênrên; lê nek le rêy ‘agayî’yanewe. Emane objegelî ferhengî qebûlîkiraw-famkiraw in û le rêy pêvajogelî dûr le dest û deselatî mirovewe be seryan da dadesepênrên. (Ferretter, 2013: 106)

Ew bo nasandinî têzî serekîy xoy sebarek be îdeolojî, dû têzî pêwendîdar tawtwê dekar; yekyan, îdeolojî be xawenî bûnêkî nek armanî, bawemendane û rohanî, belkû madî dezanê û Althusser emeyan be erênî û rast naw debat û pêy wa ye bo pêşxistinî şîkarîy peywest be çiyetîy îdeolojî pêwîst e. Be pêy têzekey tir, “îdeolojî, pêwendî xeyalîy takekan be rewşî waqî’îy bûnyanewe, wêna dekar” (Althusser, 1971: 109). Nawbiraw em têze be nerênî û natewaw wesf dekar û delêt ger way dabînêyn ke îdeolojîyekan le wehim û xeyal çê bûne, detwanîn emeş bîlêyn ke kinaye û dirke n le waqî’î jîyan (îdeolojî = wehim/dirke) û be ravekirdinyan detwanîn le waqî’î em cîhane bigeyn.

Ew be mebestî derxistinî natewawîy em têze, dû nimûne ravey mîkanîkî û ravey te’wîlî denasênê û kemûkûnîyekanyan şîrove dekar. Ravey mîkanîkî ke le sedey hejdehem da baw bûwe û bo nimûne Xuda be wêney xeyalîy padşay waqî’î dezanî. Ravey te’wîlî jî karbedestanî kilêse dayanênawe û w be witey ew, diwayî kesanêk wek Feuerbach û Barth bûjandûyanetewe; bo nimûne, le riwangey Feuerbach da, Xuda cewherî serekîy mirovî waqî’î ye. Be nêrînî Althusser, weha ravegelêk sebarek be berawejûkirdinewey xeyalîy waqî’ le îdeolojî da, bem encameman degeyênê ke “mîrovekan le nêw îdeolojî da, rewşî bûnî rasteqîneyan be şeweyêkî xeyalawî wêna deken”; belam lêre da ewey wîlam nadirêtewe ewe ye ke hokarî em çewt têgeyîştîney mîrovekan le waqî’î jîyanyan û teşegoîy xeyalîy em rewşe le îdeolojî da, çîye. “destey yekem welamêkî sade pêşnyar deken: tawanî em babete le estoy keşekan û sitemkarane. Emane hendêk diroyan helbestûwe bo ewey mîrovekan be xeyalî milkeçîy Xuda, le rastî da milkeçî keşe û fermanîewa zalmekekan bin û em dû layene zorkat lem xapandine da hawdestin”. (Althusser, 1971: 110). Destey dûwem, ke be pêy witey ew zortir be laiê da çûne, hokarî em babete bo “lexonamoyî madîy zalî ser rewşî jîyanî mîrovekan” degeîêninewe. Nawbiraw, em ravegele piştbestû bem têze dezanê ke, “ewey le wênay xeyalîy cîhan da - le her îdeolojîyek da - reng dedatewe, her rewşî bûnî mîrovekan û le akamîş da cîhanî waqî’î ewane” (111).

Althusser paş lêkdanewe û derxistinî kemûkûnîyekanî, cext dekatewe ke, “ewey mirovekan le îdeolojî da bo xoyanî wêna deken, rewşî waqî’îy bûnyan nîye, belkû ziyatir le her çitêkî tir, pêwendîyan legel em rewşey bûnyane ke le îdeolojî da wêna dekirêt” (112). Em pêwendîye ye ke le nawendî her wênayekî îdeolojîk û bem pêye le her çeşne wênayekî xeyalîy cîhanî waqî’î da ye. Be zimanî Marxistî “ew wênayey takekanî çalak le postgelî kargêianî berhemhênan, çewsandinewe, serkutkarî, peredan be îdeolojî û kargêianî piraktîsî zanistî, le rewşî bûnî xoyan heyane, le akam da berhemî pêwendîekanî berhemhênan û pêwendîekanî girêdirawî pêwendîekanî berhemhênanane, ke wate, her îdeolojîyek, le teşegoîy benaçar xeyalîy xoy da, nek pêwendîekanî berhemhênanî amade (her weha pêwendîekanî berhamhatû lewan), belkû pêş hemû şitêk pêwendî (xeyalî) takekan legel pêwendîekanî berhemhênan û pêwendîgelî berhemhatûy ewan [wek pêwendî çîneyetî] wêna dekat (Althusser, 1971: 112-113). Be giştî, “îdeolojî birîtiye le rewî gutar, wêne û îdegelêk ke le hemû katêk da dewreyan dawîn, ême le nêwyan da le dayik bûyn, gewre bûyn û le nêwyan da dejîn û têdefkirîn û decûlêynewe” (Ferretter, 2013: 107).

Lem goşe nîgayewe îdeolojî be xawen bûnêkî madî ye. “Her core îdeolojîyek hemîşe le dezga û piraktîs yan piraktîsekanî em dezgaye da bûnî heye û em bûne madî ye” (Althusser, 1971: 112). Madîbûnî îdeolojî le katêk da derdekewêt ke takekan le çîwarçewey dezgayekî îdeolojîk da, be riwalet be şewey azadane û be xwastî xoyan, bawefekanyan le şewey piraktîs yan kirdegelî lepêşdiyarîkiraw da dexene rû û debin be sûjey ew îdeolojîye. Bawegelêk ke tak wek sûje û lew pefî hoşyarî û azadî da hefîbjardûwe, be ew piraktîsanewe girê dirawin. Bo nimûne eger bawefî be Xuda heye, deçête kilêse û le rêûfismekan da beşdarî dekat, be lay qeşewe dan be tawanekanî da denêt û tobe dekat; yan eger bawefî be dadperwerî hebêt, be bê difdûngî milkeçî yasakan debêt û tenanet le katî hefeşe kewtine ser em yasagele, nafezayetî derdebêt.

Îdeolojîy berbasî Althusser, xawen dû xesletî serekî ye: Yek, be serincdan bewey îdeolojî birîtiye le pêwendî xeyalîy hemû mirovekan legel waqî’î jiyanyan da, natwanîn wek ‘gutarêkî amrazîyane’ û dardestî çînî serdestî le berçaw bigrîn ke bew pêye çîne bindestekanî pê dexapênin. “Althusser pîşan dedat ke le rastî da çînî serdest jî wekû çînî çewsawe, îdeolojîy taybet be xoy heye” û bawefî pêyetî (Ferretter, 2013: 111). Wate, ewanîş le bin bandorî îdeolojî da n û weha nîye ewan le derewey em bazneye da bin. Althusser cext le ser ewe dekatewe ke

borjiwazî “debêt bawêî be ustûrey xoy hebêt, bewey ke hemû mirovekan ‘azadin’, azad in lewey kar biken yan neken, be kemitirîn mûçe damezrên yan na; bem çeşne ye ke detwanêt qena’et be kesanî dîkeş bînêt” (1971: 111). Dûwem, îdeolojîy zafî her komelgeyek, îdeolojîy çînî zafî û baladest e; belam çîne bindestekanîş bo xoyan çêkerî îdeolojîn, le pêlaw dijayetî û berberekanêy îdeolojî zafî û dasepaw da. Wate, le nêw îdeolojîy zafî da îdeolojîgelî ciyawaz debînîn ke derxerî niwandinewey çîne komelayetîye ciyaciyaan in. Belam sereîay eme, îdeolojîy borjiwazî îdeolojîyekanî tirî le bindest da ye û tenanet naîezayetîy piroltariya le rêgey zarawe û têgehên îdeolojîy borjiwazîyewe derdebiîdirêt.

Her weha ke debînîn, em bîrmende bayexî zor kem be bergirî dedat û hemû îdeolojîyek le bin zafêtî û bandorî qurs û qayimî îdeolojîy çînî baladest, wate çînî borjiwaz da debînêt. Nawbiraw eger çî nikolî le berxodanî sûje le dijî îdeolojî û gutare zafekanî çînî deselatdar nakat û çend şiwên da amajey pê dawîn, belam begîştî, wehay debînêt ke lem barûdoxe da ewey kontrolî bîrkirdinewey û zeynîyet û ferheng û heşûkewtî mirovî le dest da ye û hemû bûn û jiyânî tenîwnetewe, hemîşe û le hemû şiwênêk da û le gîşt astêk da, îdeolojî ye û ewey deydôiênêt çînî bindeste û bergirî û berberekanêyan akamêkî ewtoy nabêt. Bem bonewey rexnegiranî Althusser, be piyanî, be kesêkî reşbînî dezanîn û teoriyekey be reşbînaney wesf dekan. Elbet, pêwîst e emêş le berçaw bigîrêt ke boçûney rexneyîyekanî nawbiraw û têkoşanî le pêlaw nasîn û nasandinî îdeolojî, xoy corêke le geşbînî û bawêî be berengarbûnawey çînî serdest be çekî zanist; boye pêwîst wa ye “le rêgey têgeyiştinî rexneyîyane le îdeolojîyewe ye ke cemawer agadarî xebatî çînayetî debîn û amrazî rûxandinî îdeolojîy çînî xawen deselat bedest dehênîn” (Le: Payne, 2000: 77).

#### **1.4.2. Dewlet û Damûdezagay Serkut û Îdeolojîk**

Althusser be keşkerwergirtin lem witeyey Marx, ke delêt “eger le teşebendîyekî komelayetî da, hawkat lege berhemhênan, helûmercî berhemhênan berhem nehênrêtewe, ew teşebendîye komelayetîye salêkîş dewam nahênêt” (1971: 85), hewlî ravey pêwendîekanî nêw komelge û helûmercî berhemhênanewey û amraz û rêkarekanî da. Nawbiraw berhemhênanewey be ser dû çeşnî ‘berhemhênanewey sade û berbiław’ da dabeş dekan. Mebest le sade, berhemhênanewey helûmercî pêşû ye û mebest le berbiławîş peredan û berfirehkirdinî helûmerceke ye. Berhemhênanewey helûmercî berhemhênan bew watayeye ke her teşebendîyekî komelayetî bo manewey û berdewambûn, pêwîstîy be berhemhênanewey hêzên berhemhênanî û pêwendîekanî berhemhênanî heyî û amade heye (Althusser, 1971: 86).

Hêzên berhemhênan, keriste û amêrgelî berhemhênan (helûmercî madîy berhemhênan) û hêzî kar degrête ber. Bo berdewamîy pirosey berhemhênan, niwêbûnewe û berhemhênanewey keriste û amêrekan û her weha hêzî kar (hêzî mirovî) pêwîst e. Em berhemhênanewey le rêgey kiînewe desteber debêt; kiînnî keriste û amêr û her weha kiînnî hêzî kar ke le rêy pêdanî heqdestewe dabîn debêt. Belam berhemhênanewey hêzî kar tenya lem rêgayewe nakirêt û pêwîstîy bewey ku mirovên bekirêgîraw bo têpeîandinî em kare ‘karayî’yan hebê, wate amadey bekarhênan bikirên. Em erke le dinyay emio da kewtote estoy sîstemî xwêndin û perwerde. Em sîsteme mirovî pîspoî û karamey guncawî hemû beşekanî peywest be berhemhênan perwerde dekat; belam eme tenya merc nîye û berdewamîy piroseke girêdirawî berhemhênanewey pêwendîe amadekanî berhemhênanane.

Dekirêt bilêyn berhemhênanewey hêzî kar, nek her pêwîstîy be berhemhênanewey pîspoî ye, belkû hawkat pêwîstîy be berhemhênanewey milkeçîy le yasa û rêsa danirawekane û eme be watay berhemhênanewey milkeçîy hêzên kare bo îdeolojîy zal – bo kirêkaran-, her wehaş tiwanistî têpeîandinî em îdeolojîye -bo kargêianî çewsandinewe û serkutkarî. ... Be watayekî tir, eger çî xwêndinge (her weha damezrawey dîkey wek kilêse û damûdezgay tirî wek sipa) şiwênî rahênanî ‘karameyî’ekane, belam em rahênanane be şeweyêk beîewe deçêt ke milkeçbûnî îdeolojîy zal, ya zalbûn be ser piraktîs û têpeîandinî em îdeolojîye dabîn bikat. Bêcge le kargêianî pirofîşnalî îdeolojî, hemû kargêianî berhemhênan, çewsandinewe û serkut, debêt be şeweyek le şewekan bikewine ‘bin bandorî’ em îdeolojî ye ta ‘be pêy wîjdan’ erkekanyan têpeîênin; çî erkî çewsênran (kirêkaran), yan çewsandinewe (sermayedaran), yan alîkarîy çewsandinewe (karmendanî pileberz), yan jî gêianî rolî bangeşekaranî îdeolojîy zal (kargêianî em îdeolojîye) û nimûney hawşêwe. (Althusser, 1971: 89)

Althusser em pêvajoy aložî berhemhênan û berhemhênanewey nadadperwerî û çewsanewey hemeçeşin le komelge bo dezgay dewlet, be gwêrey pênasay xoy, degeîênêtewe. Dewlet le nerîtî Marxistî da, wek dezgay serkut le berçaw gîrawe ke le xizmet çînî serdest û le pêraw berjewendîyekanyan da, helî serdestî û zalêtiyan be ser çîne bindestekan da deîexsênêt. Em kareş le rêy polîs, dadge, zîndan û le katî pêwîstîş da sipa û erteşewe têdepeîênêt. Dewlet lem riwangeyewe, her weha birîtiye le serok û endamanî tirî hikûmet û îdare û damezrawekanî ser be hikûmet. Althusser em nêrîne sunetiye bo dewlet be guncaw, belam natewaw dezanêt. Ew bo têpeîandinî em pênasay dewlet û be mebestî pêşxistinî, paş ciyawazîdanan le nêwan hêzî

dewlet û dezgay dewlet, le witarî ‘Îdeoloji û Dezgayên Îdeolojîkî Dewlet’ da ke le kitêbî *Lenin and Philosophy and Other Essays* (1971) bi law bûwetewe, teorîyekî niwê dênête goîe û bo dezgay dewlet dû çeşin damezrawe le berçaw de grêt ke yekyan dezgay serkutî dewlet û ewîdîkeş komele damezraweyek in be nawî dezga îdeolojîkekanî dewlet. Be pêy nêrînî Althusser, em dû cor dezgaye le pê naw taqe amancêk da çalakî denwênin: amancî dirêjedan be deselatî çînî serdest be ser çînî bindest da. Dezga îdeolojîkekanî dewlet birîtîn le:

Dezgay ayînî (sîstemî klêsegelî corawcor); dezgay perwerde û fêrkari (sîstemî xwêndinge hikûmî û nahkûmîyekan); dezgay malbatî û xêzanî; dezgay qanûnî; dezgay siyasî (sîstemî siyasî û partên ciyaciya); dezgay sendîkayî, dezgay taybet be nûçe (iojname, radyo, televizyon û htd) û dezgay ferhengî (edebiyat, hunere cwanekan, werzş û htd). (Althusser, 1971: 96)

Dezga îdeolojîkekanî dewlet be şewey nerm û hestpênêkiraw reg û rîşey deselatî zal e nêw komele da qayimtir û qûltir dekenewe û berdewam pêwendî çewsêneraney nêwan çînî serdest û bindest berhem dehênnewe. Le layekî tirewe, dezgay serkutî dewlet erkî se pandinî zoremlîy deselat be cê degeyênêt û le katî pêwîst da, le pê naw parastinî hêz û deselatî çînî baladest da dête meydan û parêzgarîy le berjewendîyekanî em çîne û dezga îdeolojîkekan dekat. Em dezgayane birîtîn le hikûmet, niwêneranî sipa, polîs, dadge, zîndan û htd. Şiyawî bas e mebest le serkutker ewe ye ke lanî kem le katî pêwîst da, serkut û tundûtîjî bekar dehênin; eger çî serkut, , lewane ye şewey fizîkî le xo negrêt (Althusser, 2017: 339).

Michael Payne bîrokey Althusser le meî dezgayên îdeolojîk û ciyawazîy lege dezgay serkutî dewlet, be dirêje û geşey bîr û boçûnî siyasî bîrmendanî Marxism le pêwendî lege hêzî dewlet da dezanê û lem barewe denûsêt: Marx dewlet û komelegey medenî lêk ciya de katewe û Gramsci le bin bandorî kiroçe, le nêwan dewletî siyasî û dewletî exlaqî yan ferhengî daciyawazîy dadenêt (320). Althusser boxoşî amaje bewe dekat ke çalakanî Marxismî klasîk zûtir pêyan nabûwe em meydanewe û “be kirdewe, wate le piraktîsî siyasîyan da, dewletyan be waqî'êkî gelêk aloztir lew pênasaney ‘teorîy Marxistîy dewlet’ - tenanet le şewey kamîl kirawî da - dadena”; belam neyantiwanîbû riwange û ezmûnekanyan be şewey teorîk rêk bixen. Nawbiraw sebarete be Gramsci delêt: nawbiraw “tenya kesêk e pêy nawete em biwarewe ke mebestekey ême ye. Ew perjaye ser em hizre ‘berçaw’e ke dewlet tenya dezgay serkut nîye, belkû hendêk damezrawey ‘komelegey medenî’ jî de grêtewe; kilêse, xwêndinge, sendîkakan û htd. Mexabin

giramêêşî têrwanîne seretayîyekanî xoy rêk nexistûwe û em bîrokane [tenya] le şêwey amajegelêkî kartêker da mawnetewe” (Althusser, 2017: 320).

Althusser (1971: 95-97) le dirêjey rewî pêşxistinî teorîyekey xoy le mei dewlet, ciyawazîyekanî dezgayên serkut û îdeolojîkî dewlet lem sê xale serekîye da debînêt: 1. Le katêk da yek dezgay serkutkerî dewlet bûnî heye, dezga îdeolojîkekanî dewlet gelêk in; 2. Dezgay serkutî dewlet be têkiayî û be şêwey yekgirtû girêdirawî kertî giştî ye, keçî zorîney dezgayên îdeolojîkî dewlet, sereîay pertewazeyî riwaletîyan, girêdirawî kertî taybet in; 3. Ciyawazîyekî binemayî em dezgagale eme ye ke dezgay serkutî dewlet ‘be pêy tundûtîjî’ kar dekat, keçî dezgayên îdeolojîkî dewlet ‘be pêy îdeolojî.

Dezga îdeolojîkekan, sereîay pertewazeyî û tenanet dijberbûnî hendêkyan, lêkbestinewe û rêkxistinêkî nadiyar û naiastewxoyan heye û be şêwey yekgirtû û hawaheng decûlênewe. Ke wa bû, dezga û damezrawey wek binemale, peristge, xwêndinge û şiwêne fêrkariye nahikûmîyekan, partên siyasîy derewey çîwarçêwey hikûmet, sendîka û rojname û şiwêne firhengîyekan, eger le jêr çawdêrîy û beîweberîy rastewxoy dewletîş da nebin, amancî şardiraweyan her ew amancey dezgay serkutî dewlete. Althusser, le şirovey ciyawazîy dûwem da û be belgehênanewe le nêrînekanî Gramsci, sinûrî deselatî dewlet sertir le kertî giştî û taybet dezanê û denûsêt: “Dewlet, ke dewletî çînî serdeste, ne giştî ye û ne taybet, belkû bo xoy mercî her core ciyawazîyekî nêwan giştî û taybete. Detwanîn her em witeye sebarete be dezgayên îdeolojîkî dewletîş bibêjîn. ‘Taybet’ yan ‘giştî’ bûnî ew damezrawaney ke em dezgayaneyan tê da n, ewende girîng nîye; ewey girîng e erkekeyan e.

Şiyawî amaje ye, em dû cor damûdezgayê hemîşe be şêwey taybet be xoyan erkekanyan tînapêînin û hendêk car û le katî pêwîst da, şêwey cûlanewey yekdî bekar dehênin. Althusser cext le ser ewe dekatewe ke dezgay serkut û îdeolojîkî petî, bûnî nîye; wate, em dû cor dezgayê, hemîşe be serkut yan be pêy îdeolojî mamele naken û lewane ye her dû şêwaz bekar bihênin. Xoy lem barewe delêt, dezgayên îdeolojîkî dewlet, be zorî û le pêş da, pişt be îdeolojî debestin û serkut le piley dûwem da ye û tenya le kotayî da û be şêwey nerm û niyan û tenanet hêmayîn cêbecê debêt; bo nimûne amaje be sansor dekat. Le beramber da, dezgay serkutî dewlet jî be her dû şêwe hêlûkewt dekat, belam cextî le ser hêz û heîşe û tundûtîjî ye (Althusser, 1971: 98).

Em dû dezgayê le rastî da tewawkerî yekdî n û boşayîyekanî yektir pii dekenewe. Be

watayêkî tir, her katêk dezga îdeolojîkekan sernekewin û tak yan komelêkyan bo destemo nekirêt, hêzî serkut dête hanayan û hêzî xoy bo bergirî le berjewendîyekanî çînî serdest û berengarbûnewey ew tak û komele lader û laiêyane dexate geî û denge normtêpeiekan kip dekat. Le layekî tirewe dirêjey deselatî çînî xawen deselat û berdewambûnî baladestîyan be ser hejmarî zorî bindestan da, girêdirawî tiwanistyan e le bekarhênanî îdeolojî da. Le rastî da, “hîç çînêk natwanêt be şewey berdewam hêzî dewlet le jêr rikêfî da bê, be bê ewey hawkat hêjêmonîy xoy be ser dezgayên îdeolojîkî dewlet da û be nêw em dezgagale da bisepênêt” (Althusser, 1971: 100).

Berhemhênanewey pêwendîekanî berhemhênan ta radeyêkî zor le layen dezga îdeolojîkekanî dewlet û be piştîwanîy dezgay serkut dabîn debêt. Êsta pirsyarêk dête goiê: Em dezga corawcor û lêkciyawazane çon detwanin yekgirtûwane û le pê naw amancêk da kar biken? Welamî em pirsyare pelkêşî lay îdeolojîman dekat. Îdeolojî lem pêwendîe da, dewrî rêkxer û girêder degêîet û ew bûne nihênî û hestpênekirawe ye ke herdem serqalî rêkxistinî hêz û damûdezgakanî dewlet û rahênanî bindestane be mebestî berhemhênanewey doxî dasepaw da. “Be yarmetîy îdeolojîy za e ke ‘hawsazîy’ nêwan dezgay serkut û îdeolojîkî dewlet le layêkewe û le nêwan xudî dezga rengame îdeolojîkekan da le layêkî tirewe, dabîn debêt” (101).

Le serdemî pêş sermayedarî, wate le çaxî derebegayetî da, jîmarey dezga îdeolojîkekan leçaw êsta zor nebûn. Dû dezgay here karîgerî, be riwalet derewey dezgay dewlet ke erkî cêxistin û cêgîrkirdin û parastin û perepêdanî îdeolojîy za, wate îdeolojîy çînî baladestîyan le esto dabûwe: Yek, peristge û şiwêne ayînîyekan û dû, binemalê. Althusser pêş wa ye sinûrî dezga îdeolojîkekanî dewlet lew kate da tenya em dû nimûneye nebûne û amaje be dezgay siyasî wekû şewray dewletî û encumen û taqimbendîye siyasîyekan, dezgay pêş sendîkayî, wekû taqime pîşeyîye behêzekanî bazirganan û pîşesazan, her weha çapemenî û şano dekat ke le pêş da le jêr rikêfî kilêse da bûne û diwatir wirdewirde serbexo bûne (102). Wek debînîn, cige le dû dezgay serekîy berbas, hendê dezgay dîkeş bûnyan hebûwe ke tiwanîwyane le rêgay ciyaciyawê deselat û îdeolojîy za bibûjêninewe; belam sereîay em rastîye, hîçyan wekû şiwêne ayînîyekan neyantiwanîwe bandor le ser binemalêkan dabînên û erke amajebokirawekanyan têpeîenin.

Em bîrmende be mebestî şirove û selmandinî riwangey xoy le meî zalêtîy damûdezgay ser be fêrkarî lem serdeme da, serincman bo lay safanêkî dûr û dirêjî baxçey sawayan ta



xwêndinî zanko radekêşê ke mindalanî hemû çîne komelayetîyekan dexirêne jêr destî ewdezgaye û “be yarmetîy mîtodî kon û niwê, saîanêkî dûrûdirêj be hendêk ‘karzanî’ le pêstî îdeolojîy zal (zimanî Ferensî, bîrkarî, mêjûy siruştî, zanistekan û edebiyat) û yan îdeolojîy zal resen (exlaq, rahênanî medenî, felsefe) rayandehênêt (Althusser, 1971: 105). Em mindalane hendêkyan diway çend salêk waz le xwêndin dehênin û tevlîy ‘aqarî berhemhênan’ debîn û hendêkî tir ta qonaxekanî serûtir dirêjey pê deden. Berhemî mirovî em dezga îdeolojîke, be gwêrey mawey manewe û radey behremendîyan le perwerde, ciyawaze û le pêvajoy parastin û peredan be îdeolojîy zal û berhemhênanewey barûdoxî cêgîrkiraw da debine xawen dewr û erkî diyarîkirawî xoyan. Bem çeşne ke:

Her desteyek ke le dirêjey em pêvajoye da pê dexat, be şewey kirdekî debête xawen ew îdeolojîyey guncawî erk û dewrî ewe le komelgey çinayetî da. Dewrî takî çewsawe (xawenî wîjdanî ‘karî’, ‘exlaqî’, ‘şaristanî’, ‘neteweyî’ û nasiyasîy tewaw ‘perwerdekiraw’); dewrî erkdar û hokarên çewsandinewe (Ke debêt bitwanêt destî be ser kirêkaran da bîrwat û qiseyan legel da bikat û eme heman ‘pêwendî mirovî seqamgirtûwe); dewrî erkdarên serkut (Ke debêt bitwanin ferman biden û sereîoyane xelk milkeç biken, yan le derbîînî witey xelkxapêneraney siyasetmedarane da zor zîrek û lêhatû bin); her weha dewrî kargêranî pispoî îdeolojî (Ke debêt bitwanin letek her kesêk da be serincî taybetewe, wate be sûkayetî, heîşe û gewcandinî şayen be xoy, hêlsûkewt biken û em hêlsûkewte be reng û bonî exlaq, hevayî, ‘te’alî’, nîştimanperwerî, roî cîhanîy Feranse û htd. bîazêninewe). (Althusser, 1971: 105)

Althusser eger çî dewr û karîgerîy dezga îdeolojîkekanî tir bo fêrkirdinî hevayîye rengamekanî wek sîngfirawanî, pişûdirêjî û gwêrayelî le layêkewe û bêşermî, sûkayetîkirdin, fis, bexopermîyan, gewreyî, tenanet şîrînzimanî û qisexoşî le layêkî tirewe, be girîng dezanêt, “belam hîç dezgayêk le dezga îdeolojîkekanî dewlet le maweyêkî weha dirêj da û 5 yan 6 roj le hewte û 8 katjimêr le roj da, hemû mindalanî sîstemî komelayetîy sermayedarî, wek bîserî zoremlê (Ke weha mewhibetêk be xoîayî werdegrin), le berdest da nîye”. Althusser lêre da daway lêburdin lew mamostayane dekat ke lem barûdoxe diware da deyanewêt be deselatî sinûrdarî xoyan berberekaneîy îdeolojîy zal û zilhêzan biken û delêt: em kesane dekirêt be palawan hejmar bikirên, belam degmen in û piîanîy ew mamostayaney tenanet tozêkîş lew ‘erkey’ sîstem pêy naçarî kirdûn, û le serewe wirdî kirdûn, diidong nîn û naxoştir ewe ke tenanet hemû hêz û hewlêkyan be wîjdanî tewawewe lem pêname da dadenên. Ewan lem rastîye bê agan

ke be rajey dilpakaneyan debine yarmetîderî parastin û peredan bem wêna îdeolojîke; wênayek ke emioke xwêndinge û dezgay fêrkari be ‘siruştî’ û pêwîst û sûdmend û tenanet babetêkî xêr bo mirov denwênêt (106).

### 1.4.3. Sûje û Pêvajoy Lêpêçînewe û Besûjebûn

Sûje û çonyetîy besûjebûnî takekan, le mijare girîngekanî berbasî LouisAlthusser e. Sûje dû watay bawî heye, yekyan be watay mirovî xawen zeynîyetî azad û berpirsari kar û kirdewekanî xo ye û ewî dîkeş be watay bûnewerêkî bêbeş le azadî û milkeçî deselatêkî sertire, ke tenya le pejrandinî milkeçîy xoy da azad e. Althusser be serincdan be em diwazîye denûsêt: “Tak wek sûje (y azad) lêpêçînewey lê dekirêt ta (azadane) xoy bixate bin fermanî sûjey mezinewe û diwaye (azadane) milkeçîy xoy bipejrênêt û le encam da be taqî tenya kargelî xopawankerî xoy têbipeîênêt. Sûjekan tenya be ho û bo milkeçbûn, bûnyan heye” (Althusser, 2017: 370). Wate, hoy hebûnî sûjekan îdeolojîye û le naxî da dejîn û ewey pêyan dekirêt û dekarin le jiyanyan da helîbjêrin milkeçkirdin û xoîadestkirdine.

Katêk takekan ber şalawî îdeolojî dekewin û be gwêrey rêsakanî decûlênewe, ewdem debin be sûjey ew îdeolojî ye. Sûje, le rastî da, berhemî îdeolojî ye, ke le akamî lêpêçînewey dezga îdeolojîkekan û le bin çawedêrîy dezgay serkutî dewlet da hêdesazrêt. Takekan be mebestî parastinî pêwendîekanî berhemhênan û berhemhênanewey barûdoxî cêgîr, debê bitwanin erke komelayetîyekanyan be başî têbipeîênin; em kareş be hoy sûjegelî naderhestî komelayetîyewe û le rêgey pêvajoy lêpêçînewey îdeolojîkewe desteber dekirêt. Sistemî sermayedarî le pêvajoy lêpêçînewe bo parastin û berfirehkirdinî hêz û deselatî xoy be ser xelk dabe bê bekarhênanî zext û zor kelk werdegrêt. Lêpêçînewe katêk rû dedat ke sûjekan be şêwey rastewxo yan lenakaw le layen îdeolojîyewe bang dekirên yan lêpêçîneweyan lê dekirêt. Lem pêvajoye da, “her îdeolojîyek be lêpêçînewey take berhestekan û le rêgey kari witezay sûjewe, deyangoiêt be sûjegelî berhest” (Althusser, 1971: 118). Her weha lem barewe denûsêt:

Îdeolojî be şêwey ‘awalgirî’ û hebijardinî sûje le nêw takekan da ‘erkekey têdepeîênêt’ (îdeolojî hemû takekan dekat be awaî xoy), yan le le rêgay ew pêvajoyewe ke be bangkirdin ya lêpêçînewe nawdêrim kirdûwe, takekan bo sûje ‘degoiêt’ (îdeolojî hemû takekan degoiêt). Dekirêt lêpêçînewe hawşewey asayîtirîn kari rojaney polis da (yan kesani tir) wêna bikeyn, wate lem dêianeda: ‘Ehay, to!’ (Althusser, 1971: 118)

Eger em dîmene xeyalîye le koîanêk da rû bidat, takî bangkiraw awîi dedatewe û bem core debêt be sêje û watay ewe ye ew kese danî bewe da nawe ke ewey bang kirawe xoyetî, yan xoy lew lêpêçînewey da nasîwetewe û besûjebûnî xoy le çîwarçêwey ew îdeolojîye da piştîast kirdûwetewe. Ke wa bû, lêpêçînewey serkewtû katêk rû dedat ke sêje boy derkewê ew bange le rastî da rûy demî le ewe. Eger bangkirdin û lêpêçînewey serkewtû bêt, tak wek sêje gîrodey ew îdeolojîye taybete debêt. Katêk takî bangkirawî ser şeqam awîi le polîs dedatewe ‘debêt be sêje’. Ew awîi dedatewe çunke way bo derkewtûwe ke ‘ew bange le rastî da rûy demî’ le ew bûwe. Nawbiraw em nimûne xeyalîye sadeye bo rûnkirdînewey babeteke dênêtewe, egera le waqî' da, lêpêçînewey û besûjekirdin bem şêweye û be pêy rûdawgelî yek be diway yekî lem çeşne rû nada. “Bûnî îdeolojî û lêpêçînewey takekan wek sêje, her yek şite. Ewey be riwalet le derewey îdeolojî da (le koîan) rû dedat, le rastî da le naxî îdeolojî da rû dedat. Boye, ew kesaney le nêw îdeolojî da n, xoyan le derewey îdeolojî da debînî” (Althusser, 1971: 118).

Têgehî sêje, her weha ke bas kira, be pêy dû wata û riwanîn pêname dekirêt. Le yekyan da derxerî têwanînî mirovîxwazna ye û lem goşenîgayewe, sêje çeşnêk subjêktîvîtey azad, nawendêk bo hêlsûkewt, daner û berpirsîyarî karekanî xo ye. Le watay dûwem da, ke helgîrî riwangey Althusser le meî mirov, sêje bûnewerêkî bindeste ke xoy radestî deselâtî baladest dekat û bem core hemû azadîyekî lê destênrêt, bêcge lewey ke tenya boy heye azadane milkeçîy xoy helbijêrêt. Îdeolojî nasname û şunasêkî naîast û helbestraw dedat be sêjekan û bem pêye, ewan xoyan wek mirovî azad debînî. Le katêk da, em sêjane kontrolî wite û nêrîn û hêlsûkewtyan le destî îdeolojî da ye û tenya dekarin azadane xo radest biken. Be watayekî tîr, azad in be pêy yasa û rêşakanî pergali îdeolojî bicûlênewe û lew rêgayewe xoyan nas biken û milkeçbûnî xoyan bipejrênî û bîselmênî. Be witey Althusser:

Tak wekû sêjeyekî azad lêpêçînewey lê dekirêt heta azadane ser bo fermanekanî sêjey mezin danewênêt, bem wataye ke ew (azadane) milkeçbûn depejrênêt û hêmakî û kargelî pêwîst bo milkeçîyekey ‘be tenya’ têdepeîênêt. Hîç sêjeyek bûnî nîye cige le ew sêjaney milkeç bûne. Boye, ‘her hemûyan be tenya erkekeyan têdepeîênî’. (Althusser, 1971: 123)

Pêvajoy lêpêçînewey kirdeyekî îdeolojîk e û pêkhatekey le sercem îdeolojîyekan da hawbeşe. Deselât be çekirdinî sêjey gewre û taqane û be kelkwergrîtin le kirdey îdeolojîkî lêpêçînewey takekan gîrode û milkeçî xoy dekat. Milkeçbûnî sêjey biçûk, pêwendî be çînî

komelayetîy serdest û îdeolojîy zalî ewanewe heye û be pêy em pêvajoye, sêjekan milkeçîy xoyan le komelgey kapîtalîstî da piştîast dekenewe. Takekan wek sêjegelî biçûk, herdem hewlî destebarkirdinî cêge û pêgey sêjey gewre deden, keçî hemû hewlêkîyan bê encam e û destkewtiyan tenya xobedestewedan û hawkarîy çînî serdeste le pêdaw destebərbûnî amancekanî ewan da.

Sêjekan, le bin bandorî dezga îdeolojîkekan da, çarenûsî xoyan be çarenûsêkî siruştî debînin û girîmaneyan ewe ye hemû şitêk her bew çeşne ye ke debê bibêt. Ke wa bû, wek beşêk le sîstemê ke le layen deselatewe rêkdekirêt, berdewam çê debînewe û hemû hêz û wîzeyan, be pêy exlaq û wîjdan, bo geîandinî çerxî mekîney deselat pêşkeş deken. Lêkewtey îdeolojî sêjey dilxwaze. Sêjey dilxwaz, sêjey milkeç û gwêîayê e û le beramber lêpêçînewey berdewamî îdeolojî da be bê kêşe xoy be destewe dedat. Em sêjegele zorîney komelge pêk dehênin. Le beramber da, sêjegelî serbizêw le pêvajoy lêpêçînewe da xo bedestewe naden û milkeçî îdeolojîy zal nabin. Sêje serbizêwekan, be pêçewaney sêje destajokan ke şêlgîrane le pêşbîkêy xoîadestkirdin da beşdarî deken, be sanayî milkeç nabin û dewlet bo kontrolkirdinyan naçar debêt demamî dîlovanî le ser rûy fiîê bidat. Be witey Althusser sêje başekan be şêweyekî qûl û reha lew rewşey tê da n, diîniyan. Nawbiraw le dirêjey şîrovey em dû çeşin sêjeye da denûsêt:

[Sêjekan] şêlgîrane ‘têdekoşin’; ewan zor car ‘be tenya têdekoşin’, bêcge le ‘sêje serbizêwekan’ ke hendê car debîne hoy destêwerdanî beşêk le dezgayên (serkutî) dewlet. Belam zorbey sêjekan ‘be tenya’ be baştirîn şêwe decûlênewe, wate be hoy îdeolojîyewe [decûlênewe] (Ewîş ew îdeolojîyey ke şêwe berhestekanî le nêw dezga îdeolojîkekanî dewlet da desteber debî). Em sêjane dekêşrêne nêw rêûesîmgelêkewe ke le layen rêsakanî dezga îdeolojîkekanî dewletewe kontrol debî. Ewan barûdoxî amade ‘denasnewe’; ewey ke ‘le rastî da em rewşe bem core ye raste û be şêweyekî tir nîye’, her weha ewey ke, debêt milkeçî Xuda, wîjdan, qeşe, [Charles] de Gaulle, serok, endazyar, em witeyey Încîl ke ‘to debê dirawsêket wek xot xoş biwê’ û nimûney hawşêwe bin. (Althusser, 1971: 123)

Îdeolojî bûnêkî şarawe ye û hemû qujbinêkî komelge û zeynî takekanî tenîwetewe. Sêje biçûkekan be şêwey naxudaga û nexwazraw le layen îdeolojîyewe kontrol dekirên û radehênrên û han dedirên ta le sêjey gewre nizîk bibînewe. Belam sereîay hemû hewlêk, hergîz destîyan nagate sêjey gewre. “Sêjey biçûk ew takekese ye ke le layen îdeolojîyewe rûberûy lêpêçînewe

dekirêtewe, le katêk da sêjey gewre gewre ew modêle dilxwaze ye le takekes ke le layen îdeolojîyewe pêname kirawe” (Sadjadi, 2012: 93). Em dû layene, berdewam le çalakî da n û sêjey biçûk herdem deyewêt be sêjey gewre bigat. Sêjegelî biçûk le nêw bazney îdeolojî da berdewam be dewr xoyan da desûnênawe û têdekoşin le sêjey mezin nizîk bibinewe, keçî ewey lêy degeîen, wehmêk e û tenya le mêşkiyan da çênrawe. Sêjey gewre sêjey îdealî pênamekirawî îdeolojî ye, wênayek e dezga îdeolojîkekan be dirêjayî temenî sêje karyan bo kirdûwe, sêjeyek e hergîz sêjey biçûk destî pê ranagat û hîç katêk cêge û pêgey bo ezmûn nakirêt.

Le pêvajoy lêpêçînawe da sêjekan dekwine bin bandorî sêjeyekî bertir û sertir û taq û taqane û dûredestewe; sêjeyekî mezin û xawen pêge û cêge û taybetmendîgelêk ke sêje biçûkekan le xulyay pêy geyîştinû lêy nizîkbûnawe û wek ew bûn da xulasa be dewrî da xul dexton û xoşbeserane debin be xofî; belkû bitwanin be awate xewnewî û xeyalawîyekanyan bigen. Althusser bo rûnkirdinewey em mijare, îdeolojîy ayînîy mesêhî be nimûne dênêtewe û delêt “çunke pêkhatî riwaletîy her îdeolojîyek hemîşe yeksane” û dekirêt le pêwendî lege îdeolojîy exlaqî, hiqûqî, siyasî, hunerî û htd. dûpat bibêtewe (Althusser, 1971: 119). Îdeolojîy ayînî be lêpêçînawey takekan, deyankat be sêjey xoy û em kare le rêgey kitêbî pîroz û fermanî têpeîandinî erke ayînîyekanawe û be beşdarîy sêjekan le rêûiesmên girêdiraw da cêbecê debêt. “Lem haleta da debêt serinc bem xale bideyn ke be ser hemû em aheng û rêûiesmane da ke sêje ayînîyekan dênête meydanewe, diyardeyekî namo zal e û [lêkbestinewey] weha jimareyek sêjey ayînî mumkin nîye meger be mercî rehay hebûnî sêjeyekî dîke û taqane û reha, wate Xuda.

Dezga îdeolojîke rengamekan û lewane dezgay ayînî, be afrandinî sêjey mezin û be lêpêçînawe û bang kirdinî sêje biçûkekan berew lay ew sêje taqaneyê, be şewey ciyaciya fêrî milkeçbûnyan dekat. Wek çon sêjekan pêwîstîyan be sêjey mezine, be pêçewaneşewe, sêjey mezin be hoy ewanewe û be ewan denasrêtewe û wata dekirêtewe. Be watayekî tir, sêjey mezin jî be sêje biçûkekanewe bestrawetewe û pêwîstîy pêyane û bûn û milkeçîy ewan, wata be bûnî em debexşêt. Be witey Althusser, pêkhatey her îdeolojîyek, ke takekan wek sêje û be nawî sêjeyekî mezin, taqane û rehawe bang dekat û rûberûy lêpêçînaweyan dekat, awêneasa ye; bem wataye ke, her îdeolojîyek nawendêkî heye û sêjey mezinî reha lew şiwêne nawendîye da cêy girtûwe û sêje biçûkekan be dewrî da ko bûnetewe. Eme pêwendîekî awênayî ye ke le rêgayewe sêjekan milkeçî sêjey mezin debin û hawkat, îdeolojî be hoy sêjey mezinewe, ke hemû sêjeyek detwanêt xoy tê da bibînêtewe, em dîlniyayîye be takekan dedat ke xudî xoyan û xudî sêjey

mezin mebestî serekîn; boye, hemû baweimendan le çîwarçêwey binemaleyekî pêrozdan û Xuda xoy bende milkeç û îmandarekanî xoy denasêtewe”; wate, ew kesaney Xudayan nasîwe û xoyan le Xuda da nasîwetewe, rizgaryan debêt” (Althusser, 1971: 122).

“baweyekanî her sûjeyekî mirovî le kirdekanî da n” û “em kirdegele be hoy rêûiesimgelêkewe rêk dexirên ke em kirdaneyan tê da tomar dekirên û emane hemûyan le naxî bûnî madîy dezgayêkî îdeolojîk û tenanet beşêkî biçûkî em dezgayê da cêbecê dekirên” (114). Be watayêkî rûntir, “her sûjeyekî ‘hoşyar’ û baweyimend be ‘baweyigelêk’ ke ‘hoşyariyekey’ pêy telqîn kirdûwe û ewîş bew peî azadiyewe deypejrênêt, debêt ‘be pêy baweyekanî xoy bicûlêtewe’ û le akam da debêt wek sûjeyekî azad baweyekanî xoy le piraktîse madîyekanî da tomar bikat û xoy wek ‘sûjeyekî gwêrayel’ biselmênêt (114); egîna wek sûjeyekî naferman çawî lê dekirêt û le rastî da ‘hawîengî komelge nîye’!. Ke wa bû, dewlet, be riwalet le pê naw parastinî berjewendîy giştî da û le rastî da, le pê naw parastinî berjewendîy çînî baladest da, be kuştin, dûrxistnawe yan qolbestkirdin û temêkirdin, em peî nahawîengane reş dekatewe û yekiengîy komelge beîoj dekatewe.

Althusser têgehî serekî û girîngî ‘sûje’ heîdehêncê û boçûnî xoy lem dû têze da bem çeşne derdexat: “1. Her kirdeyek tenya le layen [îdeolojîyewe] û le nêw îdeolojî da bûnî heye; 2. Îdeolojî tenya le layen sûjekanewe û bo sûjekan bûnî heye” (Althusser, 1971: 115). Be gwêrey têzî yekem, sûjekan tenya ew kirdaneyan pê cêbecê debêt ke îdeolojî le rêgay dezgakyewe boy diyarî kirdûn û têpeîandinî em kirdaneş tenya le çîwarçêwey îdeolojî da delwêt. Be watayekî tir, piraktîsî naîdeolojîk û beder le çîwarçêwey îdeolojî bûnî nîye. Le têzî dûwem da, sûje, tewerey serekî boçûneke ye û pêdagirî le ser dewr û girîngîy sûje le afrandinî îdeolojî û her weha bandorlêwergirtinî kirawe; be çeşnêk ke îdeolojî le layen sûjewê û bo sûje çê dekirêt. “Witezay sûje, eger çî bem nawewe, hawkat legeî bedîhatinî îdeolojîy borjiwazî û pêş hemû şitêk legeî bedîhatinî îdeolojîy hiqûqî le dayik debêt, belam (be nawgelî tir bo nimûne lay Eflatûn le jêr nawî roh, Xuda û htd) witezay çêkerî hemû îdeolojîyeke” û “takên berhest dekat be sûje” (115).

Em bîrmende tenanet xoyî wek nûserî wîtareke û dahênerî gutareke û xwêneranîşî be ‘sûjegelî îdeolojîk’ nawdêr dekat û delêt ême hemûman be şewey ‘siruştî’ û ‘lexowe’ le îdeolojî da dejîn û eme bew wataye ye ke “mirov ajelêkî îdeolojîke”. Yan be goînnî gutey Paulî pêroz, ke deygut: “Bûn, cûle û jiyanî me le wişe da ye”, delêt: Bûn, cûle û jiyanî ême le îdeolojî da ye

(116). Îdeolojî hemîşe û le hemû şiwênêk da amade ye; ke wa ye, takekan hemîşe le pêş da û tenanet pêş ledayikbûn jî sêje n. Nawbiraw bo selmandinê em witeye, be amajedan be boçûnê Freud sebarete be rêûiesmî çawerwanîy hatnejiyanê mindal, delêt : “Le pêş da diyar e ke mindanawî bawikî heldegrê; aweha ye ke debête xawen nasnameyek û [ew nasnameyeş] negoi debêt. Ke wa bû, mindal ber ledayikbûn, her le pêş da, sêjeye” (119). Aweha ye ke dezgay îdeolojîkî binemate, dezgayekî zor karîgerî berjewendîparêzî dewlet û çînî deselatdar e û pêşengî rewî lêpêçînewe û çêkirdinî sêjey destajo ye.

Bîrmendî nawbiraw, le kotayî witekanî da amaje bo em rastîye girînge dekat ke ewey îdeolojî be ser takekan da daydesepênêt, diyardeyekî siruştî û asayî nîye û be serincdan be peyvî ‘amîn’ yan ‘weha bêt’, denûsêt: “Em peyve deyselmênêt ke ‘debêt’ weha bêt ta wekû bawdoxeke bew core bêt ke debêt bibêt” (Althusser, 1971: 123). Încê riwangey serekîy xoy bem çeşne derdebiêt ke “debêt weha bêt ta wekû berhemhênanewey pêwendîekanî berhemhênan, tenanet ta naxî pêvajoy berhemhênan û geianî kalakan, hemû rojêk le ‘hoşyarî da’, wate le heşûkewtî tak-sêje da dabîn bikirêt; ew takaney le postgelî dabeşkarîy komelayetî-fenîy kar le aqarî berhemhênan, çewsandinewe, serkutkarî, rahênan û sepandinî îdeolojî, yan piraktîsî zanistî û htd. da, boyan destînîşan kirawe, seqalî karin” (124).

## BEŞÎ DÛWEM

### XWÊNDINEWEY *PÊŞBAZIYA ÇÎROKÊN NEQEDIYAYÎ* LE RIWANGHEY BOÇÛNÎ REXNEYÎ MARXISMÎ PÊKHATEXWAZANEWE

#### 2.1. Pêşekî

Nûserî yekem romanî helbijêrdirawî em twêjîneweye, wate *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, Şener Ozmen, romannûsî çalak, niwêxwaz û behremendî Bakûrî Kurdistan e, ke le saî 1971 le bajarokî Hezexî ser be şarî Şîrnax le dayik bûwe û êsta nîştêcêy gewreşarî Amed e. Nawbiraw ji bilî roman, hendê berhemî dikey le biwarî nîgarkêşan, rexne, helbest û wergêfan da bilaw kirdûwetewe. Ozmen berhemekanî be dû zimanî Kurdî û Turkî nûsîwe. Berheme Kurdîyekanî le edebî çîrok da birîtin le çîwar romanî *Rojnivîska Spînoza* (2008), *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* (2010), *Gramera Bêhîzûr* (2014) û *Xeyb* (2017) û komele çîrokî *Keleh* (2012). Lem sî saley rabirdû da Bakûr û Rojaway Kurdistan zorêk romannûsî be xowe dîwe û Şener Ozmen yekêk lew çend nawe diyare ye ke tiwanîwe berhemî cîdî û serkewtû û cêy serincî rexnegiranî em aqare biafrênê. Haşîm Ehmedzade le hevpeyvênêk da nawî Şener Ozmen dexate pa nawî kewanêk wek Helîm Yosiv, Jan Dost, Mehmed Uzun û Hesenê Metê û be “romannûsên pir hêja û baş” nawdêryan dekat (2015: 137).

*Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* dûwemîn romanî Şener Ozmene û le saî 2010 le Stenbol çap kirawe. Em romane le şeş beş pêk hatûwe û birîtin le, destpêkêk û çîwar beşî serekî le jêr nawî îman, guman, ziman û raman û beşekî kotayî be nawî jêrnotên neqediyayî. Nûser le rêy gêfanewey bîrewerî û beserhatî jiyanî mamosta Sertac, wek serlehengî roman û Merasîmî hawjînî û karaktêrekanî dîkewe deperjête ser barûdoxî komelgay Kurdî le Bakûrî Kurdistan û helwêste erênî û nerênîyekanî em kesêtîyane le hember hêriş û hefeşe û paktawîy zimanî û çandî şirove dekat. “Roman, serî heta dawyê be rêya lehengekî pîralî, li ser civaka Kurd nîqaşên girîng dike. Ev nîqaş carna dibin kul û derdên Kurdan, carna dibin kêmasî û bîranînên civaka Kurd û carna jî dibe rexneyeke mezin û Kurdan bi her awayî ve sûcdar dibîne ku xweyî li çand, huner û zimanê xwe dernakefîn” (Vural, 2018).

Romanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* le çîwar serbeşî Destpêk, Îman, Ziman, Raman û beşek be nawî Jêrnotên Neqediyayî pêk hatûwe, ke rûnkirdinewey hendêk le buyerekan e.



Romaneke, bîst binbeş le xo deqrêt ke be jimare diyarî kirawin. Vegêî binbeşî yek, ke heman beşî destpêke, Merasîm e ke seretay aşnabûnî lege! Sertac, kuîedostî Yasemînî xuşke gewrey û hawjînî dahatûy xoy, her weha têkçûnî nêwanî lege! Onderî mamostay le zanko, degêîetewe. Le dirêje da vegêîekî hemûşitzan, ke xudî Sertacî çîroknûs e, le zarî kesî sêyemewe çîrokî bêbîianewey jiyânî xoy degêîetewe. Em beserhatane, ke le hejde binbeş pêk hatûwe, hercarew basî qonaxêkî jiyânî serleheng dekirêt û le bîrewerîy serdemî mindalî û malbat û qutabxane û kartêkerîy xaloy şoişgêî û rewşî nalebarî Kurdan û paşan mamostayetî û pêwendî lege! Elî Osmanî xwêndkarîyewe bigre heta demî têkçûnî jiyânî hawbeşî lege! Merasîm û doxî naxoşî tenyayî û bîrewerîyekanî şoiş û nasînî duktur Sarînî derûnnas û paşan wergirtinî xelatî çîroknûsî û banghêştîkirdinî bo Elmanya û htd. deqrêtewe. Binbeşî kotayî romanekeş, gêianewey çonyetîy kuştinî Sertacî çepger û ledînlader e be destî Elî Osmanî xapênrawî Mela Îdrîs û hawbîranyewe. Lêre da bikuj, wêîay gêianewey beserhateke, peşîmanî xoy û rîq û qînî le handeran û fermanpêkeranî derdebîîet.

Serlehengî roman, Sertac Karan, le binemaleyekî hejar û bê êl û eşîrey taxî jêrî şarî Hezex e û kuî Fethî posteçî û hogirî nîgarkêşan e; keçî diwayî be zorî bawikî, le beşî perwerdey ayînî debê be mamosta. Le taybetmendîyekanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, nasandinî serleheng e ke hercarew be paşnawêk û be pêy rewşî derûnî yan doxî dewrûberî û riwanînî kesanî dîke wesf dekirêt; bo nimûne, Sertacê xoce, Sertacê entîke, Sertacê evîndar, Sertacê serhişk, Sertacê bêderman, Sertacê romantîk û htd. Her bem çeşne, paş tevlibûnî be şoişewe, nawî debête ‘Şoreş’ û dîsan be pêy ew rewşey tê da ye, paşnawêkî dexirête ser; bo wêne, Şoreşê gerdên aza, Şoreşê bawerî pola û Şoreşê rewşxeter, Şoreşê rexneger û htd). Em romane, le rastî da, têkeleyek e le gêianewey jiyânî rasteqîney Sertac, wek kesayetîyekî ciyawaz û hestiyar le hember rewşî dasepawî derdorî û gêianewey bîrewerîye talekanî ye le şewey çîrokêk da ke bo xoy nûserekeyetî û her weha xewn û xulya û xeyale têkelpêkeleyanî ew in wek mirovêkî tûşbûy şîzofêrnî. Nexoşîy Sertac, ke bo xem û keserî têkçûnî jiyânî hawbeş û bindestîy netewekey û bêbeşîy le mafî zimânî û hejarîy pirtûkxaney Kurdî û nezanî gel û qolbestkiran û eşkencediranî degeîetewe (Ozmen, 2010: 67-88, 121), le zeyn û derûnî aloz û şilejawîy gêianewey beserhatekan da û her weha le hestîkirdinî be bûnewer û kesayetîyekî na'asayî be nawî Pîra Na û qise û demeqîe legeî da, derkewtûwe.

Rûdawekanî em romane, rastîyekanî komeley Bakûr denwêninewe û eger çî carna wek

xewn û xeyalekanî Sertac û hendê car wek çîrokêk xuya debêt, belam be tewawetî waq'êk pîşan deden ke bo mirovî Kurd naaşina nîn û hemûyan ezmûnkiraw in. Guler le masternamekey da be nawî *Karakter di Romana Kurmancî de: Girê Şêran, Mirina Bêsi, Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî, Qerebafon, Sobarto* (2019), em boçûne piştrast dekatewe û amaje bewe dekat ke lem pênc romane da karakterî dû nimûneyan be şêwey baştir nwênerayetîy civakî xoyan deken ke yekêkyan *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* ye. Lem barewe dexwênînewe ke: "Bi saya bikaranîna parodî, îronî, alêgorî, xwerexnekirin û mîzahê ew her du roman (*Sobarto* û *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*) ji tiradîsyona avakirina karakterên mexdûr, karakterên îdealîzekirî, karakterên şoreşger û têkoşer, karakterên di asta qehremanan de, yanê xwe ji tîpbûnê xelas kirine û mîna karakteran derdikevin" (Guler, 2019: 110).

Lem beşe da, piştî em pêşekîye û nasandinî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, deqî berbas be gwêrey têgehe girîngekanî îdeolojî, dezgayên serkut û îdeolojîkî dewlet û sûje le teorî rexneyî Louis Althusser tawtwê dekirêt. Bo em mebeste, ew nimûnaney le romaneke da amajey girêdiraw be em çemkaneyan le xo girtûwe, ciya dekirênnewe û diway rûnkirdineweyekî kurt, le sê binbeş da û le bin tîşkî çemke baskirawekan lêyan dekolrêtwewe û le kotayî da, encamî em beşe pêşkeş dekirêt. Şiyawî bas e lem romane da gelêk amajey pêwendîdar be çemke rexneyîyekanî Althusser debînêrêt, belam ewey mebestî twêjîneweke ye, ewane n ke pêwendîyan be pirsî ziman û helwêstî kesayetîyekan lem barewe heye; boye kemtir awî le nimûnekanî tir dedirêtwewe.

## 2.2. Rengdanewe û Banderî Îdeolojî

Îdeolojî yekêk le girîngtirîn mijarekanî berbasî rexnegiranî Marxiste. Em çemke le berhemekanî Marx û Engels da bo yekem car be watay rêkarî çînî serdestî xawen keriste û hêzî berhemhênan bo xapandinî çînî bindest û şardinewey rastîyekanî jiyanyan rengî dawetewe. Althusser em çemkey kirde kolekey teorîyekey û be şêweyekî rêsamend û tekûz perey pê da û şêwekanî geşekirdin û bilawbûnewey le komelge da şirove kird. Îdeolojî ew hêz û wize şaraweye ye ke sertaserî jiyânî mirov û hêlûkewt û bîrkirdinewey tenîwnetewe û bê ewey bo xoyan agadar bin le pênav berjewendî çînî çewsêner û çewsandinewey xoyan karî bo deken. Le îdeolojî da, ewey wêna dekirêt, sîstemî pêwendîgelî rasteqîney zalî ser bûnî takekan nîye, Belkû pêwendî xeyalîy em takane ye legerî pêwendîgelî rasteqîney zalî ser jiyanyan (Althusser, 1971: 113). Althusser hewî dawê be yarmetî zanist û hênanegoî felsefey rûnakîbexşî xoy rûnakî bixate ser layene şarawekanî îdeolojî û şêwe rengame û firîwderekanî dagîrkirdinî zeynî takekan.

Îdeolojî zor serkewtûwane û be bê helxiandinî hest û helwêstî berengarî û berxodan le layen take bindestekanewe amance çewsênerekanî xoy desteber dekat. Le romanî berdest da rengdanewey em rewşe debînîn. Bo nimûne:

Carekê Sertac Merasîmê bi hincetekê anîbû malê jî. Diya wî pir û pir kêfa xwe jê re anîbû, bi saetan li ber rûniştibû û wekî ku ew ji esmanan daketbe, zîq lê nihêribû, Sertac jî wilo ... Wî di riya malê de jê re gotbû ku, “Rewşa me ya aborî hinekî xerabe, palkursiyên me tune ne Wî jê re gotibû ku; “Diya min dibe ku bi zimanê we bipeyve, lê ew baş bi zimanê we nizane...” û ji ber hindê daxwaza lêborînê ji Merasîmê kiribû. (Ozmen, 2010: 62)

Sertac le katî tazelawî da, bo yekem car kiçedostekey be nawî Merasîm, ke bawikî polîsêkî Kurdî xanensîn e û le taxî jûr dejîn, debat bo malî xoyan. Le romaneke da şarî Hezex, le Bakûrî Kurdistan, be ser dû geiekî jûr û jêr da dabeş kirawe, ke le taxî jûr da karbedestan û karmendan û hêzên ser be dewlet nîştêcê kirawin û le taxî jêrîş da xelkî hejar û bêdeselat û mafbiaw û dije dewlet dejîn. Merasîm taqaneqçî ew male ye û le naz û xoşî da perwerde kirawe; boye Sertac le rêda basî rewşî xirapî abûrî malî xoyan û nebûnî pêdawîstîye pêşkewtûwekanî nawmal û Turkî nezanînî dayikî bo dekat û daway lêburdinî lê dekat.

Lem dêiane da boman derdekewêt ke danîştûwanî taxî jûr, ke Kurdîşyan tê da ye, hemû be Turkî deaxifin. Em rewşe be serincdan be dewletîbûnî mabatên taxî jûr, bo Turkiya ke tenanet be Kurdî qisekirdinî xelkî asayîş rêpênediraw bûwe, asayî ye û bo Kurdekanî ewê, detwanêt le ber bandorî îdeolojî zal yan jî le ber naçarî û tirs le derkiran û kardanewey dewlet bêt. Belam şermezarî Sertac le Kurdîaxaftinî dayikî, bo zeynîyetêk degeîetewe ke be hoy îdeolojî netewey serdestewe dagîr kirawe; zeynîyetêk ke zimanî Turkî be zimanî pêşkewtû û xawen pirêstîjî dewlemendanî xawen jiyar û zimanî Kurdî jî be zimanî kembayex û astxwarî hejaranî dûrejiyar û diwakewtû dezanêt.

Sertac xwêndewar e; boye be xurtî kewtûwete ber bandorî îdeolojîy zimanî zal, bê ewey xoy hestî pê bikat, bêîêzî be zimanî xoy û dayikî dekat. Hekarî besûkdananî zimanî Kurdî, bo riwangey deselat û piropaganday hemeçêşin û hemelayene û hemîşeyî bo hêja nîşandanî Turkî û sûk niwandinî Kurdî degeîetewe. Em hêrişe berbilawey îdeolojî zal axêweranî zimanî bindest weha lê dekat le xudî karbedestanî îdeolojî ziyatir bawer be rastî ew riwangeye biken û be şewey

nerm û dûr le tundûtîjî hestpêkiraw, mil bo xwastî deselat keç biken û zimanî xoyan bibiîn. Le şîwênêkî tirî romaneke da, em rastîye tale, toxtir rengî dawetewe û Sertac be awîdanewey le bîrewerîyekanî serdemî mindalî delêt:

Ew dem û dewranên xwezîpêanînan dabihurîbûn çûbûn. Tevî ku diya wî bi Kurdî ji wî re digot ku “Em Tirk in”, bi tevî ku mamosteyên wî bi tirkî wî re digotin ku “Türkün Türkten başka dostu yoktur” (ji bilî Tirkan tu dostê Tirkan nîne), dîsan jî çênedibû. Xeletîyeke mezin di van gotinan de hebû lê ew bi ser ve nedibû. (Ozmen, 2010: 61)

Sertac basî bîrewerîyekanî serdemî mindalî û riwangey endamanî malbat û mamostayên qutabxane le ser ziman û netewey serdest dekat. Lêre da serlehengî roman lew şitaney ta êsta le nêw binemale û xwêndinge fêryan biwe dekwête gumanewe. Hekarî em gumanêş, ziyatir, Mihemedî xalo ye ke tenanet le bawikî xoştirî dewîst. Xaloy, şîîşgêîkî çepgerî tevgerêkî Kurdî ye û kartêkerî zorî le ser bîr û riwangey da heye. Nawbiraw, her le katî mindalî Sertac da, be destî hêzî dewletî dête kuştin û bîrewerî şîn û giryan û kutane ser mal û heşêwandinî kelupelî nêw malyan bo yekem car derûnî birîndar dekat.

Lêre da, bandorî îdeolojî zor zeqîr û qûtir e; be çeşnêk ke tenanet dayikî Sertac ke xwêndinge neçûwe û lew rêgayewe zimanî nebiawe û wişeyekîş Turkî nazanê, weha çawî le rast rastîyekanî bestrawe, be zimanî Kurdî bas le Turkbûnyan dekat. Lewaneşe le ber tirs û toqandin bê, be taybet ke birakey be destî xawen heman îdeolojî kujrawe. Be leberçawgirtinî egerî yekem, xuya ye ku deselat be sûdwegirtin le rêûşîwênî corbecor, îdeolojî be hemû qujbinêk da bilaw dekwetewe û le hemû mêşkêk da cêgîrî dekat. Em riwangeye bo siyasetekanî paş şestekanî Turkiya degeîetewe ke deselat be şêweyekî tund hewî tiwandinewey şunasî Kurdîyan deda; be çeşnêk ke cêbecêkaranî siyasetî asimîlasyon le raportekanyan da be pêdagirîyewe dawayan dekird “ku divê dewlet hînî Kurdan bike ku ew ne Kurd in, lê Tirk in” (Çîçek, 2013: 12).

Dewlet, le rêy amêrî wek radyo û têlêvîzyon û be yarmetîy kargêian û bangeşekaranî îdeolojîyewe malbema degeîe û mêşkekan dagîr dekat; be corêk ke pêdagirtir le endamanî çînî baladest, le pênav berjewendîyekanî ewan da û bo milkeçî û çewsandinewey ziyatirî xoyan be karyan dehênêt. Be witey Bourdieu (2008: 26), têlêvîzyon zortirîn derfetî teşedan be bîrî beşêkî gewrey xelkî le ber dest da ye û be zeqkirdinewey rûdawî bê bayex, serincî cemawer le ser rûdawe girîngekan heldegrêt û le batî ewey katekanyan bo destxistinî zanyarî sebarete be mafe

dîmokratîkekanyan terxan biken, bo şitî pûç û kem bayex be fîfoy deden.

Ciya le helwêstî dayikî Sertac, ke pîşanderî roçûnî îdeolojî çînî baladest be naxî zeynî take bindestekanda ye, mamostakan, wek karmendanî dewlet, kargê û perepêderî îdeolojî û mindalan be corêk perwerde deken ke rewşî dasepaw wek waqî'î negoî jiyan derxwardî mindalan biden. Le layekewe, mindale Turkekan weha radehênin ke Turkbûnyan be watay bertir û sertirbûn û hoy şanazî û hokarî pêşkewtinyan e. Le beramber da, çewaşekarane, le mêşkî mindalanî Kurd da em baweie naîastî rastniwênî tejî le îdeolojîye deçênin ke kurdûn be watay dujminayeti şaristanîyet û pêşkewtin û ewlehî wilate û ew Kurdaney xwazyarî emane n debêt nikoî le ziman û regez û nasnameyan biken, debêt milkeç bin takû dewlet mafî jiyaneî Turkaneyan bidatê. Nimûneyekî tirî kartêkerî îdeolojî zal, dîmenêkî gewreşarî Amed e ke, le romaneke da bem çeşne wesf kirawe:

Wê hingê artêşa ku ji dendikfiroş, selpakfiroş, benîştîfiroş, simîdfiroş û boyaxçiyên temenbiçûk ... ji qunc û quncikên bêhnpeketî yên çayxaneyan, ji bin berbanikên marketan, ji pasajan, ji stargehên nediyar ên vî bajarê quzilqurtxwarî û vexwarî derdiketin û bi hemû halperêşanî, belengazî, pepûkî, hejarî ..., li ser û bin û çep û rastê kûçeyê, xuya dikirin; ... Icar bi Tirkiyeke kutekut, bi çelakeyên qûnbelot, bi qureyên zikbirçî, bi leşkerên zimandirêj, bi dekbaz û tolîkan, bi xirif û xirbo û qebrax û çaqokêş û azarkêş û ... kûçeyê re diketin heftûheştê; ... kê gotibû ku ew zaro, zarokên şoreşê ne? kê gotibû kû ew zaro, bermayîyên vî şerî ne? (Ozmen, 2010: 124-125)

Lem pardeqe da, rewşî mindalanî hejarî bajêrî Amed le zimanî Sertacewe debîsîn. Nawbiraw le bin çawdêrî duktor Sarînî derûnpizîşk, ke diwayî dostayeti de navberyan da çê debê û Sertac maweyek le malî ew da demênêtewe, xerîke beserhatekanî jiyan û derûnî alozawî xoy û rewşî nalebarî nîştiman û hawzimanekanî bo degêîetewe, basî nehametîyekanî bîst û dû roj destbeserî û eşkencey bo dekat ke be hoy raportî mamîyewe be serî da hat. Mam û mamojinî hemîşe xaloy Sertacyan be xapênraw û xeyalperist wesf dekird û paş kujranîşî dîsan her bêêzî pê deken; boye Sertac rîqî le mamîyeti û nakokî û şeî dekwête nêwanyan û encamekey raportlêdan û gîranî Sertac e be tometî çalakî siyasî dije dewlet.

Emaney sebarete be mindalanî belengaz gutirawe, waqî'î komelge û akamî bekalakirdin û be çawî qazancewe seyirkirdinî hemû şitêk e û wek debînîn hemû dinyay tenîwetewe. Ciya le emane, lêre da rastîyekî girîngî dîke xiraweteû, ke ewîş mamelekirdinî ew mindalaneyê "bi

tirkiyeke kutekut”. Ew mindalane le gewreşarêkî Kurdan, wate Amed, ke be paytextî Bakûrî Kurdistan nawdêr kirawe, bo firoştinî şitûmekekanyan pena debene ber zimanî Turkî û eme nîşanderî bilawbûnewey zimanî serdest le dilî cemawer û le nêw bazai da ke lewane ye zorbeyan xwêndewarîy Turkîyan nebê yan zor kem bêt. Xozimanbirî yekêk lew petayane ye ke derûnî Sertacî hejandûwe; boye Amed be “bajarê quzilqurtxwarî û vexwarî” wesf dekat. Em petaye, nek her Amed, zorbey şarekanî Bakûrî Kurdistanî girtûwetewe; keçî îdeolojî way le xelkî kirdûwe axaftin be Turkî le bazai û tenanet le mal da bûwete buyerêkî asayî û wek heqîqetêk çawî lê dekirêt.

Îdeolojî wek hêzêk wesf kirawe ke mirovekan le rast waqî' kwêr dekat. Be watayekî tir, detwanîn bilêyn îdeolojî xawen ew hêze ye ku be goînnî araste û rûy riwanînî takekan, serincyan berew aqarêkî tir radekêşêt; aqarêk ke pêwendîe çewsêneranekanî çînî serdest û bindestî lêwe diyar nîye û nabîte heîşe bo ser berjewendî deselatdaran. Le rastî da, îdeolojî sûjekanî weha radehênêt, bêcge lewey xoy deyewêt, netwanin çî tir bibînin. Wek le romaneke da pîşan dirawe, layengiran û çalakanî mafî mirov, ber pêy xoyan û mindalan û çewsawekanî şar û wilatî xoyan nabînin; belam le kevinesûka Amed le meydanêkî qerebalix, şeş jinî law û serpêçraw xêwetyan bo kokirdinewey piştgirî bo Felestînyan heldawe; keçî agadarî komelekujî enfal û Helebce nîn, yan girîngî pê naden (Ozmen, 2010: 43). Her wehaş, Elî Osmanî xwêndkarî Mamosta Sertac, wêney çend mindalî Felestînî dênêt ke be hêrişî Israyîliyekan hatûnete kuştin û le ser textey poleke heldewasêt (42). Sertac, sereîay piştastkirdinewey rewayî hewlekanyan, deyewêt têyan bigeyenêt ke awîêk le derdorî xoşyan bidenewe û hemû rastîyekan bibînin; belam, bilawbûnewey îdeolojî zal, le rêy dezga îdeolojîkekanî dewletewe, wate le rêy mizgewt, malbat, xiwêndinge, radyo û têlêvîzyonewe, wehay lê kirdûn bo dûr biîwanin û hest be naasayîbûnî rewşî xoyan û sitemlêkirawanî nizîk xoyan neken.

Hêzî îdeolojî lewe da ye detwanê be lêpêçînewey takekan, biyankat be layengirî xoy û tenanet demargirjtir, pêvajoy çewsandineweyan pê berew pêşewe bibat. Wek dezanîn ta seretay newedekan qisekirdin be zimanî Kurdî le Turkiya tawanî yasayî le ser bûwe û lew katewe ew yasaye helweşawetewe; keçî paş em rêkkewte, nek her rewşî Kurdîpeyvîn baştir nebûwe, tenanet zor xiraptir bûwe; wate, ewey be zebîrî zîndan û eşkence û kuştin be tewawetî cêbecê nekira, îdeolojî be sanayî û be dagîrkirdinî bédengî zeynî Kurdan, be serkewtûyî pêşî xistûwe. Amancî îdeolojî, be bê beşdarî çalakaney bindestan desteber nabêt. Pirsyarekanî kotayî em pardeqe,

dilsardî û bêhîwayî serleheng le şoiş û bêakamî û şikistî derdexat; be çeşnê ke, wek le çend lapeyey diwatirî romaneke da deybînîn: “Wilo xuya bû ku ne bi tenê ên mirovan, xûy û xisletê pisîkan jî guherîbûn, mexabin pisîk jî bûbûn dijmînê şoreşê, wê şoreşa tikûtenê, wê şoreşa bêxwediya li ortêmayî” (132).

Eger em bêhîwayîye le pêwendî legeî ziman da û le dinyay waqî' da rave bikeyn, debînîn parte siyasîyekan jî, ke Althusser be dezgay îdeolojîkî jêr deselatî dewletyan dadenêt, bê ewey hestî pê biken, rêk bew rêgayê da roystûn ke deselat û îdeolojîyê zala destînîşanî kirdûwe. Bo nimûne, HDP sereîay ew hemû çalakî û têkoşane siyasîyey bo parastinê gelê Kurd le Bakûr û Turkiya, ta êsta be şêwey pêwîst, girîngî û bayexî be pirsê ziman nedawe. Elbet tevgerê Kurd, paş 2007, hawkat legeî girtine berî siyasîyê niwê û daxwazî ‘Xobêweberîy Dêmoqratîk’ dayay perwerde be zimanî dayikî û befermînasandinê zimanî Kurdî dekat û lew pêname da destî be têkoşanêkî xurt kirdûwe û bo em mebeste, ‘Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî’ (TZPKurdî) damezra ke le zorbey şarekan da çalakîyê karîgerî le pêname ziman da beîwe birdûwe (Çîçek, 2013: 26-27). Belam, sereîay ew hewlê, behendwernegirtinê metirsîyê lenawçûnê ziman le layen parte kurdîyekanî ewêwe wek awirdûyê awirî zimankujî bûwe û bûwete hoy serkewtinê ziyatirî deselat.

Bizûtnewey siyasî dereweş, sereîay çend hewlê girîng, be heman şêwe kewtûnete ber bandorê ew helûmerceyê dewlet be dirêjayî çendîn deye le rêyê damûdezgakanîyewe be ser Kurdan da sepandibûy. Le Aprilê salê 2002 da, Kongirey Azadî û Dêmoqirasîyê Kurdistan “pêdagrîyê le ser xwêndinê û weşanê bername be zimanê kurdî kirdûwe” (Ehmedzade, 2018b: 403). Pêştirîş le mangê Mayê salê 1995 da yekemîn kenelê asimanê Kurdî be nawê Med TV le Îngeltera danira, ke Hassanpour be ‘Zankoy Ziman’ nawdêrî dekat. Amancê û hîwayê serekîyê ew kenelê, ewe buwe “le bûjanewey zimanê Kurdî û bexşînewey nasname be netewey çewsaweyê Kurd beşdarî bikat” (Hassanpour, 1999: 235). Em bexodaçûnewe û goiankarî û hewlê nîşanderî famkirdinê gimîgîyê zimanê derxerî awîdanewe le em pirsgerêke çarenûssazê n; belam em taktîkane, le astê sitratêjîyê serekîyê deselat da lawaz in û neyantiwanîwe ber bew lafawê berfirawane bigrin ke binçîney xanûyê zimanê Kurdîyê sist kirdûwe û berew rûxanê birdûwe.

### **2.3. Mîkanîzmê û Dewrê Dezgayê Serkutê û Îdeolojîkî Dewlet**

Althusser dewlet be ser dû corê damûdezgayê serkutê û îdeolojîkî da dabeş dekat ke le pêname

yek amanc da ke milkeçkirdinî hemîşey çînî bindeste kar deken. Belam ew mijarey lêre da le serî radewestîn, dezgay serkut, be pîianî, le tundûtîjî kelk werdegrêt û take milkeçnebûwekan temê dekat. Belam dezga îdeolojîkekanî dewlet zor car be şewey nerm û niyan û be dûr le tundûtîjî erkekanyan be baştirîn şewe û karîgertir le dezgay serkutî dewlet tèdepeînin; eger çî em dû dezgaye, hendê car şewey rûbeûbûnewey yekdiş bekar dehênin. “Dewrî dezgay dewlet, wek dezgay serkut, le binefet da ewe ye be yarmetîy tundûtîjî (fîzîkî û htd) helûmercî siyasîy berhemhênanewey pêwendîyekanî berhemhênan - ke le diwa qonax da pêwendîy çewsênerane n - xoş bikat. Her wehaş, helûmercî siyasîy bo karî dezga îdeolojîkekanî dewlet bîfexsênê” (Althusser, 1971: 100). Le riwangey bîrmendî nawbirawewe hemû ew dezgayaney komeleşyan pêk hênawe, be hikûmî û nahikûmîyewe, le pênew parastin û peredan û cêgîrkirdinî îdeolojîy zal da kar deken. Em dezgagale le binemale û qutabxane û mizgewtewe bigre heta radyo û televizyon û huner û werziş û edebiyat û htd. degrêtewe. Dezgay serkutî dewlet le zor şiwênî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da we ber çaw dekwê. Bo nimûne:

Sertac mezin dibû û mirin jî her diçû mezintir dibû li Hezexê û ji her du dengweşên mizgefta wê, bangên geftije bilind dibûn roj bi roj. Xortên Taxa Jêrê diçûn hewşa şaredariya dîsan bi repetepeke leşkerî, çep, rast, çep, rast, çep, rast! Cendekên şeivanan anîbûn wir û ew li binê xincîkê û li tenişt hev bi cî kirbûn bo temaşeyê. Kê culhet bikira gotinekê bike? Lê di vegerê de dipispisiyan keregêjen Hezexê;

- “Lawirên efrîkayî anîne...”
- “Mar in, mar!”
- “Dûpişk in, bi xwe ve dane...”
- “Ew ne kurê filankeso bû?”
- “Ne qîza bêvankesê bû?”
- “Derpî lê nebû...”
- “Weyyyyyy!” (Ozmen, 2010: 63)

Em buyere yekêk le bîrewerîye dilhejênekanî Sertac e le debistan da; ew katey serbazekan le rêy mela û bilîndgoy mizgewtewe xelkiyan banghêştî hewşey şaredarî kirdibû û beîweber û mamostakanî qutabxaneş, mindalaniyan birdibû bo ewê. Çekdaranî dewlet û şareday Hezex, be nîşandanî termî kuî û kiçên şeivan, hoşdarî dedene bawik û dayikekan mindalekanyan nedene dest “van terorîstan, van ermenîyan, bolşevîkan ...” (Ozmen, 2010: 63). Inca “xortên taxa jêrê” be pêşkeşkirdinî sirûdî neteweyî kotayîyan be girdbûneweke hênabû. Bem çeşne, wek Sertac delêt, “dersa wan a wê rojê jî bûbû temaşakirina cendekên bêxwedî”



(64).

Em dêianey serewe û dêien diwatir, sêberî qursî toqandin, heîşe, bêêzî û tundûtîjîy fizîkîy dezgay serkutkerî dewletî be baştirîn şêwe pîşan dawê. Her wehaş, rehendî siyasîy dezgay serkutî dewlet, be pîşandanî termekan le hewşey şaredarî û gutekanî şaredar da, derkewtûwe. Ciya le emane, xiîbûnewey xelk û wesfyan be “keregêjên Hezexê” û demeteqeyan le geianewe da, derxerî hêzî çewaşeker û belaiêdaberî îdeolojî û dezga îdeolojîkekan û berkewtin û karîgerîwergirtinî zorîney xelke. Lem romane da, bew pêyey barûdoxî gelî Kurd le Bakûr da denwênêt, le zor cêy tir da, hêlûkewtî dezgay serkutî dewlet we ber çaw dekewêt (18; 36; 56; 57; 60 û htd). Be witey Barak (2002: 76-78) dewlet le çendîn rêkar bo asimîley çandî û zimanî Kurdan kelî wergirtûwe û siyasetekanî pêş xistûwe ke birîtîn le, qedexekirdinî çapemenî û weşanî Kurdî, xwêndinî naçarîy Turkî le debistan û zanko, gofînî nawî şar û gund û şax û çom û gişt nawêkî taybetî deverên Kurdan û qedexey nawî Kurdî bo mindalan, kawilkirdinî çîwar hezar gund, dûrxistnewey Kurdan bo nawçeyên Turknişîn û hênanî Turkan bo şarekanî Kurdistan.

Le layekî tirewe û le pêwendî legel diwekey tirî dezgay dewlet da, mizgewit û medrese debînîn ke Althusser wek dû dezgay îdeolojîkî karîgerî dewlet deyannasênêt. Lem bîrewerîyey serleheng da, mizgewit amrazî rakêşanî xelk û amadekarî bo gwêhelxistin le gutekanî berpirsî dezgay serkutî dewlet e û bew pêyey le nêw xelk da xawen pêgeyekî behêz e û be dirêjayî temen bawerî û mitmaney le zeyin da çandûn, erkekey be baştirîn şêwe radepeîênêt. Her weha, birdinî mindalan bo bînînî ew şanoye diltezêne, nîşanderî hemahengîy aşkiray dezgay fêrkarî û serkutî dewlete. Althusser dezgay fêrkarî û perwerde be dezgay îdeolojîkî zalî cîhanî sermayedarî nawdêr dekat (1971: 103).

Sebarete be mijarî berbas, ke rewşî zimanî Kurdî ye, tundûtîjîy dezgay serkut le meî bekarhênanî em zimane, le zor şiwênî romaneke da hestî pê dekirêt; herçend ke be şêwey rastewxo newirûjênrawe; bo nimûne, sebarete be rewşî xirapî mindalanî taxî jêr, ke amaje ye bo gelî bêmafkirawî Bakûr, nûsirawe “zarok û zêçên wê taxê giş perîşan û kuxikî bûbûn ji serman û ji bêdermaniyê. Wan ne xewn û xeyal hebûn ku xwe li ber tîna wê germ bikin û ne ji zar û ziman ku derdê xwe bigihînin jor” (Ozmen, 2010: 74). Bêbeşbûnî mindalanî taxî jêr le zar û ziman, amaje ye bo ciyawazîy zimanî em mindalane û zimanî çînî baladest û her weha gwênedan û nebîstinî êş û azaryan be zimanî Kurdî. Eman ciya lewey zarokî taxî jêr in, le ber destkurtîy

malbat, naçar in bo bijîwî jiyan, mindalîyan heîac biken. Ke wa bû, natwanin biçine debistan û bem hoyewe zimanî Turkî nazanin û boyan nîye be zimanekey xoşyan qîse biken; boye, bêbeş in le zimanê “ku derdê xwe bighînin jor”. Em bêzimanîye, her weha ke bas kira, le rewşî ew mindalane da ke be “tirkîyekî kutekut” (125) şitûmekekanyan defroşin, rengî dawetewe. Rengdanewey rehendekey tirî dewlet, wate dezgagelî îdeolojîk, bem core ye:

Û meseleya esl û fêslê malbatê, kok û rehên bavê min û yên diya min, yekî muhacir û yeka Kurd, naxwe çima bavê min digot, “Biz Türküz kizim” (Em Tirk in qîza min) û her cara ku wî digot, “Biz Türküz kizim”, eta min dibû pizot û dû ji serî quloz dibû. Wê jî a xwe digot bi qîreqîr û li diya min vedigeriya, digotê bi girî, “Tu çima xeber nadî dayê? Çima nabêjiyê ku hûn ji dêyeke Kurd in? Ma ne esil dê ye...?” Lê diya min a reben dengê xwe nedikir, ne ji bavê min re ne jî ji qîza xwe ya mezin re, nedigot “erê” yan “na”, serê xwe bera ber xwe dida û bi halê xwe de diponijî. (Ozmen, 2010: 19)

Pardeqî serewe gêianewey bîrewerîyekanî Merasîmî le xo girtûwe. Merasîm û xuşkî gewrey be nawî Yasemîn, lege bawik û dayikiyan da le Enqere dejîn. Merasîm, bawikî be muhacir naw debat, ke lewaneye mebestî ew Turkane bêt ke le derewey Turkiyawê hatûn û lew wilate nîştêcê bûne. Merasîm diwayî debête hawjînî Sertac û destpêkî nasyawêtîyan, wek bo xoy basî dekat (9-10), bo ew deme degeîetewe ke kuiedostî xuşkekey hatûwe bo malîyan û deng û gutekanî debête hoy çandinî ewîn le dil da û le encam da jiyanî hawbeş pêk dehênin. Yasemîn, be pêçewaney xuşkekey, zor girîngî be ziman û netewey xoy dedat û hemîşe berperçî heîsûkewt û heîwêstî bawikî û Merasîm dedatewe û rexneyan lê degrêt.

Em peregrafe barûdoxî pêwendî navberî endamanî xêzanêk dexate iû û be pêy riwangey Althusser, malbat yekêk e le dezga îdeolojîkekanî dewlet. Bem pêye, nawbiraw xanewade wek yekêk le amrazekanî bin rikêfî dewlet dezanêt, ke le rêgayewe endamanî em damezraweye dekewine ber şalawî îdeolojî za û le pê naw desteberbûnî amancekanî çînî serdest da bekar dehênrên. Bawikî Merasîm, wek hêzî baladestî xêzan, be dûpatkirdinewey îdey “ême Turkîn”, deyewêt hawjîn û kiçekanîşî weha lê bikat bawêî tewaw bew îdeolojîyey dewlet bihênin, ke le Turkiya, tenya yek netewe û yek ziman heye, ewîş netewey Turk û zimanî Turkî ye. Em hewley ew sebare be Merasîm serkewtû bûwe, keçî kiçekey tirî, Yasemîn, berengarî debêtewe û dexwazêt wirey berengarbûnewe le dayikîşî da bivrûjênêt; keçî kardanewey dayikî, tenya bêdengî û giriyane.

Althusser cext le ser ewe dekatewe ke dezgayên îdeolojîk hemîşe û le hemû şîwênêk da be şêwey nerm û hestpênêkiraw kar naken û hendê car wek dezgay serkut, le tundûtîjî kek werdegrin; her wehaş dezgay serkut jî rêkarekanî dezgayên îdeolojîk bekar dehênêt (1971: 98). Hêlûkewtî dayikî Yasemîn em guteye piştîast dekatewe. Giryan û bêdengî ew le hember pirsyarekanî Yasemîn ke be giryan û paianewe daway kardanewe û bediroxistnewey gutey şûwekey lê dekat, nîşaney destewestanî û naçarî ye, derxerî tundûtîjîyek e be serî da dasepawê û be naçar milkeçî kirdûwe. Belam milkeçîyekey le ber baweyî bew guteye nîye, belkû zoremlêyane û be pêy tundûtîjî ye. Ew wek jinêkî Kurd û wek sembulî hemû bindestan, rettanewey gutey mêrdekey bo nalwê û natwanê wîlamî kêşekê nedatewe û qisekanî piştîast nekatewe; boye bêdengî û giryan heldebjêrêt. Em barûdoxe ciyawaz e leger ewey dayikî Sertac, ke be zimanî Kurdî deygut, “em Tirk in” (Ozmen, 2010: 61). Lew da îdeolojî bûwete hoy kwêrbûnî çawî waqî'binî; keçî lêre da, serkut û bûwete hoy daxistinî dev û deng. Pardeqî jêreweş, derkewtinî dezgay îdeolojîkî dewlet e be rengêkî dîke:

Rûdine û dêhna xwe dide sinifê, ser xwendekaran. Li rêza qîzikan dinihêre di bin çavan re. Ew li hêla çepê ne û tevî tevî deh qîz in. Biedeb û terbiye ne, bêdeng û bêhis in û zehf şermoke ne, pişt re Rabîa ne, Hebîbe ne, Aleyna ne, Zeyneb in, Xeyrûnîsa ne, Fatîma ne, Umeyye ne, Mûslîme ne ... Ê li hêla rastê, li kêleka şîbakên dirêj û bilind û caxcaxî jî lawik rêz bûne. Elî Osman jî tê de, her yek bi tiştêkî ve mijûl e. Hinekên wan, wek Îmadeddîn û Carullah û Zekerîyya û Mucahîd û Kaddafî, fena xwişkên xwe yên li destê çepê, Qur'anê dixwînin. (Ozmen, 2010: 26-27)

Mamosta Sertac, be zoremlêy bawikî û be pêçewaney xwast û hez û rêwîyê hizrîy xoy, rewaney xwêndingey zanîstê ayînîyekanî “Îmam Xetîb” dekirêt. Dêrekanî serewe, le roçney çawî Sertacewe, wesfî xwêndekaranî polî diwazde dekat. Le layêkewe kêçên destemoy şermêwinî Qur'anbedest in, ke tenanet le katî bersivdanî pirsyarekanî mamosta da, lêy nanêrin û herdem çawyan le ser texte keskeke ye. Le alyê beramberîş da, kuianêk debînîn ke hendêkyan seryan bo Qur'an danewandûwe û lewane Elî Osmane, ke kesayetîyekî zor baweymend e û tenanet heley mamostakey le katêk da mamostakey basî rîwayetêk lebarey afranî nivîsî hemû qewmêk be destî Adem dekat, le kotayî qisekanî da, Elî Osman deng heldebiê û delêt: “Yaho vî xoceyî dîsan ‘aleyhî’s selam’ ji bîra kir ev bû çend!?” (25).

Amajey serewe, ciya le ewey nîşanderî doxî nalebartirî bindestî û milkeçîy zayendî mê û

zextî çendhêndey tundûtîjî û îdeolojî ye, zor be rûnî bandorî dezgay îdeolojîkî ser be ayînî pêwe diyare. Le pêwendî leger babetî berbasî ême da, em dezgaye le nawî xwêndkarekan da rengî dawetewe; be çeşnê ke hemûyan nawî toxî Erebiyan girêdirawî ayînî Îslamyan le sere. Le rastî da dezgay girêdirawî ayîn, lem pêwendîe da, leger amanc û berjewendîyekanî deselat da hawterîb e; be corêk ke xêzane Kurdekan dûr le guşarî hestpêkirawî derekî, xoyan le nawên Kurdî debiwêrin. Elbet pêwîst e eweşman le bîr neçêt ke nawî Kurdî le Turkiya da bo maweyekî dûr û dirêj qedexey le ser bûwe û êstaş zor naw be bive ejmar dekirêt. Belam sereîay em rastîye, bilawbûnewey nawgelî amajebokiraw le civakên Kurdî da zor û firepat bûwe û heta niha jî zorêk lew nawane baw in. Eger çî bilawbûnewe û bawbûnî em nawane, le nêw Kurdan û gelên musulman da, bo çendîn sede pêş êsta degeîetewe, belam dewlet-netewey modêrn jî be qostinewey em helûmercey ke piianîy Kurdan bawêî pitewyan be ayînî Îslam heye û le pê naw serxistinî siyasetî dije zimanî da baştirîn kelkî lê bînîwe.

Le goşenîgay bîrdaiêjanî îdeolojîyewe, lewane Marx û Engels, ayîn wekû keristeyek e le destî milhûian û sitemkaran da, bo ewey xelkî pê bixapênin û weha serxoşî bengî îmanyen biken, serincyan berew alîyek rabikêşin ke encam û amancî, parastinî berjewendîyekanî çînî serdest e. Althusser, kilêse be dezgayekî îdeolojîkî dewlet nawdêr dekat, ke wek dezgakanî tirî berbasî ew, ziyatir be şewey nerm û niyan û dûr le tundûtîjîy fizîkî, îdeolojîy zal be nêw xelk da bilaw dekenewe. Îdeolojî be yarmetîy dezga corbecorekan û le rêgay lêpêçînewe û bangkirdinewe, sûçbesûçî komege detenêtewe û takekan berew lay xoy radekêşêt. Takekan bê ewey hest be naasayîbûnî rewşeke biken û bê ewey xoyan bizanin, milkeçî îdeolojîy çînî çewsêner û dezga îdeolojîkekanyan debin û wek sûjegelî destemo, bo xoyan milkeçîy xoyan piştîast dekenewe û berhemî dehêninewe.

Le çaxî derebegayetî le Ewrûpa da, le ber pêşnekewtinî teknoloji, dergay dewlet bo çûne nêw mafekan ayîn û dezgay ser be em gutare bûwe. Althusser kilêse be dezgay zalî ew serdeme pênase dekat; dezgayek ke nek her kar û erke ayînîyekanî le jêr rikêf da bûwe, belkû balî be ser karî fêrkarî û beşêkî girîngî karî ferhengî û karubarî taybet be pêwendîekanîş da kêşabû (Althusser, 2019: 102). Nawbiraw bas lewe dekat ke dezgay zalî serdemî sermayedarî û cêgirewey ayîn, perwerde ye û dûwaney xwêndinge-xanewade le serdemî êsta da cêy dûwaney kilêse-xanewadey serdemî derebegayetîy girtûwetewe; belam, sîstemî borjiwazîy zal hewl dedat way binwênêt ke dezgay zalî sîstemgelî komeleyetî, dezgay siyasî, wate rijêmî dêmokratîkî

perlemanîy berhemî dengdanî cemawer û milmilanêy partekan e (103-104). Her weha ke le deqeke û le waq'î jîyan da deybînîn, lem sedeyeş da, le rojhelatî nawîn be hemû netewekanewe, rolî dezgay ayînî û damezrawey ser bem dezgaye, nek her kem nebûwetewe, tenanet geşey kirdûwe û dezga Îdeolojîkekanî dîkey wek fêrkarişî xistûwete bin destî xoyewe.

Lem romane da, dezgay îdeolojîkî ayînî, amadeyî û dewrêkî zor berçawî heye û bandorî qurs û qûlî be ser zorêk le karekterekanewe debînêrê. Tenanet, Sertac ke be dirêjayî temenî, xoy le dezgay ayîn parastûwe û berheistkarêkî çalakî îdeolojîy zal e û be be pêçewaney wîstî deselat û helwêstî zorîney sêjekan, girîngî be netewe û ziman û barûdoxî nalebarî çînî çewsawe dedat, hendê car tûşî diidongî û dileiawê û tirs û guman debêtewe. Em dezgaye ke hemû qujbinêkî derdorî Sertacyan tenîwetewe, destberdarî nabin û berdewam le rêy sêje destajo û bawemendekanîyewe, le malewe bawikî û le medrese Elî Osman û be giştî, ewaney deyannasê û deyanbînê, lêpêçînewey lê deken û berew sêjey mezin palî pêwe denên. Katê le male çolekey da çawî be Qur'ane diyariyekey Elî Osman dekewê, le ber ewey destniwêjî nîye, diidong e lewey destî bo berê, boye, “nalet li Şeytên tîne û bi wê tirsê ji odeyê derdikeve” (Ozmen, 2010: 68). Carêkî tir, be bînînî Qur'aneke xof daydegrê, em care helîdegrê û sê car maçî dekat û le dilî xoy da delêt: “Ne nizamim çi di hundirê te de hene!? Ne nizamim tu seba çi hinde tesîrê li giyanê min dikî bêyî ku ez bawerî bi te bînim!?” (89).

Le pêwendî legeî nawî ew mindalane û namokirdinî Kurdan le nawgelî Kurdî û be giştî le zimanî dayikîyan, deselat bêcge le sûdbînîn le dezgay ayînî, ke pêşwext be harîkarîy dezgay malbat sêjegelî destajoy xoyan çê kirdûwe, be hoy berhemî dezgakanî dîkey girêdirawî ferheng û huner û werzişewe, berdewam kar bo becêgeyandinî amancekanî dekat. Dewlet le rêgey radyo û têlêvîzyon û setelayt û be zincîre dirama û film û bernamey mindalan û her weha kitêb û rojname û govarî rengame û htd. nawî lem core û nawî Turkî be ser sêjekan da desepênê. Dezgayên îdeolojîk, be çêkirdin û nasandinî sêjegelî mezinî helgirî em nawane rêklambokirdinyan û lêpêçînewey sêjegelî biçûk be hoyanewe, zorîneyan dekene hawpişkî îdeolojîyekey xoyan. Lem pardeqey xwareweş da, Sertac tevlîy kayey çend kiçoley hawtemenî dirawsêy debêt û be niyazî xapandinyan pêyan delêt:

“Ez doktor Sertac im, hatime ku nexweşa we sax bikim” û hema wê gavê wî xwe ji qestîka kirbû mêrê Taybetka ehmeq a gêjgêjokî ... Û bi kevaniya xwe re çûbû mêvandariya cîrana xwe ya bêhal, “Tu jî bêmahne nexweşa min î,” a ku li gorî çîrokê

mêrê wê çûbû şerê Yavru vatanê (navê ku Tirkiya li Komara Tirk ya Qibrisa Bakûr Kiriye), yanê şerê Qibirsê. ... Wî ji cîrana xwe xwestî xwe li pêş doktor Sertacî dirêj kiribû bi sistî ... Sertac bi fesadî gotibû; “Rewşa te pî xirab e cîran, niç û niç û niç û niç, divê ez qûnê biramûsim yan na tu dîmirî” welê bi pisporî kiribû bilmebilm, tirkî tirkî. (Ozmen, 2010: 47-48)

Em buyere bo zarokêtîy Sertac û “taxî jêr”y şarî Hezex degeîetewe. Ew ke hezî le têkeîy kuianî “şûm û nehsî” hawgeiekî nîye, sozyan dedatê kamêrayek bîne û wêneyan bikêşet û bem fêle xoy lêyan dedizetewe. Încê beşdarîy yarîy kîçanî dirawsêy dekat. Kîçan be parçe teneke maîyan çê kirdûwe û be pêlîstok û kel û pelî kon û şikawî nêw zibildanî taxî jûr xerîkî kayekirdinin. Lem taxê da malbatên dewlemendî hêze çekdarekan û karmendanî dewlet nîştêcên. Sertac, be mebestî xapandinî kîçan, nexşey yarîyek dekêşet ke bo xoy duktor e û le nexoşîy ewan dekolêtewe.

Sertac, bo ewey xoy wek duktorêkî rasteqîne derbixat û kayeke be şêweyekî şêlgîranetir bo kîçan binwênêt, û her weha bo ewey niyazî serekîy xoy bişarêtewe, le hendê peyvî Turkî kelk werdegrêt. Em zeynîyete bo dezga îdeolojîkekanî wekû qutabxane û televîzyon degeîetewe. Dewlet, be perawêzxistinî zimanî Kurdî û zeqkirdinewey zimanî Turkî le hemû cêyek da, be taybet lew şiwênaney pêwendî be pisporî û xwêndewarî û pile û pêgey berzî komelayetîyewe heye, le zeynî mindalan da ewey çandûwe ke Turkî zimanî pêşkewtin û şaristanîyet e û le beramber da, Kurdî, eger wek zimanîş ejmar bikirêt, zimanî kesani diwakewtû ye û tenya be kelkî malewe û têpeîandinî hendê karî rojaney sade û sakar dêt. Em şêwe riwanîne tenanet pêş damezranî Komarî Turkiya û le layen deselatdaranî Osmanîşewe perey pê dirawe (Çiçek, 2013: 2-4). Bem core debînî ke dewlet le rêgay dezga rengame û behêzekanî îdeolojîyewe mindalanîşî kirdûwete amanc û wek sûjey berhemhênerewey îdeolojî bekaryan dehênêt. Bem çeşne, bereyek berew meydanî pêşewîjî jîyan beî dekirêt ku nek be zoremilî, belkû, be azadî û be pêy xwestî xoyan, baştir û karîgertir le neyaran, siyasetî zimankujî beîewe deben.

Le kayey em mindalane da, bêcge le nimûney serewe, îdeolojîyê zêr be şêweyekî tir rengî dawetewe. Katêk ke dewrî her kam le karakterekanî yarîyeke diyarî dekirêt, yek le kîçekan debête jinî serbazêkî şerî Qibirs. Diyar e em nawçeye, le ber Turkbûnî danîştûwanekey, bo dewlet zor girîng e; boye le mîdiyakan da, wek dezgayên şiwêndanerên behêz, berdewam piropaganday bo kirawe; ta ew astey ke tenanet le mêşî mindalanîş da cêy girtûwe û le

kayekanyan da reng dedatewe û bem çeşne îdeolojîy zāl û le berjewendîy çînî baladest da berdewam berhem dêtewe. Be watayekî tir, dewrî lêpêçînewey dezga îdeolojîkekan hênde karîger e mêşkî mindalanîş dagîr dekat û ewan jî lêy derbaz nabin; tenanet lew babetaneş da ke pêwendî be ewan û cîhanî mindalaney ewanewe nîye. Bem çeşne boman derdekewêt îdeolojî temen û kat û şiwên nanasê û ser be hemû kun û keleberêkî jiyanî mirov da dekat; boye, Althusser be bê mêjû û ebedîy dezanêt.

Şiyawî bas e, ciya le îdeolojîy zālî dewletî, her lew lapeîeye da, îdeolojîy dijberî dewlet jî we ber çaw dekewêt; katêk ke kiçan le niyazî xirapî Sertac degen û navberyan legeî da têk deçêt, ew le qîn û bo tolekirdinewe, be dem gutnewey diruşmî “azadî, azadî”, malekeyan têk dedat. Em diruşme, bêcge lewey amaje ye bo îdeolojîy ser be bindestan û berxodan le hember îdeolojîy zāl, nîşanderî bandorî propaganday dewlet e le meî ewey le zeynî sûjekan da, bê ewey bo xoyan bizanin û baweyîşyan pê bêt, ew fikrey çandûwe ke ew hêzane têkder û dujminî asayiş û tenahîn. Em rastîye le şiwênî dîkey romaneke da niwêndirawetewe; katê Merasîm le mêrsînewe berew edene deîwat û “gava tirên di ber taxên rojhilatîyan re derbas bûbû, zarokên taxê yek caran kuç û kevir li trêne barandibûn” (Ozmen, 2010: 21); yekêk deng heldênê û Kurdan be dujminî dewlet û asayiş û xoşî û pêşkewtin naw debat û çend kesî tirîş be cexitkirdinewe le ser em têwanîne îdeolojîke, gutekanî piştîast dekenewe.

## **2.4. Sûje û Pêvajoy Besûjebûn**

Sûje, pênasey takî roçûy nêw gêjawî îdeolojî ye û be gutey Althusser hîç takêk lêy derbaz nabêt; tenanet mirov pêş ledayîkbûn jî corêk e le sûje. Îdeolojî le rêgay dezga îdeolojîkekan û be çekirdinî sûjey mezin û bêkem û kûn û lêpêçînewey takekan, pêvajoy besûjekirdin beîewe debat û sûjey xapênraw bo têpeîandinî erkî xoçewsandinewe û geşedan bem rewte ceîzasaye perwerde dekat. Be nêrînî Althusser (1971: 116), “witezay sûje, çêkerî hemû îdeolojîyek e” û hoy em çêkarîye ewe ye ke, “erkî her îdeolojîyek, ke nasênerî ew îdeolojîye ye, ewe ye take berhestekan bikat be sûje”. Ew take takûterayaneş ke milkeçî îdeolojîy zāl nabin û le dijî helwêst deşrin, sûjey serbizêw in; bew wataye ke le têpeîandinî erkî beserdasepênraw da le batî serşoî û milkeçî, ser berz dekenewe û bergirî deken. Be gutey nawbiraw, em sûjane zor kem in û le beramber hêz û hêjemonîy çînî serdest da ewey boyan demênêtewe doiane. Lem romane da her dû corî sûjey destajo û serbizêw we ber çaw dekewin.

Tak be pîşandanî baweyekanî xoy be encamdanî kirde destînîşankirawekanî her yek le dezga îdeolojîkekanî dewlet, pêvajoy milkeçbûnî azadane û dilxwazaney berew pêşewe debat ûle encam da le nêw îdeolojîy zai da xoy wekû sûjeyekî dilxwazî îdeolojî deselmênêt; sûjeyek ke milkeç û gwêfayelet û baweyî be rêsa û yasakanî destînîşankirawî dezga îdeolojîkekan heye, le yasakan la nadat, le pênav parastinyan da xebat dekar û be şewey corbecor ‘milkeçî’y xoy piştîfast dekatewe û bem çeşne le layen deselatewe şayenî ewe debêt nasnawî sûjey ‘qanûnmend’î pê bibexîrêt û le sûjey ajawegêfî têkder ciya bikirêtewe û mafî jîyan û zîndûbûnî bidirêtê. Be kurtî, pêvajoy besûjebûnî tak bem çeşne ye ke, “îdeolojîy amadey nêw dezgayekî îdeolojîkî madî, bangeşe bo piraktîsgelî madî dekar û ke le layen dabêkî madîyewe rêkdexirên û bo xoyan le helîskewtî madîy sûjekan da amade n, ke bew pefî hoşyarî û be pêy baweyî xoyan kar dekan” (Althusser, 1971: 115). Le pardeqî jêrewe da, le zimanî Merasîmewe dexwênînewe:

Qet ji bîra min naçe. Êvariyeke, seba wê peyva nebixêr -çima ku min nedigot gelê Kurd-bi pêşîra min girtbû û heta ku gotinên xwe yê yekûderb neqedandibûn jî, zû bi zû bernedabû; “Her gava tu bi wî zimanî xeber didî û ji Kurdistanê re dibêjî rojhilata başûr, yekser pêşkêşkerê rewşa hewayê yê ku her êvar piştî nûçeyên mişt piropaganda derdikeve pêş bîneran, tê ber çavên min...”. Bi heman şeweyê, wê nîqaş bi bavê min re jî dikir, nexasim di nûçeyên şehîdan de. (Ozmen, 2010: 19)

Her weha ke pêştir bas kira, Yasemîn û Merasîm dû kiçî xêzanêkî çîwar kesîn û lege bawik û dayikiyan da le Enqere dejîn. Bawikiyan muhacir û dayikiyan Kurd e. Merasîm diwayî debête hawjînî Sertacî hawîyê xuşkekey û wek xoy delêt, “min ew ji kezîkura Yasemînê vedizîbû” (10). Em dû xuşke le zanistgey şarî Mêrsîn da dexwênin. Yasemîn, be pêçewaney Merasîmî xuşk û her weha bawikî, kesêkî behelwêste û le beramber zîlm û zorî deselat hestiyare û herdem le pêwendî lege pîrsî neteweyî û zimanî da be tundî rûbeûy bawik û xuşkî debêtewe û hêriş dekate ser ra û riwangeyan. Nawbiraw sebarek be pêwendî komelayetî jî jîrtir û zîrektir le xuşkekeye ye û waqîî jîyan û pêwendî mirovekan baştir lêk dedatewe. Bo nimûne, le meî pêwendî lege mamostakey û fêl lê kiranî, hoşdarîy dedatê; belam gwêy pê nada û le kotayî da rastîy gutekanî ewî bo derdekewêt. Merasîm diway maweyek jîyanî hawbeş lege Sertac, nêwanyan têk deçêt û paş maweyek pêkewejîyanî zorekî û piimştumiî, lêk dadebîn. Yekêk le hoyekanî nakokîyan, nîştêcêbûnyan le Hezex û be giştî, Kurdistan bû ke ew be “welatê terorîstan” nawî lê dehêna û herdem dawa le Sertac dekird biîone şiwênêkî tir, çunke “herêmeke nehletkirî ye, bi talûke ye, her roj bi dehan mirov li wê tîn kuştin, tîn revandin, tîn şelandin, tûştî tecawizê dibin,



dibin qurbana terorê” (52).

Be gwêrey çemke rexneyîyekanî Althusser, Merasîm nimûney sêjey milkeçî îdeolojîy zala e. Ew le bin bandorî dezgayên îdeolojîkî corbecor, be taybet malbat û xwêndinge û zanko û mîdiya, be zimanî xoy qise nakat û xo le bekarhênanî peyvî gelî Kurd debiwêrê û tenanet be “nebixêr” wesfî dekat. Her wehaş, Yasemîn gutenî, wek nûçebêjî rewşî hewa, be Kurdistan dibêjê rojhelatî başûr. Merasîm, ke be pêy perwerdey îdeolojîy zala deaxfê û defikrê, nek her hest be şaşî û helebûnî gute û nêrînekanî nakat, belkû bawerî qurs û qayimîşî pêyanê û pêdagirîyan le ser dekat. Le rastî da, nawbiraw em hizir û helwêstane be hî xoy dezanê û serçaweyan le awezî azad û biyarderî xo da debînê; keçî le rastî da, ew tenya sêjeyekî karamey îdeolojîy zala e ke bersvî erênîy be lêpêçînewekan dawetewe û pêvajoy besûjebûnî be serkewtûyî têpeandûwe. Boye, boxoşî le ragirtinî perdey reşî îdeolojî le pêş çawanî xoy da beşdar e û bem pêye, girîngî be zimanî dayikîy xoy nadat û lege ewey deyzanê, pêy napeyvê û herdem wane pêahatûwekanî dezga îdeolojîkekan dûbare dekatewe û berhemyan dênêtewe. Bawikîşî nimûney lem core sêjane ye û bo xoy berkewtey çewaşekarî û hokarêkî çêkerî zeynîyetî belaiêdabirawî kiçekeytî.

Be pêçewaney Merasîm û bawikî, Yasemîn nimûney sêjey xapênrawe. Bew wataye ke îdeolojîy zala nebûwete beşêkî girîngî nasnamey û be pêçewanewe, le bin bandorî îdeolojîy dijber, berewîy doxî dasepêndiraw debêtewe û debête berhelîstkarî sêje çêkirawekanî ew deselate. Carêkyan naxoşîy rewşî jiyanî Kurdan debête mijarî gengeşey Yasemîn û xuşkekey û le goşenîgay Merasîmewe debîsîn ke, “her cara ku mijar dihat ser wan mirovên şerpeze, wê bi serê gotinê digirt û dibir bi siyaset a şerî ve girê dida û wek berdevkê wan xeber dida” (18). Ew dexwazê çewtîy têgeyîştinî xuşkekey û sêçî dewlet lem pîrsgirêkey bo derbixat. Nawbiraw be famkirdinî waqîî komele û barûdoxî baladestî û bindestî gelan û pêwendî çewsêneraney navberyan, hewî hoşyarkirdinewey nizîktirîn kesanî xoy dedat; belam têkoşanî çendîn û çend carey çî akamî nabê û eme debête hoy weîezî û tûeyî û berperçdanewey tundutolî. Yasemîn, le dijî hêlêkewtî çewsêneraney bawikî, wek niwênerî xapênraw û perepêderî îdeolojîy zala, helwêst denwênê û be mebestî parastinî xoy û dayik û xuşkî, heşey tevlibûnî bizûtnewey dijedewlet dekat; “ji wê roja ku ji bavê min re gotbû, “ez ê dev ji her tiştî berdim û herim bighîjim wan” û pê ve, bavê min bûbû yekî dîn” (20).

Le nêw bazney îdeolojî da, “ewîdî berdewam daway karî ziyatir le [sûje] dekat û emîş deykat, her wek çon nasnamey sûje be zorî le layen xudî îdeolojîkewe berêwe deçê, her be heman şêweş xudî îdeolojîk bo xoy koyley destî ewîdîy gewrey derekî yan nawekî ye” (Sadjadi, 2016: 99). Merasîm sûjeyekî biçûk e ke herdem dexwazêt xoy bigeyenête pêgey sûjey mezin. Ew, be pêçewaney xuşkî, girîngî be nasnamey xoy nadat û hemû hewlêkî bo xoTurkandine. Nawbiraw legel ewey le hemû rûyekewe nikolî le Kurdbûnî xoy dekat, her wek bindestêk seyr dekirêt. Wek Sertac delêt, “Ez çî bi xwe, çî bi rûyê xwe, çî bi dengê xwe, çî bi devoka xwe, çî bi hevoka xwe ... bikim jî, nabim yek ji wan” (Ozmen, 2010: 120). Ke wate, “çendî ez şêweyê axaftina xwe biguherînim ... ez her ez im, dîsan cahîl û nezan im, dîsan dijmin û neyar im, dîsan terorîstekî bêeyar im di çavê wan de” (120). “Kewate, berdewam dabiran û boşayîyek heye le nêwan sûjey biçûk û sûjey gewre da, be çeşnê ke sûjey biçûk hergyz natwanêt morkî sûjey gewre le layen îdeolojîyewe le xo bigrêt” (Sadjadi, 2012: 95). Yasemîn hemîşe xuşkî le pêwendî navberî legel mamostay wêjey Turkîyekey be nawî Onder, agadar dekatewe û pêy delêt: “Tu jî demîrbaşê Onder î” (Ozmen, 2010: 11). Wate, to wek kelupelî nûsîngekey wayt û diway maweyek radeştî erkdarêkî dîket dekat. Her weha debêt û Onder piştî maweyek çêjlêwergirtin, waz le Merasîm dehênêt û bem core ye ke rastîy gutekanî wêy bo derdekewêt.

Onder û Merasîm hêmay baladestîy netewey Turk û jêrdestîy netewey Kurd û pîşanderî pêwendî navberî sûjeyekî serdestî xawenberjewendî û sûjeyekî destajoy bindestin. Em rastîye le beşdarîy Onder le penêlêkî rêkxistûy A.D.D (Komeley Ramyarîy Atatürkparêz) da be şêwey aşkira piştîast debêtewe (17). Her weha bekarhênanî paşnawî “paşa” bo Onder, amaje ye bo baladestîy nawbiraw (17). Wesfî Onder û Merasîm ,paş bejinkirdinî jî, pêwendî serdest-bindestî nêwanyan be baştirîn şêwe denwênêtewe: “Kêf kêfa wî bû gava bi hestên mêrekî biserketî kincên xwe li xwe kiribû. Ez bê lept û liv mabûm di qada şerî de, bê deng û bê his, neçar û şikestî” (18). Em rewşe, wêneyekî nêw awêney rû le cîhanî waqî'man pîşan dedat û webîrxerewey bîrewerîye talekanî mêjûy tejî le jan û doiane. Le beramber em rewşe da, serlehengî roman, wek sûjeyekî xirap le çawî deselat da, awate wedînehatûwekanî bem çeşne wêna dekat:

Belê, welatek hebû bi navê Kurdistanê û ew li mezintirîn bajarê wî welatî ji dayik bûbû, li bajarê Ameda qedîm. Amed ku sorgula Kurdistanê bû, ew helbesteke qewî, mêjûyeke xweragirtî û rabirdûyeke sergevez bû, berî ku bibe krîstal û elîf-lam-mîm ... Wî dayikek û bavek welatparêz hebû, xwenda û têgihîştî. Navê dayika wî Zarşîrînê ... Navê bavê wî jî

Mîro bû ... Du xwişk (Hevok û Revok) û du birayên wî yên jê biçûktir (Serdest û Kawa) hebûn ... Roja ku ji dayik bûbû, ferhengnûsekî navdarî Kurd li ser daxwaza bavê wî hîn ew li zayîngehê, di guhê wî yê rastê de du sed peyvên 'mê', di guhê wî yê çepê de jî du sed peyvên 'nêr' jimaribûn ji ferhenga xwe ya dewlemend. Ew hîn di bîst û çar saliya xwe de bû û bi teşwîqa bavê xwe, wî dest bi nivîsandina kurteçîrokan kiribû, bêguman bi zimanê xwe yî resen ... (Ozmen, 2010: 111-112)

Em dêiane beşêk le cîhanî xewnekanî Sertacman bo wêna deken, ke le ber şilejawîy derûnîy bo duktur Sarînî degêîetewe. Nehametîyekanî jîyan û gîran û eşkence û ciyabûnewey le Merasîm û tenyayî û her weha hestiyarîy le meî ziman û mafe xurawekanî tirî gelekey, nawbirawî tûşî şîzofêrniya kirdûwe û êsta le bin çawdêrîda ye. Sertac ke le welamî pirsyarekanî duktur Sarîn da, beserhatekanî jîyanî xoy bo degêîetewe, rastî û xeyalî lê têk deçêt û jîyan û çîrok û xewnekanî têke dekat. Ew ke mindalî dûwem û kuî biçûkî Zekîye û Fethî posteçîye û lege birayekî aweznatewawî mezintir û xuşkekî çikoley be hejarî le geîekî jêrî Hezex da dejîn, le dinyay xewnekanî da le Kurdistanêkî azad û xwedî maf û ziman û le nêw malbatêkî têgeyştûy nîştimanperwer da mezin bûwe û êsta nek çil salan, belkû bîst û çîwar salyetî û be handanî bawikî, be nûsînî çîrok be zimanî Kurdî mijûle. Sertac le dinyay waqî'îş da, be pêçewaney zorîney zorî hawzimanekanî, ewîndarî zimanî Kurdî û awatexwazî geşesendinî nûsîn bem zimane ye. Em hogirî û hîwayey le zor şiwênî romaneke da rengî dawetewe; bo nimûne le geştekey da bo almanya, ke wek nûserêkî serkewtûy Kurd bangihêşt û xelat dekirêt, romanekey Erebe Şemo le xoy ciya nakatewe û tenanet le tarîkîy baî nizîk hotêl û katî xwardinewe da le pêş çawyewe ye (Ozmen, 2010: 146; 149; 154; 158). Yekêk le hokarekanî têkçûnî derûnî û tûşbûnî be şîzofêrniya, wedînehatin em awatane ye û be pêçewanewe serkutkiranyan e; boye, le xeyalî da dîsan serheldedenewe.

Pardeqî serewe, xem û dilsozîy serlehengî bo zimanî dayikî zor be rûnî pîşan dawê. Ew ke le xewnekanî da bo barûdoxêk awejûy jîyanî waqî' degeîet, xoy wek endamî xêzanêkî azadî nîştimanêkî serbest û dûr le dezgagelî serkut û îdeolojîk û her weha tundûtîjîy fizîkî û hestpêkiraw û nermajoyane û hestpênêkiraw, wîna dekat. Be gwêrey em xewne, sûjey gwêlemistî îdeolojîy zimanî bûnî nîye. Malbatêkî jîr û xwêndewar û têgeyiştûn û bawikî duktoray felsefey heyê. Nawî herhemûyan Kurdî ye û zimanî Kurdî boyan girîng e; be çeşnê ke tenanet le cêy bang, be her gwêçkeyek da dûsed peyvî nêr û mêy Kurdîyan le ferhengî dewlemendî zimanî Kurdî da be gwêy Ferhengî zarokyan da dawê. Perwerandinî em xeyalane le

mêşkî Sertac da, ke kelkeley zimanî dayikî û dewlemendkirdinî kitêbxaney Kurdîy heye, nîşaney hîwabiawîyetî le rûy rastî jiyan. Waqî'êk ke têy da Kurdî axaftin, le riwangey neyarane wek tawan û le çawî yaranewe wek diwakewtûyî seyr dekirêt. Waqî'êk ke têy da Kurdan şêlgîranetir û çalaktir le kargêian û beîweberanî dezgay serkut û îdeolojîkî dewlet, pêşbîrkêy biîrînî zimanî xoyan beîwe debên. Waqî'êk ke têy da amancî Sertac û hawîeyanî şoişgêî, rizgarkirdinî bajarî Amed û hemû “bajarên Taristan” (131) û biyarî wî “venegeran heta azadiya welat” (100) bû; keçî nek her serkewtinî be diwawe nebû, bêhîwayî le şoiş û dijayetîy lê kewtewe; ta ew cêgayey nek her gel, tenanet pişîlekanîş riqyan le peyvî ‘şoiş’ê (Ozmen, 2010: 132).

Serlehengî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, le serdemî zarokêti û le bin bandorî dezgayên îdeolojîk, be taybet qutabxane da, wek zorbey zorî mindalan, pêvajoy besûjebûnî berew tekamulû tewawbûn deçû. Le cejin û rêûiesm û rêpêwane dewletîyekan da beşdarî kirdibû, aay helgiritbû, û “mîna leşkerekî rep û tep meşiyabû, wî jî bi qîrîn gotibû: Ne mutlu Türküm diyene! (Xwezî bi bextewariya wî/wê yê/a ku dibêje ez Tirk im!) Û çima ew ne ‘mutlu’ (bextewar) bû bo Xwedê!?” (60). Ew le xoy û derdor û heqîqetî şar û wilatekey bêaga bû; “welatê ku bi tenê di çend kitêbên kevnare û yasax de û bi şeweya helbestê hatbû gotin ku, Kurdistan e” (54). Belam Mihemedî xaloy, ke şoişgêîkî tevgerêkî Kurdîy çepgere, debête berbestêk le beramber îdeolojîy zal da û şiwên le ser zeynî dadenît (54). Le bin bandorî ew da û diwaye xwêndinewe pirtûk û aşinabûnî legel bîrî dijber da û her weha dîtinî doxî gel û hêlûkewtî deselat, guman le waqî'î niwêndiraw û cîhanî pênişandiraw dekat û têdekoşet xoy lew kotûbende rizgar bikat. Akamî em têkoşane, têgeyîştinyetî le ew waqî'ey deselat be hoy damûdezga serkut û îdeolojîkekanewe be ser sêjekanî da daysepandûwe. Aweha ye ke legel gewretirbûnî, le ra û rawêjî bawik û dayik û her weha le îdey mamostakanî le meî Turkêti û bextewerî diidong debêt: “Ew dem û dewranên xwezîpêanînan [xwezî be bextewerîy Turk bûn] dabihurîbûn çûbûn” (61). Le akamî em hestiyarî û lêwirdbûnewe û serbizêwîye da û le ber ewey wek sêjekanî tir milkeç nabêt, wek sêjeyekî lader dête nasîn û le layen dezgay serkutî dewletewe hewî serkutrîdînî dedirêt.

Sertac, hawkat legel milnedanî be îdeolojîy zal û gwênedanî be lêpêçînewey dezga îdeolojîkekan, wek sêjeyekî serbizêwî tak û tenyay nêw gelêk sêjey milkeç û çalakî derdorî, dekewête ber guşar û tane û teşer û hêriş û heîşey sêjegelî demargirjî dezgagelî îdeolojîkî berjewenîdparêzî deselat, be taybet mabat û mizgewt û xwêndinge. Nimûney here berçawî sêjey

destajoy malbat, mam û mamojnê Sertacin. Ewan hemîşe û tenanet diway kujranê xaloy, ke xoşewîsttîrîn kesyetî, dem le xirapewitin û galtepêkirdinê danaxen û be serhişk, bêeqil, xapênraw û xeyalperistî dezanin (57, 82). Sertac ke em bêêzîyaney bo tehemul nakirêt, le beramberyan helwêst deêrêt û legelîyan be şerê dêt; boye, ewan “dest bi propagandayeke qirêj kiribûn li dijî wî, heta bi wê ku çûbûn emniyetê û îxbara wî kiribûn” (83). Kartêkerîyê dûwaney serkut û îdeolojî le ser nîzîktîrîn endamanê binemalekeşê be corêk e ke dayikî, sereîay kujranê birakey, be tenya zimanê ke deyzanê, pêdagirî le ser Turkbûnê xoy dekat û deyewêt mindalekeşê lem rawêj û dahatûbînîye bêbeş nekat. Bawikîşî, wek sûjeyekî destemokirawî dîke û kargêî îdeolojî le dezgay xêzan da, le gewretîrîn jûrî malekeyan da wêneyêkî gewrey Ataturkî helwasîwe (38).

Palewanî serekîy roman, xulyay şewekarî û nîgarkêşan e; keçî le ber naçarî destberdarî debêt û le xwêndingey zanyariye ayînîyekanî “Îmam Xetîb da” debê be mamosta. Nawbiraw be bawikî delêt: “Tu bi destê xwe kurê xwe rê dikî nav mîlîtanên çavsor! Ez û dîn, ez û Îmam xetîb!?” (35). Ew sereîay em helûmercey têy kewtûwe, hewil dedat nekewête jêr bandorî lêpêçînewekanî dezgay girêdirawî ayîn; niwêj naxwênêt û rojû nagirêt û be giştî xoy le kirde û piraktîsên ayînî be dûr deêrêt û hendêk car le jûrî mamostayan da xoy wek musulmanekî sosyalîst denasênêt (27, 34). Nawbiraw wekû sûjeyekî xolader le îdeolojîyê zal, be famkirdinê hemahengîyê û hawarasteyî dewlet û mizgewt, le komelegyekî nîxroy ayîn û lîpawlîpî sûjey bawemend û îmantewer da, hewil xoderbazkirdin dedat û em milmilanêyey be dirêjayî romaneke berdwame. Carna tirs, guman û îmanî cêgîrkirawî dezgay malbat û qutabxane le naxî da ser heldedat û pelkêşî lay Qur’ane diyariyekey Elî Osmanî xwendkarî dekat (68, 89, 137) û nîzîk e burkanî îman le mêşkî da serîj bikat; belam kelkeley zimanî Kurdî daydeçekênêt; hercarew çaw le kitêbxanekey dekat û dibêjêt “hîna jî kêmin” û bîr le çîroke nîweçil û diwaiojnadiyarekey xoy dekatewe ke hêştay neytiwanîwe tewawî bikat (75). Milkeçnekirdinê Sertac bo em dezgaye û girîngîdanî be pîrsî netewe û ziman û her weha berxodanî le hember îdeolojîyê zal û sûje destajokanî da, berewîuyê şîrî tîj û dû faqî serkut û îdeolojîyê olîy dekatewe. Vegêî beşî kotayî romaneke, sebarek be xoy aweha delêt:

Ez Elî Osman, ... Ez dizanim ku ez yekî bêpîşt im, yekî bêxwedî, û bêxwedan im, eynî wek bavê xwe, bêziman, neçar û tirsonek ... Ez ji mirinê, ji mirineke bi vî rengî bêqam ditirsim, her wiha ji dûpişkan jî, ji dîw û pişkê wan, ji bédengiya wan, ji pêvedana wan ên jinîşkavî, ji ruh û rihê wan, ji şiqşîqa tîzbiyên wan Dûpişkên ku di çayxaneyan de, di

mizgeftan de, di dikanan de, di malan de xwe gihandine min û bi min re bi saetan peyivîne, bi zext û zirt gef li min xwarine, bi dehan caran Qur'ana pêroz danîne ber min û bi dehan caran min ew bi mirçemirç li tehtê eniya xwe da ye wekî ez dev ji dijgotinên xwe û xeta xwe ya xeternak berdim û heke piştgiriyê nedim wan jî, dijmînahiya wan nekim, xwe bidim ser rêka heq, ji bo Xwedê û Pêxember û xasma ji bo wan bixebitim ... Banga Xwedê bigihînim wan necis û mekruhan, wan bêîmanan, wan jirêderketiyan ... Xwe ji menzîla hinekan bi dûr xim û xwe li ilmê xim ... Min ji wan re dîsan got ku, “bi sond ez ê limêjan bikim, ez ê berê xwe bidim Xwedê, bes ku hûn Sertac Xoceyî bi destê min nedin kuştin”, lê ew bi israr bûn. (Ozmen, 2010: 178-180)

Elî Osman, xwêndkarî polî diwazdey xwêndingey Îmam Xetîbe. Ew legel mamosta Sertac da nêwanî zor xoş e û tenanet hatûçoy dekat û xoşnûsiy be lawe fêr debêt. Hawkat, pêwendî legel mela Îdrîsîş da heye û serdanî kitêbfiroşîyekey dekat û kitêbî ayînîy lê destênêt. Her weha le mew'îze û rawêj û hoşdarî û heîşe û fermanekanî wî û hawîeyanî hawbîrî, bo bedesthênanî rezamendîy Xuda û geyîştin be Beheşt û xoşîyekanî, sûd werdegrêt. Lem pêwendîe da, ewey girîngîy zorî pê dedirêt û rawestey le ser dekirêt, dûrgirtinyetî le mamosta Sertac û berengarbûnewey ra û riwange û reftarekanî. Aweha ye ke Qur'anî be diyarî bo debat, yan le pol da, le ser negutinî “eleyhîssalam”, paş nawhênanî nêrdirawanî Xuda, hoşdarîy dedatê û hejmarî tûşbûn bem tawaney webîr dênêtewe. Handanî Mela Îdrîs û hawbîranî, le akam da, Elî Osman dexate ser “sîiatî musteqîm” û le dijî em mamosta “komonîst û lader û bêbawey û dijedîne” û her weha serlehengî jîyanî xoy û romaneke serheîdedat û be hevokî “ û min ew kuşt” (184), *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî deqedênêt*.

Elî Osman, ke hawkat, le bin bandor û tewijmî, be taybet, dû dezgay îdeolojîkî behêzî ayînî û fêrkarî da ye, be lêpêçînewey kargêian û bangeşekaranî îdeolojîy za, wate Mela Îdrîs û sûje destemokanî tir, le rêy nasandinî sûjey mezin û şirovey xwastekanî û be wênakirdinî Beheştî tejî le jin û xoşî, pêvajoy berhemhênanî wek sûjeyekî gwêlemistî be serkewtûyî beîewe çû. Nawbiraw, pêş milkeşkirdin bo em dezgaye, wek xoy delêt: “Min nimêj nedikirin, rojî nedigirtin, ez nediçûm çî mizgeft û terîqet û civînan, min bi pend û şîretên mamosteyên xwe jî nedikirin ...” (182). Mamostakanî tirîşî, riwangeyan wa bû em jî le bin bandorî “Sertac xoceyê komonîst” da, hoş û awezî wek ew têkçûwe (184). Ewan ke zorîneyan Turk in, wek niwênerî netewey baladest, le katî gengeşey pirsî Kurd letek Sertac da, be pêy ew îdeolojîyey pêy rahatûn, Kurdan be tawanbarî rewşeke dezanin (45). Heîwêstî em sûjegele, ke lewane ye zoryan, le

riwalet da, çi pêwendîekyan be dewletewe nîye, hemahengîy aşkiray dezgakan legel pergali dewlet da derdexat. Bem pêye, lêpêçînewekanî kargêianî îdeolojîy zal, le her dû dezgay hawamancî ayînî û fêrkari, sûjey Elî Osman wek amêrî serkut bekar dehênên û le rêgayewe, sûjeyekî serbizewî destemonekiraw le naw debirêt, be bê ewey şiwênponcey dewlet bem karewe diyar bêt.

Bikujî Sertac, paş ewey erke pêsipêrdirawekey cêbecê dekat, le kirdekey peşîman debêtewe. Le dêiekanî serewe da, beşêk le monologekanî ew dexwênînewe ke delêt minîş rêk wek bawikî xom bêzîman, neçar û tirsênokim. Amajey Elî Osman bo “bêzîmanî”, wêiy dan nan be paşgezînewe le bawêie ayînîyekani û tirsî le handeranî rîşdar û tezbêh bedestane ke wek dûpişk wehan û le mal û mizgewt û çayxane û dûkanan da xoyan geyandê û tûy îdeolojîy xoyan le mêşki da çand, bo riwangekanî Sertac û bandorî le ser zeynî ew degeîetewe. Lêre da sûjey gwêlemistî berhemhênrawî ayîn û dezga îdeolojîkekanî tir, hawkat legel mamostakey, wek sûjeyekî dije îdeolojîy zal, rastîy riwangekanî ew û dardestbûnî xoy bo derdekewêt; boye, be awîidanewe le nêrînekanî ew sebare be zîman, netewe, barûdoxî jîyanî xelk, ayîn û htd. dawî îdeolojîy zal depîçîet û cext le ser rewabûnî îdeolojîy perawêzxirawî mamostakey dekatewe. Ke wa bû, sereiy serkewtinî îdeolojîy behêz û piîsûjey çînî deselatdar be ser sûjeyekî tenyay lawaz da, roçney berxodan her awela ye û tarîkistanî îdeolojî pirşîngî rûnakîy lê nabîêt.

## **2.5. Encamî Xwêndînewey *Pêşbaziya Çîrokên Neqedîyayî***

Romanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqedîyayî*, rengdanewey beşêk le pîrse pêwendîdarekanî rewşî zîmanî Kurdî ye le Bakûrî Kurdistan da. Wek aşkira ye, lem parçeye da, ziyatir le sed saî e zîmanî Kurdî perawêz xirawe û tenanet zor carîş pêvajoy zimankujîy le ser pêew kirawe. Le zor şiwênî romaneke da amaje bo hêlûkewtî tundûtîjaney dezgay serkutî dewlet kirawe ke be şêwey rastewxo û narastewxo pereyan bew rewte dawê. Belam, her weha ke Althusser cextî le ser dekatewe, tundûtîjîy aşkira tenya bo maweyekî kurt amancekan depêkêt û berdewamîy rewşî amade û berhemhênanewey pêwendî çewsêneraney nêwan çînî serdest û bindestî komege, pêwîstîy be hêzêkî hestpênêkiraw bo kontrol û laiêniwênîy çewsawe zîmanîyekane, ke ewîş îdeolojî ye. Lem romane da, dewlet le rêy dezga îdeolojîkekanînewe pêvajoy lêpêçînewe be serkewtûyî beîewe debat û sûjey destajoy weha berhem dehênêt, ke beleztir û demargirjîtir le kargêianî îdeolojîy zal, siyasetî paktawkirdin û zimankujîy pere pê deden û cêgîrî deken û le akam da serî dexten.

Le beramber sêje dilxwaz û destajokan da, sêjegelêk debînîn ke milkeçî îdeolojîy çînî baladest nabin, dawî dezga îdeolojîkekan depîçînin û gwê be lêpêçînewekan naden; boye, dewlet morkî sêjey gêreşewênyan le nêwçawan dedat û le rêy dezgay serkutewe û her weha be yarmetîy dezgagelî îdeolojîkî be riwalet nagirêdirawî dewletewe, dengiyan kip dekat. Serlehengî roman, wek sêjeyekî serbizêw, hewî parastin û pêşxistinî zimanî xoy dedat; belam be hoy eşkencey dezga serkut û îdeolojîkekanî ser be malbat, ayîn û fêrkariyewe tûşî şîzofêrniya debêt û le kotayî da be destî sêjeyekî xapênrawî gwêlemistî dezgay ayîniyewe dête kuştin. Beserhatî diltezênî Sertac, ew riwangeyey Althusserman bîr dexatewe ke le milmilanêy nêwan sêje û îdeolojîy zal da, ewey herdem serdekewêt, îdeolojî ye û çînî xawen îdeolojîy zal.



## BEŞÎ SÊYEM

### XWÊNDINEWEY GABOR LE RIWANGEY BOÇÛNÎ REXNEYÎ MARXISMÎ PÊKHATEXWAZANEWE

#### 3.1. Pêşekî

Nûserî deqî dûwemî lêkoînewey berdest, Seyid Qadir Hîdayetî romannûsî serkewtûy Rojhelatî Kurdistan e, ke le salî 1976 le Bokan çawî be jiyan heîênawe û niha her lewê deqî Nawbiraw be berheme behêzekanî tiwanîwyetî serincî rexnegiran bo lay xoy rabikêşê. Haşim Ehmedzade (2018a: 169) pêy wa ye “nûserî *Gabo* ke pêştir be novêlêti *Dengî Nuxtewe* pêy nabûwe naw dunyay gêfanewey Kurdîyewe, be bi lawkirdinewey dû romanî *Toqî Ezazîl* û *Gabo*, bo hemîşe nawî xoy birde nêw nawe diyarekanî romanî Kurdîyewe”. Her lem pêwendîe da, le zimanî Bakhtiar Sadjadiyewe dexwênînewe ke, “taybetmendîyekanî romanî berdest eweman pê delê ke nûserekey lem çend saley rabirdû da, be başî xoy perwerde kirdûwe û berhemî edebîy tokmey ziyatirîşî xwêndotewe” (2018a: 14).

Romanî *Gabo* wek diwa berhemî nawbiraw, çapî yekemî le salî 2015 da bi lawbûwetewe. *Gabo* beserhatî serheîdanî dû tazelaw be nawekanî Kerîm û Ebdulmutelîb e le dijî ew rewşey deselat le kotayî heştakanî zayînî da be ser gelî Kurd û zimanî Kurdî le Rojhelatî Kurdistan da sepandibûy. Ehmedzade le barey em romanewe denûsê: “*Gabo* be zimane paraw û karaktêre xoş daîjrawekanîyewe, be zimane sîmbolî û hêma alîgorîyekanîyewe, be dialogue resen û serkewtûwekanîyewe, be dahênan û niwêkarîyekanî gêianewekeyewe, bîrgeyek le bîr û hizir û kesayetîy komelgey Kurdî le diwa saîekanî sedey bîstem û seretakanî sedey bîst û yekem da bo hemîşe be zîndûy dehêlêtewe” (2018a: 169-170).

Romanî berbas, le 10 beş pêk hatûwe û helgirî dû gêianewey lêkdiraw e ke be şîwey hawterîb berew pêşewe debirê. Le gêianewey serekî da, şarî Bokanî Rojhelatî Kurdistan û rewşî civakî Kurdîy em nawçeye le kotayî heştakan da, dexirête ber çaw û le ewî dîkeş da, wesfî kuştarga û Seyide Sûrey sellax û serbiîrî herîojey ga û mangakan degêdirêtewe. Em dû vegêiane, le rastî da, yek beserhat degêinewe, ewîş beserhatî bindestane. Gêianewey yekem, bîrewerî û beserhatekanî dû mêrminda be nawî Ebdulmutelîb û Kerîm, le xewnî hebûnî topêkî teqelî û pêkhênanî tîm, wesfî zulim û zorî pazga û toqandinî xelk û berengarbûnewey eman be

pêy dinyay mindalaneyan û guman le naw û nasname û hewlî goînî, heta hoşyarîy le meî zimanî dayikî be dozînewey deqêkî Kurdî û hewlî kiînnî kitêbî Kurdî û xoiahênan û rûdawekanî xwêndinge û htd. deqrêtewe.

Serlehengên romanî *Gaboî*, Ebdulmutelîb û Kerîm, wek dû takî netewey jêrdest û bêbeş le maf, be taybet mafî zimanî, diway dagîrkirdinewey şar be destî hêzekanî dewlet û mîlîtarîzekirdinî nawçe Kurdîyekan, heîşe û guîşe û guşarî deselat debînin û ezmûnî deken. Ewan nehameîyekanî gel û cûlanewey dewlet, nek her le layen pazgay geiekeyanewe, bekû le qutabxaneş da ezmûn deken û be pêy goşenîga û dinyay mindalaneyan hewlî bergirî û rûbeûbûnewe deden. Dîtnewey deqî nûsraw be zimanî Kurdî û diwaye hewlîdan bo fêrbûnî zimanî Kurdî û pare kokirdinewe bo kiînnî pirtûkî Kurdî, beşêkî berçawî romaneke pêk dehênêt. Gêianewe lawekîyekeş, le goşenîgay Kerîmewe, ke bawikî qesabe û naçar e le bînnî ew dîmene toqênerane da, birîtiye le wesfî kuştarga û beserhatî serbiînnî ga û manga û gwêlik û xwên û çeqo û boie û çawewanîy merg û çeq û lûrî sege berelakan. Her dû gêianeweke, le kotayî da, be serheldan û xoderbazkirdin le nîrî yexsîrîy û çewsandinewey dewlet û Mîrza Hadî (bo Ebdulmutelîb) û Seyide Sûrî sellax (bo gakan) kotayî dêt.

*Gaboî* le rûy şêwazî gêianewe û dewr û girîngêtiy kesayetîyekanewe taybetmendîy xoy heye û be şêweyekî niwê û dahênerane daiêjrawe. Yekêk le taybetmendîyekanî ewe ye romanî berbas dû serlehengî heye, ke Ebdulmutelîb û Kerîm in û her dûkyan le pêşvebirdinî gêianewekan da dewrî serekî degêin û xawen qursayî xoyanin. Gêianewey serekî be şêwey dûqolî beîewe debirêt û le ewî dîkeyan da, kuştarga û kuştinî ga le kamêray çawî Kerîmewe wesf dekirêt. Taybetmendîyekî tirî ewe ye *Gaboî* vegêiekî taybetî nîye û hemû kesayetîye serekî ûtenanet lawekîyekan, legel derkewtîyan, debine vegêî û le goşenîgay xoyanewe beserhatekan degêinewe. Her le seretawe legel dû vegêî da berewîû debîn ke yekyan Ebdulmutelîbe û xerîke bîrewerîyekanî legel Kerîm degêîetewe. Hawkat Kerîmî hawîey, le goşenîgay sêyem kesewe basî ew rûdaw û bîrewerîye hawbeşane dekat. Le katî dialogekanîş da kesayetîyekanî roman hemûyan le yek goşenîgawe qise deken û wek ewe wa ye yek kes biaxfêt. Lem katane da her dû layenî axaftin wek kesî yekem yan jî sêyem derdekewin û qisekanyan derdebîin; bo nimûne, “kutim rojê çendit dedenê?”, “kutim pêş timen.”. Be watayekî tir, kesayetîyekan, legel derkewtîyan, cilewî gêianeweke be destewe deqrin û bo xoyan û le riwangey xoyanewe basî rûdawekan deken û her yekew diyalog yan monologî xoy beîewe debat.

Lem beşe da, paş em pêşekîye û nasandinî giştîy *Gaboî*, deperjêyne ser xwêndinewey em romane be gwêrey çemke rexneyîyekanî Louis Althusser. Bo em mebeste, ew pardeqaney helgirî watay îdeolojî, dezgayên serkut û îdeolojîkî dewlet û sûje n, ciya dekirênewe û diway rûnkirdineweyan le pêwendî legel rûdawekanî nêw romaneke, be pêy têgehên baskiraw le sê binbeş da şirove dekirên. Le kotayî em beşes da, encamî twêjîneweke dexirête ber çaw. Şiyawî bas e lem romane da ziyatir awîr le ew amajane dedeynewe ke pêwendîyan be pirsî ziman û helwêstî kesayetîyekan lem barewe heye û hendê carîş awîr le rehendekanî tirî pêwendî nêwan netewey serdest û bîndest dedeynewe.

### **3.2. Rengdanewe û Banderî Îdeolojî**

Îdeolojî pêkhênerî bîr û boçûn û riwangey takekanî komele ye le meî jîyan û pêwendîyekanî nêwan çînekanî mirov. “pênasey Althusser le îdeolojî, pênaseyekî naîdeolojîk e; çunke eger îdeolojî pêştir be watay hoşyarîy çewaşe bûwe û niha be manay bîr û bîrwa ye; keçî le ser destî ew watakey degoîdirê” (Sadjadi, 2012: 86). Ême be hoy îdeolojîy zal û her weha wirde îdeolojîyekanî tirî amadey nêw jîngeman, xoman û derdor û dewrûberanman denasîn û bûn û barûdox û dinyay xoman pênase û rave dekeyn. Be watayekî tir, mirovekan em diyardegele be çeşnêk fam deken ke îdeolojî boyan diyarî kirdibêt û têgeyiştinî beder lew çîwarçêweye, bûnî nîye. Le rastî da jêderî hizrî endamanî civak, ew îdeolojîyane ye ke be şêwey corawcor be ser zeynyan da zal bûwe û cîlbecîl berhemî dehêninewe. Ke wa bû, mirov xawen bîr û biyarî xoy nîye û tenya amrazêk e bo parastin û gwastinewey bîrokekan.

Komelanî xelk, ser be her çîn twêjêk bin, têfîkrîn û cûlaneweyan le bin kontrolî îdeolojî da ye û bew arasteye da deçin ke boyan destnîşan kirawe û pêyan wa ye xoyan helyanbijardûwe. Em kontrolkirdine le rêgey îdey corawcor û ciyawazewe dête kirdin; belam berfirehtirîn û karîgertirînyan îdeolojîy zal e, ke diwa amancî parastinî berjewendîy kemîneyekî xawen sermaye û hêz û deselate, be sûdwergirtin le wize û tiwanistî zorîney xelkî bêbeş le maf. Le beramber em îdeolojîye behêze da, bîndestan îdeolojîy xoyan heye, ke be berawird legel ewey çînî serdest da lawaze, belam debête keristey berxodanî ew takaney ser bo deselat dananewênin. Le *Gaboî* da, bilawbûnewey îdeolojîy zal le rêy toqandin û serkutewe le nêw malbatêkî Kurd da bem core pîşan dirawe:

Danewîyewe lapeiekey helgirtewe. Lapeieke çirç û loç bibû, cwan diyarbû şormezey tê da xurawe. Belam kelîmekanî her dexwêndiranewe. Kutim ewe çîn, ew kelîme seyrane?... Be zimanî Farsî nebû. Ew deytiwanî bîxwênêtewe. Kutim pa...le...wan...fis...fis?? aaaa?!! palewan fis fis çîye? ew kabiraye palewan fis fise! Heftî xo dezanîm bîxwênimewe ... Pêy seyr bû. Hestêkî seyrî beramber bew kelîmane hebû. ... Ewe yekem car bû be çaw zimanî xom dedî. Ew ta ewdem tenya be gwê zimanî xoy bîstibû. Be helatin royiştewe jûrê. Le xoşîyan zimanî nedehe go. Kutim daye, were şitêkî seyr! ... Dayikî gurêk zimanî xoy gest. ... Lapeiekey lê wergirt û le berçawî xoy diîandî. Kutim lay kes deng nekey! zimant negeîê ha! bedbext debîn! Kutim bawikit bizanê xerîkî şitî way, zimanî her dûkman le bin da derdênê. (Hidayetî, 2017: 95-97)

Ebdulmutelîb xwêndkarî polî dûy nawendî ye. Ew û Kerîmî hawîê û hawpolî, xulyay topî teqelî û topên û pêkewenanî tîm in, belam hewî çend careyan çî encamêkî nabêt. Ebdulmutelîb carêkyan, beîekewt, parçe kaxezêk dedozêtewe ke beşêk e le çîrokêkî mindalane be nawî “Palewan Fisfis”. Em deqey bo namo ye; be pitepit û pît be pît deyxwênêtewe û wirde wirde çend wişeyek sax dekatewe û boy rûn debêtewe ke eme be zîmanekey xoy, wate Kurdî nûsrawe. Zorî pê seyr debêt û lewey ke detwanêt Kurdî bixwênêtewe, şageşke debêt, berew malewe heldêt û bo dayikî dexwênêtewe. Belam dayikî tirs dayegrêt, lêy werdegrêt û deydiîenêt û hoşdarîy dedatê be lay kesewe neydirkênêt, be taybet lay bawikî.

Em dêiane selmênerî zalêtîy îdeolojîy zimanîy nivîskîy dewlet e le komeley Kurdî da dewlet, wêiay sepandinî zorekîy zimanî Farsî û rêgirîkirdin le zîmanekanî tir, be bilawkirdinewey îdeolojîy xoy, hewî berhemhênanewey ew helûmerce dedat. Helûmercêk ke dewlet be serkut tundûtîjîyewe destî pê dekat, belam perepêdan û cêgîrkirdinî, be hoy îdeolojîyewe beîewe debat. Îdeolojî, be şeweyek kar le takekan dekat û rayandehênêt ke îdî bo xoyan û be bê destêwerdanî hestpêkirawî dewlet erkekanyan têpeîenin. Ebdulmutelîb, ta katî dozînewey deqe Kurdîyeke, tenya zimanî Farsî dîwe; le ser teztey pol û le kitêbekanî xwêndinge, le nûsrawey ser dûkanekanî bazaî, le tablokanî ser şeqam, le têtêvîzyon; ke wa bû le zimanî xoy namo ye û îdeolojî le rêgey corawcorewe zeynî ew mindaleyan weha lê kirdûwe wabzanêt zîmanekey tenya bo qisekirdin û pêwendîe asayîyekanî jiyanyetî û be kelî nûsîn nayêt.

Mîrza Hadî, ke le gutar û wirde îdeolojîyekanî derdorî bêzar e û xoy be sîjeyekî azad û biîyarder dezanêt, delêt: “Le tewawî umrim da pê mîs bûwe nanî şêx û mela yan çûzanîm nanî

begêk yan hîzbêk bixom. Qetim ser bo hîç kesêk xwar nekirdotewe” (Hidayetî, 2017: 171); yan “deykut xo min ker û meî û bizin nîm we şîwên xelkî bikewim. Ne melayetî, ne şêxayetî, ne begayetî, ne hîzbayetî hîçim qibûl nîye” (169). Keçî, le rastî da, ew bê ewey agay lê bêt, le nêw îdeolojî da û be pêy bîroke baw û zalekan bîr dekatewe û decûlêtewe. Wek Sadjadi delêt, “le pêkhatey nasnamey sêje da eme ewîdî ye ke pişkî şêrî berkewtûwe. ... Gutare îdeolojîkekanî ewîdîye ciyacyakan beşî gewrey ew aqare pêk dehênin ke be nasnamey sêje nawbirde dekirê (Sadjadi, 2016: 97).

Em sêjeye be mebestî sêkkirdinî kesayetîye Kurdekan, bê mal û haî û derbederî û bîrsîyetî û hejarîyan be lay kuiekeyewe zeq dekatewe û tawanekeşî dexate estoy xoyan; încayenekey tirî jîyanyan, ke xobextkirdine le pênew ziman û edeb û nasname da, bînpê dekat. Em helwêstey le şîwênêkî tirî romaneke da we der kewtûwe; ew katey be tiwanc û teşerewe be kuiekey delêt: “Kitêbûkey Mela Rehmanî Hejarim bo dexwênîyewe?! Babayek ke her rojî le bineberdêk be naneqey şîwanewêle beî deçê û her şewî le qujbînedîwarêk xoy deşarêtewe. Êstaş hîç dewletêk wexoy nagirê ... Kes nazanê axirî ewîş wek kuî Şêxelîslam le kwê demrê û çî be ser dê” (Hidayetî, 2017: 172). Le têwanînî nawendtewer û milhûixwazî ew da, dewlet, her çonêk bêt û herçî bikat, xawen meşrû'yet e û takekanîş meşrû'iyetyan tenya lew pergale xawen hêz û xwedan nane werdegrin. Be witey Weber (2005: 94), dewlet “le cugrafyayekî diyarîkiraw da, mafî reha û reway bekarhênanî tundûtîjî” le bin dest da ye. Wek debînîn, le subjêktîvîtey Mîrza Hadî da, bîndestan û bîdewletan mafî hebûnî nasnamey ciyawazyan nîye û bûnyan be bûnî dewlet û deselatî baladestewe girê dirawe.

Dayikî Mutelîb jî, wek cêbecêkarêkî îdeolojîy zal, le berjewendîy çînî baladest da hewî serkutkirdinî hoşyarîy kuiekey dedat. Ew be diandînî parçe kaxezeke û heîşey nedirkandinî em rûdawe, hestî dîlozîy xoy û parastinî taqe kuiekey le kêşe û girift dedat; keçî le rastî da bîyarder û xawen wîst nîye û ewey deykut, îdeolojî le zeynî da çandûye û kontrolî le destî xoy da nîye. Lêre da ewey xuya ye, tîrsî nawbirawe le derencamî ew kare û kardanewey tundûtîjaney dezgay serkut, ke, wek pêştirîş amajeman bo kirdûwe, îdeolojî hemîşe be nerm û niyanî û be şewey şardirawe sêjekanî naxate telewe; belkû le tundûtîjîyş kelk debînêt. Ewey lêre da weha le Esmer dekat helwêstî dije deqî Kurdî binwênêt, beşêkî bo tîrs û toqînî le deselat degeîtewe; belam, sereîay em rastîye, piropaganday betewijmî dewrûberîşî wehayan lê kirdûwe hemû nûsraweyek be zimanî Kurdî be bive bizanêt û wek agirêk lêy bînoîet û nehêlêt mindalekey destî bo berêt.

Tirsêkî dîkey dayikî Mutelîb le şûwekeyetî, ke bêtu bizanêt kuiekey hezî le nûsrawey be zimanî dayikî ye, zimanî her dûkyan debîêt; wate, zimanî axaftinîşyan lê destênêtewe. Lem romane da, le beramber siyasetî perawêzxistinî zimane nafermîyekan le layen netewey serdestewe, bergirîy netewey bindestîş debînîn, ke nimûneyekyan le dêiekanî jêrewe da derkewtûwe.

Kutî kiîîn û xwêndinewey ew dû kitêbe [*Tarîk û Rûn û Milwankey Şîn*], le jiyaniê ême da seretayekî niwê û taze bû. Kutî be xwêndinewey ew kitêbane xwênêkî dîke le demarekaniyan geia û binaxey şitêk be nêwî nîştimanperwerî le dil û mêşkiyan da damezra. Kutî rojbeîoj ziyatir ew heste degeşawe û be xwêndinewey şêrekanî Hêmin hestî derûniyan coşûxiroşêkî taybetî girtibû. Ewcar rûntir û wîrdtir deyanzanî debê çî biken û be diway çîyewe bin. (Hidayetî, 2019: 127-128)

Kerîm û Ebdulmutelîb, ke dezanin qebarey rûpelî çîrokekey “Pawewan Fisfis”, gewretir le hî kitêbe û le peiey govar deçêt, berew lay *Sirwe* rêniwênî dekirên û le encamî geianyan da bo dozînewey serçawey çîrokî berbas, rêyan dekewête lay pirtûkfiroşêkî ser şeqam be nawî kak Suleyman. Ewan sereta hewî lebernûsînewe û diwaye diîandin û dizîni deden; belam sernakewin û serşoî lay ew kabiraye debin. Mutelîb û Kerîm, bo qerebûkirdinewey tawanekeyan û selmandinî destpakîyan û her weha kiîînî ew kitêbe Kurdîyaney kak suleyman pêy dedan û wirde wirde parekey lêy destandin,, dekewine xoyan bo kokirdinewey pare. Bo em mebeste, wêîay xercnekirdinî ew biie pare kemey malewe, dest deken be firoştinî nihênîy û metirsîdarî tîrî sîmîy tîrûkewan le nêw xwêndkaranî qutabxanekeyan da; lege eweş, be hawînan belalfiroşî deken. Bem çeşne çend kitêbî Kurdî, wek *Tarîk û Rûnî* mamosta Hêmin û *Milwankey Şînî* mamosta Şerîf dekiîîn û be xwêndineweyan ta dêt ziyatir ewînî zimanî Kurdî le dil û derûnyan da teşene dekat.

Îdeolojîy zai be giştî û lêre da îdeolojîy zimanî be taybetî, xawen berbilawtirîn rûberî çalakî û zortirîn derfetî besûjekirdin e. Nîşane rakêşer û xapênerekanî le hemû şiwênêk, le şeqam û kûçe û bazai û lew dîwî dergay malekan da heye û hênd behêze, xudî bindestanî zimanbîawîş, dan be rastî û berzî û berheqbûnî da denên û bawik û dezga îdeolojîkekan û lewane xanewade wek layenêkî berpirsî berhemhênanewey helûmercî cêgîrkiraw, le bereyekewe bo bereyekî tir deygwazînewe. Kerîm û Ebdulmutelîb, wek hemû mindalanî Kurd, le xwêndin be zimanî xoyan bêberîn û tenanet be bîrîşyan da naye ke zimanekeyan, wekû zimanî xwêndinyan le xwêndinge, be kelî nûsîn û fêrkarî û şîr û çîrok dêt. Belam, xwêndinewey ew parçe kaxeze, bew corey le

serewe hatûwe, wek geianî xwênêkî taze ye le demarekanyan da. Wek tîşkêk e diî be şewezengî îdeolojîy zafî zimanî dabêt û sîtavêk e berew cîhanêkî aşna, belam benamokiraw.

Îdeolojîy zafî taqe îdeolojîy nêw komele nîye û îdeolojîy dijber jî heye; herçend hêz û deselatyan lew aste da nîye cê be îdeolojîy zafî çol biken. Palewananî serekîy romanî *Gaboî*, le rêgey kute kaxezêkî Kurdîyewe, roçneyekyan bo dekirêtewe û berewîuy rastîyek debînewe, ke ta ew kate, deselat be bekarhênanî her dû hêzî serkut û îdeolojî şardibûyewe. Kitêbfiroşîyekanî şar degeîen, belam yekêkyan nebêt, hîçyan kitêbî Kurdîy nîye û eweş heye dû kitêbî ayînî ye (Hîdayetî, 2017: 100). Belam, Suleymanî destfiroş debête pirdî pêwendî nêwan dijberanî deselat û perepêderanî îdeolojîy bindestan le layekewe û Kerîm û Ebdulmutelîbî dewrediraw be îdeolojîy zafî le layekî tirewe. Aweha ye ke dû tazelawî çawbestkiraw be zimanî Farsî, wek zimanî çînî baladest, be nasînî dakokîkaran û kesayetiyên çalakî ziman û edebî Kurdî, wek Hêmin, Hejar, Celal Melekşa, Şerîf, Awat û Peşêw, hestî nîştimanperwerî û zimanparêzî le derûnyan da serheldedat; mamosta Hêmin gutenî, “nîrî yexsîrî le esto” dadeînin û sereîay kemdestî û kemayesî û dijayetîkirdinyan, hemû pare û kat û wize û hêzî xoyan le pê naw fêrbûnî zimanêk da dadenên ke be hemû şeweyek kewtûwete ber tewijmî tundûtîjî zimanî dasepawî dewlet-netewey serdest. Le pardeqî xwareweş da, baladestîy zimanî Kurdî le nêw xelk da û le jîngey komeleyetîyan da debînêrê.

Dîn û mezeb û ayînî xoyan qet lay kes nedirkand û qet basî eweyan nekird ke be hoy misulman nebûnyanewe le şarekey xoyan derkirawin. Mîkayîl hêdîhêdî û be kawexo le nêw xelk da cêy xoy kirdibowe û xelkî geiekiş Nene Ecemyan zor xoş dewîst. Nene Ecem zor pîr bû; taî reş le qijî da nemabû. Kurdî qisekirdinekey zor xoş bû; xelk be enqest deyandîwand. (Hîdayetî, 2017: 54)

Nene Ecem û kuiekey, be nawî Mikayl, dû sal diway têkçûnî wilat, le şiwênêkî tirewe hatibûne Bokan û ew geiekey malî Ebdulmutelîb û Kerîm. Sereta xelk beguman in lêyan û xo debiwêrin lêyan; belam diwayî gumanyan deiewêtewe û dezanin azaryan bo kes nîye û bo xoyan qurbanîy destî eşkence û azar in. Ewan, wek le deqeke da amajey pê dirawe, le ber ciyawazîy ayînî û guşarî hêzekanî dewlet, mal û zêdî xoyan becê hêştûwe û hatûnete ewê. Zimanyan Turkî ye; keçî Nene Ecem Kurdî fêr bûwe û têkelaw û taybet be xoy qise dekat û wişe Kurdîyekan be şewey pêkenî nawî derdebiêt. Mutelîb hemîşe be demyewe ye, serdanî dekat û ta katî mirdarkirdinewey mangakey be destî çekdaranî pazga, twêkile şûtî bo debat.

Lem dêiane da, şarbederkirdinî Nene Ecem û kuiekey, bo milkeçnekirdinyan bo îdeolojîy ayînîy deselatdaran. Belam ewey mebestî ême ye, axaftinî nawbirawe be zimanî Kurdî, ke detwanêt hoyekî girîngî xoşewîstbûnî bêt le nêw xelkî ew geieke da; çünke em karey, ciya lewey pêwendî lege xelkekey bo sana kirdûwetewe, niwênerewey rêz û bayexdanyetî be zimanî Kurdanî dirawsêy. Sereîay eme, axaftinî wê be zimanî Kurdî, nîşanderî ew rastîye ye ke îdeolojîy zal le barî zimanîyewe neytiwanîwe cêy xoy le nêw ew xelke da bikatewe û zimanî axaftinyan berewîy metirsîy lenawçûn bikatewe; eger çî destî be ser zimanî nûsîn û fêrkarî da girtûwe û lem pêwendîe da serkewtûwe. Be watayekî tir, zimanî Farsî, wek take zimanî fermî dewlet-netewey Êran, neytiwanîwe le nêw komelanî xelk da cêgîr bibêt û wek debînîn tenanet beîweberî xwêndingekey Mutelîb û Kerîm ke sûjeyekî ser be îdeolojîy zal e, her be Kurdî qise dekat (Hîdayetî, 2017: 185). Em rewşe, le zorbey şarekanî Rojhelat da debînîrê û nîşaneyekî berçawî zalêtîy zimanî axaftinî Kurdî û bergirîy zimanîy axêwerane lem parçeye da; herçend ke pêçewanekeşî le hendê şarî wek kirmaşan û bajarên Kurdanî Xorasan da serkewtinî siyasetî asimîlasyonî zimanî aşkira ye.

Dewlet-netewey Êran, eger çî be şewey rastewxo û berdewam û be kelkwegirtin le hêzî serkutker, siyasetî rêgirîy le axaftinî gelanî Êranî be zimanî xoyan le şiwêne nafermîyekan da pêiew nekirdûwe, belam her le seretay damezranîyewe, be şewey ciyaciya û le rêgey dezga û damezrawe girêdirawekanîyewe têkoşawe zimanî Farsî be ser netewe û kemîne naFarsekan da bisepênêt û ta radeyekî zor lem hewley da serkewtû bûwe. Qisekirdinî zorbey Kurdanî Rojhelat be zimanî xoyan, selmênerî milnedanî bindestan be îdeolojîy serdestan û berperçdanewey siyasetî zimanîy ewan e; belam le ber ewey deselat zorbey zorî amraz û dezga û damezrawekanî le berdest da ye, îdeolojîy dijber zor car bergirîy pê nekirawe û amancekanî bêencam mawnetewe. Aweha ye ke zimanî serdest be şeneyî metirsîy xistûwete ser zimanî bindest û paşekişey pê kirdûwe. Lem romane da, hendê îdey peywest be zimanî Farsî debînîrê ke le rêgey gutarî werzişî û diramayîyewe le zeynî sûjekan da cêgîr kirawe û le piraktîsekanyan da derkewtûwe; bo nimûne, tîrupîşkî Mutelîb bo wîlamdanewey pirsyarî taqîkarîyekey xwêndinge be gutinewey “de bîst sî çil penca şest hefta heşt newed sed, Kubîa Xanim xeberdar desmalî abî berdar” (184), yan nûsînî diruşmî layengirî yan dijayetîy dû tîmî fûtbalî Pêrşpolîs û Istîqlal le layen qutabîyanewe (185, 189), yan jî sergerimkirdinî xêzanekan be zincîrey têlêvîzyonîy “Oşîn” (194).



### 3.3. Mîkanîzm û Dewrî Dezgay Serkut û Îdeolojîkî Dewlet

Dewlet be dû şewey nerm û tund mamele legel sêjekanî jêr destî dekat û îdeolojî û hêjemonîy xoy be seryana da dadesepênêt. Mameley bezorî, nerm û şaraway deselat, be hoy dezga îdeolojîkekanewe pêk dêt; dezga û damezrawegelêk ke komeley mirovî dirust deken û bûnyan be bûnî mirovewe bestrawetewe û be dirêjayî jîyan hebûne û hen û dê bibin. Dezga îdeolojîkekan, ke erkî geşedan û geşandinewey îdeolojîy zalî dakokîkarî berjewendîyekanî çînî serdestyan le esto da ye, le lankey yekemî mirov, wate mal û xêzanewe bigre heta xwêndinge, zanistge, kilêse û mizgewit, damûdezgay mîdiyayî, hunerî, werzişî, edebî û tenanet rêkxirawe medenîyekanî be riwalet ciya le dewletîş degrêtewe. Dezgay tewawkerî em dezgayaneş, hêz û layene serkutekerekî in, ke heman erk, belam ziyatir be kelkewergirtin le hêzî çek û qolbestkirdin têdepeînin. Her wehaş, dezga îdeolojîkekan jî deparêzin û lew kataney da ke sêjekan be îdeolojî ragîr nakirên, pê denêne meydanewe û be zextî zor û serkut, doxeke hêwir dekenewe.

Althusser boçûnî xoy sebare be dewlet û dû rehendekey, le em sê binewaşeye da kurt dekatewe: 1. Hemû dezgakanî ser be dewlet hawkat be pêy serkut û îdeolojî kar deken, bem ciyawazîyewe ke dezgay serkutî dewlet le pêş da û ziyatir be pêy be serkut kar dekat, keçî dezga îdeolojîkekanî dewlet be piştbestin be îdeolojî; 2. Le katêk da dezgay serkutî dewlet giştêkî rêkxiraw pêk dehênêt ke paje corbecorekanî le bin fermandeyîyekî yekane da çeqyan bestûwe, dezga îdeolojîkekan pîrhejmar û ciyawaz û “ta radeyêk serbexo” û rêxoşkerî derkewtinî dîmenêkî berçaw bo serheîdanî dijayetîyekan in; 3. Le katêk da ke yekgirtûyî dezgay serkutî dewlet be hoy rêkxirawêtîy çeqbestûyî jêr destî rêberayetîy çînekanî xawen deselatewe desteber debêt, yekgirtûyî nêwan dezgagelî ciyaciway îdeolojîkî dewlet be hoy îdeolojîy zalewe ke heman îdeolojîy çînî deselatdar e - ewîş zor car be şewegelî lêkdij - dabîn debêt (Althusser, 2019: 100-101).

Le romanî *Gabo* da, sêberî qursî dezgay serkutî dewlet be û tundûtîjîy rastewxo û fîzîkî be çîupiî we berçaw dekewêt û le zor şîwênî romaneke da rengî dawetewe (Hidayetî, 2017: 18-20, 25, 36-41, 55-58, 61-63, 64, 75 û htd). Îdamkirdinî xaloy Hejîr, kuştinî bira pêşmergekey Kerîm, teqe û kuştinî xelkî sîvîl, helkutane ser malî xelkî û astengkirdinî hatûço, heşey radestkirdinî mindalan be îtla'at û heraset (Yekemyan dezgay hewalgirî Êran û ewî dîkeyan liqî niwênerî em dezgaye le îdare dewletîyekan) le layen beîweberî qutabxanewe, zalbûnî keşî tirs û toqîn le zîndan û lêpêçînewe û eşkence û sêdare û kujran, nimûney berçawî em keşe zale n. Her

weha wesfî kuştarga û serbiînî ga û gwêlkekan be şêwey diîndane, amajeyekî hêmayîn e bo ew barûdoxe tejî le serkut û tundûtîjî ye. Le beşêkî romaneke da Kerîm bem core basî goîî nawî xoy dekat:

Kutit qetim ewe le la bas nekirdûy, minîş be mindalî nêwim Kerîm nebûwe Nêwim Xebat bûwe. Kutit eha carî wa ye denûsim X. Qadirî. Ewe le ber ewe ye. Kutit min birayekim bû le xom gewretir bû, nêwî Kak Cemaî bû, ewdem ke le dayik bûm, ew nêwî nabûm Xebat. Kuitt diway ewey wilat gîrawe, bawikim û ewan le tirsan nêwyan goîwim û kirdûyanete Kerîm. ... Kutit diwayî Kak Cemaîm kujra. Kutit bawikim eksêkî Kake Cemaî gewre kirdibowe û be dîwarî dîwekeman da helwasîbû. Kutit wextêk ew pazgaye hatine ewê, babim le tirsan hênaye xwarê û şardîyewe. (Hidayetî, 2017: 75)

Ebdulmutelîb, paş ewey le rêgey hawîy mamostay edebiyatekeyanewe, ke carêk le cêy ew çûwete klas, le dûrûdirêjî û naxoşî û konbawîy nawekey xoy agadar debêtewe û hest be şermezarî dekat. Nawbiraw pêy delêt, “ta ew hemû azad û hîwa û aram û şite heye, bo ew nêwe req û teqe naxoşe Eîbîyane le ser mindal danêyn? kutit ça ew nêwe Kurdîyane çen xoş in; kurt û sûk û le ziman xoş. Axe babe, Ebdul Mitellîbî Nadirzade xetêk degrêtewe” (Hidayetî, 2017: 68). Boye be şêwey corbecor hewî lemilkirdinewe û goîî nawî xoy dedat. Dawa le Kerîmî hawîyêşî dekat bew nawe bangî nekat û ta katî goîî, lanî kem her Mutelîbî pê bilêt. Ewîş nihênîyekî be lawe dedirkênêt û pêy delêt ewîş sereta nawî Xebat bûwe û bira gewrekey ew nawey bo hebijardûwe û diwaye bawik û dayikî le tirsî dewlet da goîwyane.

Qedexekirdinî nawgelî Kurdî be giştî û ewaney helgirî watay berengarîn be taybetî, şêweyekî dijayetîy zimanî û serkutkirdinî hestî serheldanyane. Dewlet em kare be yarmetîy îdarey tomarkirdinî naw, encam dedat ke yekêk e le dezga perepêderekanî îdeolojî. Em dezgaye, hawkat legeî dijayetîy ziman û ferhengî Kurdî, be pênedanî nasname bew nawane, bangeşe bo nawe Erebiyekan dekat û em nawaneş amrazêk in bo berhemhênanewey îdeolojîy zal. Hebijardinî nawî “Xebat” le layen Kake Cemaîewe, dû mebestî le pişt e; yek, bangeşe bo îdeolojîy dijberî dewlet; dû, parastinî ziman. Belam, wek debînîn, kujranî ew be destî dezgay serkut, “Xebat”îş le jêr sêberî xestî toqandin da bizir dekat. Lem nimûneye da, dewlet, be piştbestin be dezgay serkut, xwastî xoy be ser çînî bindest da desepênêt û sêjekanîş nabadlane debine cêbecêkarî îdeolojîy çînî serdest. Aweha ye ke Althusser be pêdagirîyewe delêt, le milmilanêy navberî em dû layene da ewey serdekewêt, çînî xawen dezga û deselate û bexodan

akamêkî ewtoy nabêt.

Siyasetî dewletêkanî Êran, paş damezranî sistêmî dewlet-netewewe, le hember pêdanî nasname be mindalanî helgirî nawî Kurdî, sereta zor tund û daxiraw û paşan le ber berengarî û girîngîpêdanî xelk, kirawe û kirawetir bûwetewe û êsta helbijardinî nawî Kurdî zor asayî ye û her weha nûsînî nawî Kurdî û be rênûsî Kurdî le ser tabloy dûkanekan be şîweyekî berçaw perey sendûwe. Elbet em rewşe le hemû şîwênêk da bem çeşne nîye û le hendê şar û nawçe da, be taybet le parêzgay Kirmaşan û Îlam, henûkeş, her qedexe û guşarî layenî dewletî û tirs û be bive û naşer'îdananî layenî beramber be tewawetî neîwîwetewe. Dezgayekî îdeolojîkî çalakî em aqare, dezgay ayînî ye û le romanî berbas da, le hendêk nawî wek Ebdulmutelîb, Kerîm, Hadî, Resûl, Cema Ce'fer û Suleyman da rengî dawetewe. Le beramber da, nawî wek Rêbwar, Esmer, Nazdar, Aram û Azad debînên ke derxerî bîrî nîştimanperwerane û berengarbûnewey îdeolojîy netewey baladest e. Le pardeqî jêrewê, perawêzxiranî zimanî Kurdî le layen dezgay fêrkariyewe debînîn:

Kutî Kerîm ta nîweşew wîtar û şê'r û çîrokekanî dîkey *Sirwey* piçî piçî û be leqeley û pîtepit dexwêndewe. Ta dehat çaktir fêr debû û lêy serxoştir debû. ... Kutî nûsînewey teklîfman dexiste şewê û be roj ewendey le malê derfetyan biwaye, ew mecelleyan dest dedaye û deîoyîştin le şîwênêk dadenîştin û be nore deyanxwêndewe Kutî ewêş ders û teklîfekanî medrese nebû netwanîn hîç hestêkman le beramberyan da hebê. Tewawî şê'r û çîrok û wîtarekanman dû sê car xwêndibowe û tenanet zor cêgaşîman le ber bû. (Hîdayetî, 2017: 121-122)

Her weha ke bas kira, serlehengên *Gaboş*, le encamî geian be şîwên çîrokî “*Palewan Fisfis*” da, be govarî Kurdîy *Sirwe* aşîna debîn û diway çermeserîyekî zor dû jimarey lê dekiîn. Ewan ke ta ew kate zimanekey xoyan tenya be gwê nasîbû, be dîtinî şê'r û çîrok û babetî ciyaciway nûsraw be zimanî Kurdî, seryan sui demênê û pêy degeşênewe û berewîûy waqî'êk debînewe ke ta êsta lêyan nadiyar bû. Ewey ta ew kate dîbûyan û le qutabxane da pêy radehatin, deqî Farsî bû ke, be pêçewaney zimanekey xoyan, hestêkman beramberî nebû. Wek Mutelîb delêt, “kutim min zor baş demxwêndewe û zor baş lêy haî debûm. Kutim ‘*Palewan Fisfis*’ wek dersekanî medrese nedeçû. Hetmen le “*Şîwanî Dirozîn*” û “*Kewkeb Xanim*”îş xoştir bûwe” (98).

Le dinyay emîo da, be hatinegoî sistêmî niwê û modêrn, dezgay perwerde wekû behêztirîn dezga îdeolojîkekanî jêr rikêfî dewlet dête ejmarkirdin. Em dezgaye, balî be ser hemû

şar û gundêk da kêşawe û zortirîn derfetî bo giştgîrkirdin û çespandinî îdeolojîy zal le ber dest da ye. Le Êran da, tenya zimanî xwêndin Farsî ye û zimanekanî dîke lew mafe bêbeş kirawin; boye, wek lêre da deybînîn, zimanî Kurdî bo ew mindalane namo ye û ta lexewiabûnyan be hoy ew parçe kaxezewe, nazanin zimanekey xoşyan be kelkî nûsîn û xwêndin û xwêndinewe dêt. Deselat le rêy em dezga berbilaw û behêzeyewe, herdem hewil dedat ew bîrokeye le zeynî sûjekanî da cêgîr bikat ke tenya zimanî Farsî ew piristîjey heye le qutabxane û zankokan da bixwênrêt û be serincdan bewey pêdanî hemû biwanameyek le bin destî xoy da ye û deselatî be ser hemû damûdezgan da heye, hemû takekanî komele naçar dekat bo rû lew şiwêne bawepêkirawekanî xoy biken. Bem core axêweranî zimanekanî tir, le zimanî xoyan dadebiîdirên û be şewey nerm û niyan zimanyan dête biîn.

Dezgay fêrkariy dewlet-netewey Êran bo pêgeyandinî îdey yek netewe, yek ziman, hawkat lege çêkirdinî lempir le berdem bekarhênanî zimanekanî tir da, hewil dedat le rêgey mindalanewe em îdeolojîye zimanîye bibate nêw malekanyanewe. Bo em mebeste, zor car û le zor şiwên da, mindalan, her le destpêkî xwêndinyanewe, naçar dekirên be zimanî Farsî qise biken û ewanîş le ber nezanînî zimanî serdest û bo galtepênekirdinyan, zimanyan debestin û hêndey dîke milkeçî deselatî dasepaw debin. Nimûney em naçarkirdine le *Gulî Şoran* da bem şeweye rengî dawetewe: Katê dayikî kesayetîy serekîy romaneke sebarete be doxî qutabxane pirsyar le kuiekey dekat, Las le welam da haletî mamostakanî le xo deqret û delêt: “Farsî suxen bêgûyîd!” (Farsî qise bike) (Nehayî, 2014: 39). Şiyawî amajey dûbare ye, le Rojhelatî Kurdistan da, sereîay hewil leîadebederî em dezgaye bo çespandin û sepandinî zimanî Farsî, zorîney Kurdan bergirîyan kirdûwe û lanî kem neyanhêştûwe hêjêmonîy ew zimane piçeke, zeyn û malû bazai û bajêryan dagîr bikat. Lem romane da, her wek çon le waqîş da weha ye, qutabxanekan ziyatir le zîndan deçin û beîweberanî dezgay îdeolojîkî fêrkari, bo becêgeyandinî erkekanyan zor car pena debene ber tundûtîjî û wek dezgay serkut decûlênewe. Em şewe hêlûkewte, nîşaney serbizewîy sûjekan û destemonebûn û milkeçnekirdinyane bo îdeolojîy zal. Em şewe mameleye le nêw xêzan û le kardanewekanî bawikî Mutelîbîş da be rûnî pîşan dirawe:

Eslen zorî rîq le kitêb bû. Hîç kitêbêk cige le kitêbî dersî le maî ême da nebû. Ew hemûwe Se'dî xoş dewîst û tarîfî *Gulistan* û *Bûstanî* dekird, tenanet ewanîşî nebû. Deykut to urzey ewet nîye dersekanî xot bixwênî êsta deçî çîwar lapeie diîawî Mela Rehmanî Hejar û Seyidî Şêxelîslamim bo dexwênîyewe! Piff, meselen ewe

xwêndîştewe, be hîway bibî be çî?! Ge! û qimçaxit ewende xawêne Kurdayetîm bo bikey?! Kuîdayetî! Ay şîîîîî! Ewaney kirdiyan halyan zor xawên bû! Dîtman, dîtman, belê, dîtman çîyan lê hat û çîyan be ser hat. (Hîdayetî, 2017: 170)

Le romaneke da, Mîrza Hadî wek piyawêkî zor samdar û milhuî û sikeîo wesf kirawe ke cige le xoy û Şêx Se'dî kesî tirî qibûl nîye. Reftarî lege! hawjîn û kuîkey da zor tund û xirap e û ewanîş zor lêy detirsîn. Hemû kar û kirdeyekî Ebdulmutelîb le bin çawdêrîy tundî ew da ye û lar bicûlêtewe rastî dekatewe. Boye, hemû karêkî Mutelîb be nihênî ye. Bo nimûne, dûr le çawî ew, lege! Kerîm da, kitêbî Kurdî dekiîin û deyxwêninewe, belam, wek amajey bo kira, Mîrza Hadî zor riqî le pirtûkî Kurdî ye û ewîş nawêrê bîbatewe mal û Kerîm boy heldegrêt. Carêkyan dû kitêbî Kurdî be rojname dadepoşê û le nêw kitêbe dersîyekanî da deysarêtewe; bawikî rastîy rûdawekey bo derdekewêt û be tane û teşer û cinêw û şeq û tif dekewêt wîzey û çak çak deysorêtewe.

Xêzan û mabat, wekû bêşke û qonaxî destpêkî sûjeperwerî, yekem dezgay çespandin û berhemhênerewey îdeolojîy zal e. Bawik û dayik, le pal gewrekirdinî mindal û parastinî le nexoşî û metirsîyekanî tir, be îdeolojîyek goçyan deken ke boyan diyarî kirawe û le mêşkyan da çênrawe û debêt le pê naw qazancî kemîneyekî serdestî xawen hêz û saman da, berhem bêtewe. Ebdulmutelîb, ke hewî çêkirdinewey nasnamey xoy deda û dexwazêt le rêgey fêrbûnî zimanî dayikî û nasînî mêjûy edebî û siyasîy netewey xoyewe, le tarîkîy îdeolojîy zal rizgar bêt, bawikî debête yekem asteng û lempêrî. Em rêgayey ew helîbjardûwe, le layen dezgay serkutî dewlet û her weha dezgayên îdeolojîkî derewe, berbestî bo danirawe; belam ew berbestekan deşkênêt û berew amanc hengaw denêt. Lêre da ye ke mabat wek dezgayekî îdeolojîkî parêzwanî berjewendîyekanî çînî baladest, zor baştir û karîgertir le dezgakanî tir, debête kendî ber pêy û gaberdî ber rêy.

Althusser xêzan û binemaley wek yekêk le dezga girînge ser be dewlet pê nase kirdûwe û eme bew wataye ye ke lem dezgaye da îdeolojîy zal le berjewendîy çînî serdest da pê ew dekirêt û berdewam berhem dêtewe. Be pê ew em nêrîne, ew îdegeley dewlet piropagendeyan bo dekat û pereyan pê dedat, le nêw xêzanekanîş da be gwêy mindalan da dedirêtewe û le mêşkiyan da cêgir dekirêt. Le helwêstekanî em bawike da, rengdanewey em rastîye debînîn. Ew, çalakî û karî ferhengî be çalakîy çekdarî û siyasîyewe girê dedat û bem pêye rêgirî le ziman û çand û wêjey Kurdî jî dekat; wek çon edeb û ferhengî Kurdan, le layen çînî deselatdarî dewlet-netewey

tazedamezrawî Turkiya, Êran, Êraq û Sûriyawe tenya wek çalakîy siyasîy dujminkarane le berçaw gîrawin (Ehmedzade, 2018b: 163).

### 3.4. Sûje û Pêvajoy Besûjebûn

Sûje, pênasê ew takane ye ke bûnyan be bûnî îdeolojîyewe girê dirawe û xoyan le nêw ew çîwarçêweye û be pêy merce diyarîkirawekanî, denasin û cîhanî dewrûber û pêwendîyan be mirovekanî tirewe fam deken. Em helûmerce bo hemû takêk le goîê da ye û be witey Althusser, mirov pêş ledayikbûnîşî sûje ye; bew wataye ke naw û ayîn û ziman û ferhengî, be bê destêwerdan û mafî biyardanî xoy diyarî kirawe. Paş çawhelênanî be dinyaş, satbesat û be şewey corawcor, bo jîyanêkî sinûrdarî lepêşdiyarîkiraw radehênrê; rahênanêk ke bawik û dayikîşî pêgeyandûwe û ewîş le pêvajoy jîyanî da debêt fêrî çêkirdinî sûjey diway xoy bibêt. Deselatî serdest le rêgey dezga pêwendîdarekanîyewe, îdeolojîy xoy be hemû sûç û qujbinêkî komejge da bilaw dekatewe û sûjekan dexate bin rikêfî xoy û le pê naw berjewendîy deselatdaran da bakaryan dehênêt. Sûjekan, be pîanî, wilamî erênî be lêpêçînewey dezga îdeolojîkekanî dewlet dedenewe; boye le çawî deselat da wek sûje û hawilatîy baş nawdêr dekirên û jîyanêkî be riwalet hêmin û azadane, belam le rastî da çewsênerane û serşoianeyan pê debexîrê.

Takekan be şewey naxudaga be gwêrey bîrokekanî îdeolojîy zal û le berjewendîy çînî komeleyetîy serdest decûlênewe. Ewan beşdarî le pêvajoy lêpêçînewe da deken û em kare be bedesthênanî îdeolojîy zal û cûlanewe be gwêrey yasakanî sîstemî deselat, ke be seryan da zal e encam deden. Lêpêçînewey îdeolojîy zal le rêfêwî dezga îdeolojîkekanewe, ewan le takewe bo sûje degofêt; her bew çeşney Althusser (1971: 118) debêjêt, “hebûnî îdeolojî û lêpêçînewey takekan wek sûje, babetêkî yekane û wekyek e”. Bem pêye, bîrokey serekîy teorîy Althusser sebarete be subjêktîvîte ewe ye ke “îdeolojî, takekan le rofî sûje da bang dekat”. Le rêgay bangkirdinewe ye ke sûjekan wek berhemî pêkhategelî lepêşdiyarîkiraw çê debin. Em pêvajoye rewteke nîşan dedat ke sûje têy da pêwendî xoy legele waqî' da denasêtewe û pêgey îdeolojîkî xoy piştîfast dekatewe. Le beramber sûje milkeçekan da, hendêk sûjey tir hen ke çok danaden, gwê berperçî lêpêçînewekan dedenewe û sûk û hasan nayêne xapandin. Em sûjengele, be nawnîtkey neyar, gêreşêwên, têkderî aramî, têrorîst û htd. Dekewine ber pelamarî dezgakanî dewlet, be taybet dezgay serkut û her weha le layen sûje xapênrawekanewe, be şewey corbecor, rûbeûy serkone û serkut debinewe. Lem romane da, le pêwendî legele pirsî zimanî dayikî da, her dû cor sûjeke we berçaw dekewin. Lem pardege da çonyetîy hêlêkewtî yekêk le sûje xapênrawekan

rengî dawetewe:

Deykut carêkyan Mîrza Hadî be byanûy ewey ke bo kaxezêk degeîê, be gij dar û berd da deçû. ... Deykut çûwe ser taqey kitêb û defterekanî medresey Ebdulmutellîb. Defterêkî dest daye ke rojnameyek le bergekey gîrabû û be xetêkî gewre nûsrabû defterî înşa. Deykut wextêk kirdimewe, dîtîm xo defter nîye û kitêbe! ewîş çi kitêbêk? ewîş hî kê? kitêbî Mela Rehmanî Hejar! Deykut biîêkî dîkeş nêw kitêbekan geiam. Le nêw berggîrawekan da yekî dîkeşîm dîtewe ke defterî teiemaş û teiesaz nebû, belkû kitêbî *tarîk û rûnî* Hêmin bû. ... Deykut kutî ewe ew keçektêbane çîn le nêw kitêbekanî medreset da, kuîe? ha? ... Deykut kutî belam, belam marmêliketopîw fêr bûy be dizîyewe keçektêbî kuî Şêxelîslam û Mela Rehmanî Hejar dexwênîyewe?! haaa! binegû! (Hîdayetî, 2017: 166-168)

Mutelîb diway ewey dayikî lapeie Kurdîyekey lê destênêt û deydiênêt, beserhateke bo Kerîmî hawîyê degêîetewe; încâ pêkewe dekewine diway dozînewey serçawey ew lapeieye û wek le serewe basman kird, xulyay xwêndinewey Kurdî debîn û hemû hewlêkyan bo kokirdinewey pare û kiînnî *Sirwe* û kitêbî Kurdî dexene geî. Bem core çend kitêbêk be hawpişkî dekiîn, belam Ebdulmutelîb le tirsî bawikî nawêrê lay xoy helyanbigrêt û Kerîm deyanbatewe malî xoyan. Mutelîb hendê car be dizîyewe kitêbekan debatewe malê û bo ewey pêy nezanin be rojname bergekanyan dadepoşet bawikî be pişkinînnî kitêb û defterekanî, çawî pêyan dekewêt û rastîyekey bo derdekewêt. Mîrza Hadî erkdarî xanenişînnî îdarey awe û cige le xoy kesî qibûl nîye û “Şêx Se’dî” nebê, hîç şa’îr û nûserêkî tirî behend wernagirê û rîqî dinyay le şa’îran û nûseranî wek Hêmin û Hejar û be giştî kitêb û be taybet Kurdî ye; tenanet kitêbekanî Se’dîş le malîyan da nîye.

Le witekanî Mîrza Hadî da, wek sûjeyekî hêlsazrawî îdeolojîy za, dû xal berçaw in û derxerî bîr û zeynî dagîrkirowî ew in; yek, nawhênanî Hejar û Hêmin be Mela Rehman û kuî şêxelîslam; dû, nawbirdekirdinî kitêbî Kurdî be keçektêb. Ew nawane, eger çî bas le rastîy jiyan û pêwendîekanî ew dû kesayetîye deken, belam ew be mebestî sûkayetî bekaryan dehênêt. Nawbiraw be xobiwardîn le bekarhênanî nasrawî here nasrawî “Hejar” û “Hêmin”, deyewêt nawbang û rêz û gewreyîyan lê bistênêtewe û byanhênnê astî kesên asayî û be pêy witey kuîekey, be her corêk biwaye “kesetîye benêwbangekanî lehand xoy dehêna xwarê û galtey pê dekirdin” (Hîdayetî, 2017: 168-169). Her weha, wesfî kitêbî Kurdî be keçektêb û girîngîdanî

hemîşe û berdewamî be berhemekanî Se'dî, ke le katî mindalî da, be lay bawikîyewe xwêndûnî, nîşanderî bawêî qayimyetî be berzî, girîngî û bayexdarbûnî ziman û wêjey Farsî û be pêçewanewe, nizmî û neşiyawbûnî zimanekey xoy bo berhemhênanî edebî. Berawirdî berdewamî ew berheme Kurdîyane legel *Bûstan* û *Gulistanî* Se'dî, wek tenya berhem û kesayetîyek ke le edebî Farsî da deynasê û her weha agadarnebûnî le edebî Kurdî û mêjû û şa'îranî serdemanî pêşû, selmênerî cêgîrbûnî îdeolojîy zale le mêşkî ew da û roçûnî ew îdegeleye be naxî naxudagay da.

Elbet, pêwîst e em rastîyeş le bîr nekeyn ke, sereîay ewey karîgerîy îdeolojîy be ser nawbirawewe diyare, hendê gute û kardanewey wî derîdexat ke be tewawetî nebûwete sûjey destajoy deselatî zale û le hember çewsandinewey dewletî da helwêstî heye. Detwanîn bilêyn le hoyekanî tîrî xodûrgirtin û rîqî ew le ziman û wêjey Kurdî, tîrsî le dezgay serkut û her weha nahumêdîyetî le xebatî Kurdayetî û îdeolojîy layenî dij be dewlet. Bo nimûne, le beramber tengetawkirdinî xelkî geiek be destî çekdaranî pazga, “hemû carêk çawî pii debû le aw” (19) û be dûr le çawî ewan, deygut: “Ay lew roje reşey têy kewtûyn! ... Kuie abî û namûsman çû! ... Kuie hatine serşorke û hemamekanman, lifke û kîse û berdepêy jinekanyan bijardîn! ... Derpêy jînekanîşyan pişkinî Xîret û piyawetî û heya û namûs royîştin taze nayanbînînewe” (19).

Mîrza Hadî, eger çî le beramber serkutî fîzîkî da helwêst denwênêt, hest be serkutî îdeolojîk nakat û bo xoy debête palpişt û cêbecêkarîşî. Netewey baladest, be girêdanî zimanî kemînekan be tenahîy wilat û her weha be helsûkewtî tundûtîjaney legel parêzeranî zimanî dayikî da û be sûkkirdinyan, îdey metîrsîdarbûnî zimane naFarsîyekan le komege da cê dexat. Sûje berkewtûwekanîş le bin bandorî deselat da, em bîrokeye berhem dehênînewe û debîne berbestî ser rêy geşekirdin û giştîgîrbûnî ziman û wêjey xoyan. Deselatdaran, be hoy ew hemû hel û dezga îdeolojîkaney le ber destyan da ye, zor be sanayî çawî komege le ser rastîyekan dadexen û ewey le berjewendîy xoyanda ye, be seryan da deysepênin; be çeşnêk ke, be bê destêwerdanî rastewxo, helûmercî amadey komege berhem dehênînewe. Nizmkirdinewey pêgey çalakanî bergirîkarî ziman û edebî Kurdî, derxerî mêşkî dagîrkirawî Mîrza Hadî be hoy îdeolojîy zalewe ye. Ew, ciya lewey tîrsî le kardanewey dezgay serkutî dewletî heye û her weha layene nerênîyekanî şoiîşî Kurdî bûwete hoy nahumêdî û rîq û qînî, bê ewey xoy bizanê, wek sûjeyekî destemokirawî destî deselat, mil be lêpêçînewey dezga îdeolojîkekan dedat û kesayetîye Kurdekan û berhemekanyan û be giştî zimanî Kurdî sûk dekat, be berawird legel kesayetî û



berhem û zimanî netewey baladest, be hîçyan dadenêt û deyewêt kuiekeyşî be pêy em bîrokeye rabihênêt. Belam wek debînîn, Hejîr milkeç nabêt û bem core be diway nasnamey rasteqîney xoy da degeîet:

Kutit rast deka, ça ew nêwane; Azad, Rêbwar, Saman, Aram. Kutit ca Ebdulmitellîbîş bû be nêw?! Welahî rastîş deka minî Kurd bo debê nêwî Eiebîm le ser bê? ... Wesweseyek ke çend mang lewe pêş wehay xitûke dabû ke xistibûye çermeserîyewe, dîsan wek kêç kewtewe kewî. Kutî carêk sicîlekem kun kirdibû. Kutî çendîn car hewlî dabû le klas ew nêwey le ser la ben. Kutî hîçkam lew rêgayane neyantiwanî ew nêwe dûr û dirêj û naxoşey lekol bikenewe. Belam emcar geyîştibû be rêgaçareyekî şiyaw û guncaw. Kutî debime şa'îr û naznawêk bo xom heldebijêrim. (Hidayetî, 2017: 74, 131)

Serlehengî roman, be mebestî goîînî nawekey xoy, çendîn rêgeçare taqî dekatewe û le hîçyan da awatekey nayêtedî; ne le rûy heldêt be mamostakanî bilêt lanî kem Ebdulekey nelên û ne sûtandin û kunkirdin û siînewe û reşkirdinewey 'Ebdulmutelîb'î ser nasnamekey debête çareser. Tenanet le ser em hewley xoy we ber şeqî bawikî dedat û le kotayîş da debêtewe xawen nasnameyekî niwêy be heman nawewe. Bem core dest heldegrêt, ta ew demey pêşekîy *Tarîk* û *Rûnî* mamosta Hêmin dexwênêtewe û têdegat ewîş nawêkî dûr û dirêjî hebûwe, Belam tiwanîwyetî bibêt be şa'îr û nawêkî niwêy Kurdî û lezarxoş bo xoy helbijêrêt û kêşkey çareser bikat. Boye, ewîş xoy le qerey helbest dedat û nasnawî xoy dekate Hejîr.

Dû nawî Ebdulmutelîb û Hejîr, helgîrî dû rehendî lêkdijî îdeolojî; yekêkyan, îdeolojîy zalî mezhebî û parêzerî berjewendîy deselatî baladest û her weha xawen palîştîy dewlet û ewî dîkeyan, îdeolojîy dijberî siyasetî paktawîy zimanî û ferhengî, ke ew nasnamey rasteqîney xoy tê da debînêtewe. Ebdulmutelîb, nawêk e bawikî le bin bandorî dezgay ayînî da lêy nawe û pêdagîr e le serî. Kuiekeşî weha fêr kirdibû şanazîy pêwe bikat û tenanet rêy kes neda be Mutelîb nawî berin, çunke mutellîb nawî Xuda ye (68, 74). Belam, nawbiraw wek sûjeyekî gwêayelî dezgayên îdeolojîkî mabâtî û ayînî, be hoy hawîyeyekî mamostay edebiyatekeyanewe radebêt û le xoy dekewête gumanewe depîrsêt: "Rast deka wextayek ême Kurdî bo nêwî min Eiebîye?" (69). Boye, be şewey corawcor û be gwêrey lêkdanewey mindalaney xoy hemû hêzêkî le pê naw piçînî zincîrî îdeolojîy zalî û goîînî nasname dadenêt; belam boxoşî dezanêt "xîretî dewê bîgoî ûxot derbaz bikey" (129).

Hejîr, hawkat legeî têkoşanî bo lekolîkirdinewey nawe Erebiyekey, be dozînewey

nûsraweyek be zımanekey xoy û kelkeley bo zanyarîy ziyatir, “le Kurdî agadar dekirêtewe û le Farsî namo debê; be ew Farsîyey pêştir xud û nasnamey bo berhem hênabû. Bem şêweye rewî pêkhatinî subjêktîvîteyêk dest pê dekat le ser binema û begwêrey zımanî Kurdî damezrawe” (Sadjadi, 2018a: 22). Em nasîn û xonasînewe û hogirîyey bo zımanî dayikî, deyxate ser rêgayek ke be pêçewaney rêwî diyarîkirawî îdeolojîy zale; boye, wek sûjeyekî têkder û lader, dekwête ber hêrîş û heşey dezga parêzerekanî îdeolojî û sûje hêlsazrawekanyan. Le malewe bawikî debêt be mêmî û le xwêndingeş axey serçşmey beîweber heşey radestkirdin be dezgay serkutî lê dekat û bem çeşne, ew û Kerîmî hawîyê, taqe dû rêyan le berdem da debêt; yan manewe û xobedestewedan, yan helatin. Kerîmîş nimûney sûjey destemonekirawe û be dirêjayî romaneke, be dil û giyan palpiştîy hawîkey dekat. Dêekanî jêrwe, derxerî nimûneyek le helwêstekanî ew in:

Kutî xozge Kerîm min nedemirdim û taqe rojêk tom le bergî mi'ellîmî da bidîbaye. Diway ewîş jinim bo bigwêstibayetîyewe; îdî ewdem Bayizî mirîşkifroş demird yan nedemird gû be goî. ... Kutî dayikim çawêkî le şiwênî betaî wêneyê Kake Cemalîm kird û henaseyekî helkêşa ... Kutî minîş çawêkim le şiwênî betaî wêneyê Kake Ccemalîm kird takû ew bizeyey ewim qet le bîr neçêtewe. Kutî qetim le bîr naçêtewe. Kutî şerte Kake tolet bistênmewe. Kutî bîrim dekirdeke le dahatû da ew şiwêne betale debête dû şiwên. Demhêna pêş çawim ke dayikim û babim lewe be diwawe le ciyatî wêneyek dû wêneyan debê ke natwanin helîwasin û derûnyan hêndey dîkeş heldeqirçê. (Hîdayetî, 2017: 212-213)

Kerîm û Hejîr, diway tewawkirdinî sê sal xwêndinî qonaxî nawendî, her kam bo destebarkirdinî amancêk beşdarî le taqîkirdinewey wergîran le perwerdey mamostayan da deken; Hejîr bew hîwayewe ke le zîndanî malewe rizgar bibêt û Kerîmîş bo ewey awatî dayik û bawikî wedî bihênêt. Gewher û Bayiz, diway kujranî kuîe gewrekeyan arezûyan e ew bibête mamosta û jîyanî hawbeş pêk bihênêt û bibête xawen mal û mindal. Belam Kerîm û Hejîr, bo bedesthênanî keşî azadî xwêndin û xebat û her weha le tirsî destbeserbûn, biyarî çûnederewe deden. Kerîm be bîninî cêy çolî wêneyê Kake Cemal, le pêraw toley xwênî birakey, destberdarî xoşewîstîy xanewade û kitêbekanî û nazdarî kiçedostî debêt. Ewan rêy Bane degirne ber û deyanewêt derbazî sinûr bibin. Kerîm ke her xoy Hejîrî xiste ser em bîr û biyare, be bîstinî ra û rawêjî ew lawey bo pişandanî rêy tevlîbûn be şoiş, pêyan nasênrabû, paşgez debêtewe; keçî ew pêdagir e û nakişêtewe û sereîay giryan û tika û têkoşanî hawîkey, siwarî minîbûsî Bane debêt û deçît.

Bem core, legel kotayî hatinî romaneke, çîrokî çarenûsî nadiyarî kesayetîye serekîye kan dest pê dekat.

Kerîm, wekû hawîêkey, paş nasînî ziman û nasnamey xoy, debête hogirî kitêbî Kurdî û bem core çewaşekarîy çend saley dezgay îdeolojîkî fêrkarî bo derdekewêt û wek sûjeyekî lexewîabû, wek dijkirdeweyek le hember zimanî dasepawî Farsî da, hewlî fêrbûnî zimanekey xoy dedat. Eger çî bawik û dayikî ewîş, be kitêb kiînnî naiazîn û boley be ser da deken, belam ew guşarey Hejîrî le ser nîye û pêwendî legel bawikî da xoş û biraderane ye. Kerîm, sûjeyekî serbizêw û çawnetirs e û hemîşe be kare metirsîdarekanî, wirebexşî hawîêkanî ye. Kake Cemaî bira gewrey, nimûney ew sûjane ye ke nek her neçûnete bin bandorî lêpêçînewey dezga îdeolojîkekan, tenanet le dijî serkut û sepandinî îdeolojîy zal da serî heldawe û bem core leçawî deselat da bûwete sûjeyekî lader; boye, le layen dezgay serkutî dewletewe le naw birawe. Bawik û dayikî cergsûtawîşî le beramber tewijmî toqandin da, tenanet wênekeyan le ser dîwareke dagirtûwe û têdekoşin em kuîey tiryar bew rêgaye da neîwat. Belam Kerîm le bin bandorî ew bîrewerîye tale û be bînnî zulim û zorî çekdaranî pazgay geîek, sereîay hewlî dezga îdeolojîkekanî malbat û mîdiya û xwêdinge, naxapênrê û nabêt be sûjeyekî berjewendîparêzî çînî baladest.

Kerîm, be şewey corawcor û be pêy temenî xoy, le dijî dezgay serkutî helwêst denwênêt û le beramberyan da bêdengî helnabijêrêt. Bo nimûne, katêk topekeyan dekewête nêw hewşey pazga û serbazan destî be ser da deşrin û pêyan nadenewe, be hawkarîy Mutelîbî hawîê û hawîazî û rewandinewey tirs û wirepêdanî, nexşey rifandinî tope teqelîyekey pazga cêbecê dekat; be tîrûkewanî sîmî, kize le binagwê û binmilî çekdaranî pazga heldestênê û be nûsînî diruşim û heîşenane be zimanî Kurdî le dijî nîştimanfiroşanî wek mamî û cêbecêkaranî îdeolojîy zalî wek Axey Serçeşmey beîêweberî qutabxane, helwêst denwênêt û xoy wek sûjeyekî destajonekirawî serkut û îdeolojîy deselat derdexat. Aweha ye ke debînnî le layen Axey Serçeşmewe ke sûjeyekî gwê lemistî ser be dezgayekî îdeolojîkî dewlete, heîşey îtla'at û heraset û pazga û zîndanî lê dekirêt. Le rastî da, katêk cêbecêkaranî îdeolojî, netwanin erkî çekirdinî sûjey milkeç cêbecê biken û le rêy çawbestkirdin û xapandinewe sernekewin, bo xoyan wek dezgay serkutî dewlet û le rêy tundûtîjîy rastewxowe hewlî destemokirdin yan lenawbirdinî sûje zincîrpisênekan deden.

### 3.5. Encamî Xwêndinewey *Gaboî*

Romanî *Gaboî* be şêweyekî şiyaw rûbeûbûnewey deselatî serdest û netewey Kurd û zimanî Kurdîy xistûwete îû. Bem pêye, be pêdagirtin le ser pîrsî zimanî nivîskîy Kurdî, perjawete ser gêianewey rûdawekanî deyey heştay zayînîy Rojhelatî Kurdistan û milmilanêy nêwan dû îdeolojîy zal û dijber. Rengdanewey serkutî rastewxo û fizîkî lem romane da zor berçawe û le pal eweş da, dezgakanî îdeolojîk jî erkî besûjekirdinî takekanî komegey Kurdî beîewe deben. Le beramberîş da, berengarîy layenî dijberî dewlet debînîn, ke îdeolojîy zal neytiwanîwe be tewawetî cêy pê çol bikat; boye, dezgay serkut û îdeolojîkî malbat û fêrkarî û ta radeyek ayînî, çalakane û be tundî rûbeûy bûnetewe û deyanewêt paşekişey pêbiken. Keşî zal zimanîy civak, Kurdî ye û tenanet le xwêndingeş da, sereîay ewey zimanî fermî Farsî ye û be ser mindale Kurdekan da dasepawe, bekar dehênrêt. Ke wa bû, detwanîn bibêjîn zimanî serdest neytiwanîwe bibête beşêk le subjêktivîtey sûjekan; ewaneş ke dijayetîy kesayetî û berhemên Kurdî deken, ziyatir le bin bandorî dezgay serkutdan ta dezgayên îdeolojîkî dewlet. Dû kesayetîy serekîy romaneke, wek sûjegelî serbizêw û destajonekirawî serkut û îdeolojî, be têgeyiştin le nasname û rastîy rewşî zimanîy xoyan, berperçî lêpêçînewekanî dezga îdeolojîkekanî dewlet dedenewe û hewlî fêrbûnî zimanî dayikî û nasînî berheme edebîyekan deden. Boye, wek sûjey naferman û berhelistkarî îdeolojîy zal, berewîuy hêriş û heîşey dezgay malbat û medrese û her weha serkut debînewe û le kotayî da, be naçar, wek cwanegay bin dest û çeqoy Seyide Sûrî Sellax, le Seyide sellaxekan heldên, dergay zîndan deşkênin û rêy dûrî sinûr û çarenûsî nadiyar degirneber.

## ENCAM

Xwêndinewey romanekanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî û Gaboî* be pêy çemke rexneyîyekanî girêdirawî Marxîsmî Pêkhatexwazane û berawirdkirdinyan legel yektir, zorêk xafî hawbeş û her weha hendêk ciyawazîman bo derdixen. Lem beşê da tîşk dexeyne ser xale girîngekan û helwêstî kesayetîyekanî em dû deqe le goşenîgay Louise Althusserewe heldesengênîn. Her dû romanî berbas, pêwendî çewsêneraney dû layenî serdest-bindest degêinewe; le layekewe dewlet-netewey baladestî Turkiya û Êran û le beramber da, netewey Kurd. Em deqane be şewey wîrdbînane waqîî jîyan û serburdey gelî Kurd û pêwendî çewsêneraney em dû layeneyan tê da tomar kirawe û rastîyekanî komelgey Kurdî û jîyanî milyon takî Kurd le dû parçey Bakûr û Rojhelat, le goşenîgay çend kesayetîy nimûneyîyewe, be keristey wişe çê kirawnetewe û gwêzrawnetewe ser peyê kaxez. Lem nêwe da, pîrsî ziman, wek serekwatay dû deqî berbas, xirawete berçaw û gêanewekan le ser binçîney em mijare girînge binyat nirawin. Dû romanî berbas, helûmercî nalebarî çarekî kotayî sedey bîstem û dû deverî Kurdistan dexene ber çaw. *Gaboî* beserhatî dû tazelawî zincîrpisênî şunaxwazî hogirî ziman û edebî Kurdî le şarî Bokan degêîetewe û *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* jî deperjête ser jîyanî xemxorêkî zimanparêzî ber zîryanî betewijmî zimanbîî. Em berhemane, gelêk dîmenî şeû pevçûn û çewsandinewe û berxodan û serbizêwî û serşoîyan tomar kirdûwe; belam ewey cextî ziyatîrî le ser kirawetewe û mijarî serekîy twêjînewey berdestîşe, pîrsî ziman û helwêstî kesayetîyekan e le pêwendî legel em pîrse çarenûs saze da.

Dewlet-netewekanî Êran û Turkiya, hawkat legel damezranyan, bo serxistinî îdeolojîy yek wilat, yek netewe, yek ziman, zor car siyasetî nikolî, sùkkirdin û perawêzxistinyan pêew kirdûwe û lem nêwe da, ziman pişkî şêrî berkewtûwe û be tundtîrîn şêwe rûbeûy hêriş û heîşe bûwetewe. Deselatên serdest, be kelkwegirtin le dû şewey tundûtîj û nerm û niyan, le pê naw yek amanc da, wate amancî paktawîy zimanî, karyan kirdûwe. Şewey tundî em siyasete, be dezgay serkutî dewlet desteber bûwe, ke be pê teorî rexneyî Althusser, polîs û hemû hêze çekdarekanî tir, hikûmet, dadga û zîndan û damûdezgay danan û beîwebirdinî qanûn û destûrî bineîetî le xo deqrêt. Şewey nerm û niyanî em siyaseteş be yarmetî hêzî ta radeyekî zor şarawe û hestpênekirawî îdeolojî û le rêgey dezga îdeolojîkekanewe beîwe deçêt, ke birîtîn le mizgewt, malbat, mîdiya, xwêdinge û damûdezgay siyasî, qanûnî û her weha ferhengîy wek huner û wêje e werziş.

Ziman, wek rehendêkî zor girîngî nasname, berçawtirîn hêmanî ciyawazî, bebiîştirîn çekî xoîagirî û girîngtirîn fakterî ciyawazîy netewey Kurd e; boye, zortirîn zextî dezgay serkutî dewletanî serdestî le ser bûwe. Le her dû deqeke da, hêlûkewtî tundûtîjaney dezgay serkutî dewlet, be toxî, rengî dawetewe. Deqên berbas, lêwanlêw in le pêşelkarîy mafî zimanîy Kurdan. Qedexey xwêndinî Kurdî û xwêndin be zimanî dayikî û naçarkirdinî mindalanî Kurd bo xwêndin be zimanî Turkî û Farsî, be pêy destûrî bineietî, berçawtirîn destêwerdanî dezgay serkut le beîwebirdinî siyasetî dijezimanî dan. Qursayî em serkutkarîye, piştî çapemenî û kitêbî Kurdîyî çemandûwetewe; be çeşnê ke, serlehngî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, her katêk çaw le kitêbxanekey dekat, xem û hesretî kembûnî pirtûkî Kurdî azarî dedat û le *Gaboîş* da, Kerîm û Mutelîb le rêy Kak Suleymanewe û le keşêkî tejî le tirs û dileîawkê, detwanin kitêbî qaçaxî Kurdî dest bixen. Em deqane gelêk dîmenî tirî girêdirawî dezgay serkutyan tomar kirdûwe; 1. Helkutane ser malan û pişkinînî hemû sûç û qujbinekan le layen esker û pasdaranewe, 2. Qolbestkirdin û eşkencedan, 3. Kuştin û lesêdaredanî xalo û bira gewrey serlehengên her dû roman, 4. Rîzkirdinî termî rûtî kui û kiçanî şoişgê û sûkayetîpêkirdinyan, 5. Dirustkirdinî keşî tirs û toqandin û heîşey be girtin dan le layen sûje gwêlemistekanewe, nimûney berçawî amadeyî berdewam û berbilawî dezgay serkut, bo serxistinî pêvajoy tiwandinewe n.

Serkutî rastewxo bo becêgeyandinî amance çewsêneranekan, berberekênê rastewxoy çewsawekan be diway xoy da dehênêt; boye le beramber hêlûkewtî tundûtîjî deselat da, bergirîy bindestan jî debînîn. Xebatî çekdarane le dijî dewlet û serheldanî kesayetîye serekîyekan û tevlîbûnyan be şoişewe derxerî em rastîye n. Dîmenêkî tirî berberekênê dewlet, le hêlûkewtî mindalan da xoy derxistûwe. Le her dû romanî berbas da, mindalan le pêvajoy berxodan da, be pêçewaney gewrekanyan, ke le gwêy ga da nûstûn û serkut û îdeolojî tûşî xesanî kirdûn, çalaktir decûlênewe. Mutelîb û Kerîm be rifandinî topî serbazan û lêdanyan be tîrûkewanî sîmî û be nûsînî diruşmî û her weha name be zimanî Kurdî bo tirsandinî nîştimanfiroşan û layengiranî dewlet û le romanekey tirîş da, berdbarankirdinî şemendefêr le layen “zarokên taxên rojhilatiyan” û zyangeyandinî xwêndkaran be “mal û samanî dewlet” be xetxetîkirdinewey mêzekanî pol û kêşanî wêney corawcor û lewane çek, pişanderî kardanewey zarokanî ser be netewey bêmafkiraw, be pêy riwanîn û dinyay mindalaney xoyan.

Bekarhênanî dezgay serkut le layen dewletewe, zor car bergirîy hawşêwey çînî çewsawey lê dekewêtewe. Belam ewey debête tewawkerî serkutî fîzîkî û destkewtekanî dewlet çaktir û

serkewtûwanetir dabîn dekat, îdeolojî ye. Dewlet, le rêy dezga îdeolojîkekanyewe, sûjey milkeçî xoy perwerde dekat û le pê naw berjewendîyekani xoy bekaryan dehênê. Le dû romanî berbas da, qursayî îdeolojî û dewrî dezga îdeolojîkekan le pêvajoy çêkirdinî sûjey destajoy zimanî da berçawe. Dezga îdeolojîke çalakekanî em pêvajoye birîtîn le, dezgay ayînî û fêrkarî û mabât û zor car damûdeygay ser be mîdiya wekû têlêvîzyon jî debête yarmetîder û tewawkeryan. Em dezga û damezrawane, her kameyan be corêk be dewletewe girê dirawin û be mebestî bilawkirdinewe û cêxistinî îdeolojîyê zê le zeynî sûjekan da û le pê naw berhemhênanewey rewşî dasepaw û parastinî berjewendîyekani çînî serdest, baştirîn dewr degêin. Diyardeyek ke le her dû romaneke da, be toxî rengî dawetewe, bekarhênanî serkutî fizîkî ye le layen sê dezgay îdeolojîkî berbasewe. Em dezgayane bo pêxistinî siyasatî dije zimanî, hawkat legel lêpêçînewey takekanî jêr destyan û besûjekirdinyan, hawşewey dezgay serkutî dewlet, tundûtîjîyê bekar dehênin û be guşarxistine ser sûje serbizêwekan, hewî destemokirdinyan deden. Hêlêkewt û helwêstî bawikî Hejîr, Axey Serçîşmey beîweber le *Gabo* da û bawik, mam, Elî Osmanî qutabîy û melayanî handerî û her wehaş mamosta û beîweberanî debistanekey Sertac, le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da, nimûney berçawî em diyardeye n.

Îdeolojîyê ayînî, be taybet le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da, zor zê e. Be witey Althusser (1971: 102), kilêse û binemale, behêztirîn dezgayên îdeolojîkî serdemî derebegayetî Ewropa bûne û êsta kilêse şîwênî xoy dawete dezgay fêrkarî. Em riwangeye, be serincdan be dewrî ayîn le Rojhelatî nawîn û lewane Kurdistan û her weha lem dû deqes da, legel waqî'î em nawçeye nayêtewe û dezgay ayînî hêsta zortirîn bandorî heye. Elbet paş zalbûnî radyo û têlêvîzyon û mîdiya be giştî, îdekanî girêdirawî ayîn, ziyatir le rêy em dezgagewe be naw xek da bilaw debînewe û lêpêçînewey sûjekan nek le rêy bilîndgoy mizgewtewe, belkû le rêy dengbere giştîyekanewe ser be nêw hemû malan da dekat. Belam sereray em goiane, mizgewt hêstaş her dewrî xoy degêit; bo nimûne, kokirdinewey xekî Hezex bo seyrkirdinî termî şevanan û gwêgirtin le witekanî fermandey hêzî esker û şaredar, be hoy bilîndgo û melay mizgewtî ewêwe, hêmayekî aşkiray karîgerîyê em dezgaye ye

Ayîn, tenanet dezgakanî tirî wek xwêndîngeşî xistûwete jêr rikêfî xoy. Em rewşê le medresey 'Îmam Xetîb'î şîwênî îşî Sertac da debînrêt û wek dezanîn, le xwêndîngakanî Êranîş da zor berçawe. Bandorî lêpêçînewekanî em dezga îdeolojîke, le nawî Erebi û Îslamîy mindalan le her dû romaneke da û be taybet le çêkirdinî serkewtûwaney sûjeyekî mêşktenrawî wek Elî

Osmanî bikujî Sertac da be rûnî derkewtûwe. Eger çî Althusser pêy wa ye le serdemî modêrn da, dezgay fêrkarî cêy kilêsey girtûwetewe, belam Rojhelatî nawîn rewî goianî hizrîy Rojaway be xoyewe nedîwe. Êre hemû qonaxekanî nebiîwe û ewey hatote berhem, têkeleyek e le sîstemî kon û niwê; wate sîstemêk le zeynîyet, eqlanîyet û nawaxin da paşkewtû, belam le riwalet û qaploxêkî niwê da. Detwanîn bilêyn, be pêçewaney Rojava ke perwerde cêy kilêsey pişkirdotewe, lem devere û be taybet le Êran da, perwerde çûwete bin 'ebay ayînewe û le jêr çawdêrîy em dezga behêz û piîlayengire da karekanî têdepeîênêt.

Malbat wek yekem dezgay çêkerî sûje û bawik û dayik wek yekemîn cêbecêkaranî îdeolojîy zal, bê ewey hestî pê bikirêt, le pênew berhemhênanewey barûdoxî dasepaw da baştirîn raje pêşkeş deken. Deselat le rêgay îdeolojîyewe be qûlayî komele da rodeçêt û hemûwan dekat be endamî karay pêvajoy milkeçî, wehayan lê dekat nek her bindestî û çewsanewe û koyletîy xoyan bipejrênin, tenanet be demargirîşewe geşey pê biden. Le serdemanî pêşû da, dezgay here girîng û karîgerî deselat bo kontrolî sûjekan, dezgay ayînî û şiwêne ayînîyekan bûn. Em dezgaye be lêpêçînewe û bangkirdinî endame deselatdarekanî nêw binemale, wate piyawan, mafi çewsandînewe û bekoylekirdinî pê dawin û emeş bo xoy bûwete hoy cêgîrbûnî zeynîyetî serdest-bindest her le biçûktirîn yekey komelayetîyewe heta gewretirînyan. Em zeynîyete, ke hemû endamanî binemale be piyaw û jin û mindalewe pejrاندûyane û berdewam berhemî dehênnewe, dirêjey be helûmercî dasepaw dawê û herdem misogertirî kirdûwe. Le romanekan da em helûmerce le helsûkewtî bawikî Sertac û Yasemîn û Hejîr û endamanî tirî her sê xêzan da debînrêt.

Henûke rewş gelêk ciyawaze û be hoy pêşkewtinî teknolojîyewe, amrazekanî dewlet bo kontrolî endamanî xêzan gelêk ziyatir û behêztire. Le cîhanî emîo da, be hatine meydanî radyo, tîlêvîzyon, setelayt, întêrnêt û toie komelayetîyekan, îdeolojî zor sanatir û berbilawtir xoy dexzênête nêw malanewe. Tîlêvîzyon, be serincdan bewey le hemû malêk da heye, wek amrazî bangeşe û pişangay piîbîner û karîgerî îdeolojî kar dekat; sindûqêkî efsûnawî ye ke erkî lêpêçînewey dezga îdeolojîkekanî dîkey wek mizgewt û qutabxaneşî sanatir kirdûwetewe û îdeolojîy zalî seqamgirtûy nêw binemale be baştirîn şêwe berhem dehênêtewe. Em dezga îdeolojîke, karîgertirîn keriste û zortirîn derfetî bo belarêdabirdinî xelkî le ber dest da ye û berdewam be hoy bername rengamekanîyewe doxî dasepaw berhem dehênêtewe. Serqalbûnî mindalan be dû tîmî fûtbalî pêtextî Êran (Istiqlal û Pêrspolîs) û hogirîy leiadebederî xelk bo



zincîrey “Oşîn” le *Gaboî* da, selmênerî em nêrîne ye. Le romanekey tirîş da, detwanîn amaje bo zeynî be îdeolojî teşegirtûy Merasîm bikeyn ke rewşî dasepawî Bakûr, rêk wek mîdiyakanî ser be deselat rave dekat û hemû tawanekan dexate estoy “terorîstan”, ke le rastî da Kurdanî bêmafkiraw in.

Dezgay dîkey perepêderî îdeolojîy zal xwêndinge ye. Bîrewerîy serdemî xwêndinî kesayetîye serekîyekanî em romangele, girêdirawî zimanî serdestî “Ali gel, Ali koş” (Alî were, Alî baz de) û “Çûpan Dirûxgû” (Şiwanî Dirozîn) û “Kewkeb Xanm”î nêw kitêbekan dasepênrawekane. Qutabxane, le ber ewey sûjekanî mindalan in û be dirêjayî çendîn sal deselatî be seryanewe heye, zortirîn keriste û helî cêxistinî îdeolojîy zalî le ber dest da ye. Karbedestanî xwêndinge le her dû roman da niwênerî deselatî çewsêner û şiwênî temêkirdin û wek zîndan wa ye, beîweber û mamostakan jî wek serokzîndan le hemû hêskewtî mindalan agadarin û wek motekey toqênerî xwêndkaran derkewtûn. Cêbecêkaranî îdeolojî lem dezgaye da, her katêk netwanin roî xoyan le pêvajoy çêkirdinî sûjey baş da, be başî bigêin, hêskewtî tundûtîjane denwênin; wek çon le reftarî beîweberî qutabxanekey Kerîm û Hejîr da we ber çaw dekwêt. Dezgay îdeolojîkî xwêndinge, le hawsazîy lege! dewlet da, hemîşe amadey dabînkirdinî sûjey pêwîst bo beîweçûnî rêûiesme dewletîyekan e; Sertac le mawey xwêndin da, wek hemû xwendekarên din, alay pê heldegîrê, sirûdî neteweyî pê dexwênrê, be zoremlî bo cejin û rêûiesm û xopîşandan û rêpêwanekan û tenanet seyrî termî şerîvanan debirê. Em dezgaye, mindalanî netewey bindest wek kemîneyekî diwakewtû debînê ke bo pêşkewtin debêt waz le ziman û çandî xo bihênin û fêrî jîyanî şaristanî bibin. Em têwanîne le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da zor berçawe.

Ew takaney gwê be lêpêçînewekanî dezga îdeolojîkekan naden û nabine sûjey destajoy îdeolojîy zal, be şewey ciyaciya hêrişyan dekirête ser. Bo em mebeste, bêcge le destêwerdanî dezgay serkut, sûjey hêszarawî dezgakanî dîkeş asteng dexene ser rêgey sûje serbizêwekan û têdekoşin waney milkeçîyan fêr biken. Sûje destajoye dijberekanî palewanî goiepanîy îdeolojîy romanî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, hendêkyan bê ewey xoyan bizanin, le pê naw berjewendîyekanî çînî deselatdar û demargirîjtir le ewan, beşdarîy le berhêmhênanewey îdeolojî da deken. Ewan rewşî amade be siruştî û rewa dezanin û be tundî rûbeûy ew sûjane debînewe ke normekanî reçaw naken. Yasemîn û Sertac le ber famkirdinî pêwendî çewsêneraney nêwan dû çînî dijber, hewî hoşyarkirdinewey endamanî xêzan û kesanî dewrûberyan deden; belam

serkewtin bedest nahênin. Destkewtî Sertac, le layekewe, destbeserkiran û eşkencey dezgay serkutî dewlet û le layekî tirewe, dijayetî û dujminayetiye sêje destajokan, têkçûnî derûnî û tûşbûn be şîzofêrnya bû û le kotayî da be destî qutabîyekî xoy, ke sêjeyekî hêlsazrawî dezgay îdeolojîkî ayîn e dekujrêt. Palewananî *Gaboîş*, be heman şêwe le layen sêje destemo û tirsênrawekanî ser be dezgay fêrkarî û malbat tûşî kêşe debîn û le tirsî dezgay serkutî dewlet, be naçar rû le sinûr deken. Bawik û dayikî Kerîm, le ber tirsî ledestçûnî em kuîşyan û dayik û bawikî Hejîr jî hem le ber tirs û hem le bin bandorî îdeolojîyê zala da dijayetîyê fêrbûn û xwêndinewey Kurdî deken.

Tawtwêy helwêst û hêlsûkewtî kesayetiyeke derîdexat ke dewlet bo besûjekirdinî takekan, her dû dezgay serkut û îdeolojî bekar dehênêt. Dezgay serkut, be bekarhênanî hêzî serbazî û toqandinî takekan, sêjey gwêlayelî xoy çê dekat. Lêre da mebest ewe ye ke hoy serekî serdanewandinî em takane bo siyasetî serkutî zimanîyê dewlet, tirs e; egîna derbazbûn le dawî îdeolojî gelêk esteme. Em kesane baweyan be rewabûnî dewlet nîye, belam le tirsî kardanewey dezgay serkut, milkeçî xwastî deselatdaran debîn; bawik û dayikî Kerîm, dayikî Hejîr û dayikî Yasemîn nimûney em core sêjeye n. Sêjey corî dûwem, derkewtey dû hêzî serkut û îdeolojî ye. Em sêjane, wêlay tirs û toqîn, ra û riwangeyan le bin bandorî îdeolojîyê zala da ye; keçî xoyan be xawen biyar û azad debînin; Mîrza Hadî û bawik û dayikî Sertac dekewine nêw em baznewe. Corî sêyem, ew sêjane n ke mêşkiyan be tewawetî be îdeolojî tenraw e û wite û têwanîn û baweyan bo diyarde û rûdawekanî dewrûber, her ewe ye ke çînî deselatdarî xawen berjewendî heyane. Emane sêjey destajo û xapênraw in û azadane pêvajoy milkeçîyan têpeîandûwe, hawdestî çewsandinewey xoyan in û kontrolyan be destî dezga îdeolojîkekanewe ye; Elî Osman û Merasîm baştirîn nimûney lem çeşne n. Em sê cor sêjeye, her kamyân be pêy bîr û bawî û radey kartêkerîyê îdeolojî, debîne dujminî sêje serbizêwekan û lemper dexene ber pêyan. Sêjegelî nawbiraw, be pêçewaney ewanî dî, milkeçî û serşoî napejrênin û le hember hêzî serkut û îdeolojîyê deselat da, rêy berxodan heldebjêrin. Serlehengî her dû roman, Yasemîn, Mihemed û Ce'ferî xaloy Sertac û Hejîr û Kake Cemaî biragewrey Kerîm nimûney sêjey destemonekiraw in.

Dû romanî berbas, ciya le em xale hawbeşane, hendêk ciyawazîşyan le nêwan da heye, ke lêre da deyanvrûjênîn. Wek bas kira, serekwatay her dû romaneke pirsî ziman e û ew rehendey zimanîş ke cextî ziyatirî le ser kirawetewe, zimanî nivîskî ye û kelkeley kesayetiye serekîyeke jî berhem û kitêbî Kurdî ye. Le *Gaboî* da, be serincdan be nebûnî kosp û tengeje le berdem axaftinî Kurdî da, kêşe û kelkeley palewanekan, hêjêmonîyê zimanî Farsî û tengetawîyê zimanî dayikîyan

nîye; boye be diway babete bivekiraweke, wate pirtûkî Kurdî, dekewin. Belam le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da, sereîay zalbûnî zimanî serdest û siînewey zimanî Kurdî le subjêktîvîtey zorbey sêjekan da, ewey serleheng mişûrî dexwat, hejarîy kitêbxaney Kurdî ye. Lem rûweşewe, ciyawazîyekî berçaw le nêwan her dû deq û hezî kesayetîye serekîyekan da debînret, ke ewîş zalêtîy janrî edebî ye. Le *Gabo* da keşî zal, ziyatir şî'r û be taybet şî'rî berengarî û handerane ye û kesayetîyekan berewîy berhemî Hêmin, Hejar, Awat, Celal Melekşa, Şerîf û Peşew debinewe. Keçî, keşî zalî deqekey tir û kelkeley Sertac, edebî çîrokî Kurdî û xoşewîstîy Erebe Şemo ye û nawbiraw bo her kwê deîwat romanêkî ewî lege da ye. Serleheng bo xoyşî be nûsînî çîrokewe mijûl e; çîrokî jîyanî xoy û awate wedînehatûwekanî, ke le rastî da jîyan û awatî gelekey in. Ke wa bû, lem romane da, ewey rawestey le ser dekirêt deqî gêaneweyî ye; deqêk bo gêanewey waqîî komege, be hemû çermeserî û nalebarîyekanîyewe û bo gwastinewey goşenîgay netewey jêrdest û be mebestî berengarbûnewey gutarî zalî serdest; be watayekî tir, wesfî asoyî dekirête keristey berperçdanewey wesfî estûnî dewlet û deselat.

Le pêwendî lege helwêstî kesayetîyekan le meî zimanî dayikîyan, berawirdî deqekan eweman bo rûn dekatewe ke serkutî petî nabête heîşey cidîy le ser ziman; belkû ew moteke metirsîdarey detwanêt pêvajoy perawêzxistinî ziman serkewtûwane ser bixat û tenanet sêje berkewtûwekanîş bikate dardest, îdeolojî ye. Elbet serkut û îdeolojî aweldûwaney xêzanêk in be naw dewlet û herdem kemayesîyekanî yekdî qerebû dekenewe. Detwanîn em hevokey Foucault ke delêt, “le her kwê hêz û deselat hebêt, berxodan jî heye”, le pêwendî lege pirsî ziman lem dû deqe da bem şeweye dabiêjînewe û biêyn: Le her kwê tundûtîjîy rastewxo û fizîkîy dezgay serkutî dewlet le goîe da bêt, berxodan ziyatir e; keçî le beramber hêzî hizirkuj û belaiêdaberî îdeolojî da, zorîney zorî sêjekan nek her xo bedestewe deden, debine hawdestîşî. Siyasetî dewlet le *Gabo* da, ziyatir be pêy serkut e; boye, berengarî berçawtire. Le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da, eger çî serkutî rastewxoş le arada ye, belam ew hêzey be şewey şarawe û hestpênekiraw be naxî komege da roçûwe û be bê berengarbûnewe, zimanî gelî perawêz xistûwe îdeolojî ye. Be watayekî tir, deselat sereta be hêzî serkut û paşan be kelkwegirtin le her dû dezga, pêvajoy zimankujîy serxistûwe û êsta le rêy dezga îdeolojîkekanewe hênde sêjey başî zimanîy çê kirdûwe, bo xoyan rewteke dirêje pê deden.

Le *Gabo* da, îdeolojîy berey dijber bo zimanparêzî le rojev da ye û xawen hêz û bandore. Wate, le beramber îdeolojîy zalî dasepawî Farsî ke le rêgey dezgay îdeolojîkî xwêndinge, mîdiya

û edebiyatî serdestewe berdewam be naw gel da bilaw debêtewe û sêjesazî dekat, sêje zimanparêzekan jî banghêşt bo îdeolojîy xoyan deken. Nûsîn û leçapdanî kitêbî Kurdî û bilawkirdineweyan be şêwey nihênî, bekarhênanî berbilawî nawî Kurdî, agadarkirdinewey Ebdulmutelîb le nasnamey serekîy xoy le layen hawîy mamostakeyewe û le nêw diî dezgay fêrkari da, giştîgîrbûnî axaftinî Kurdî, tenanet le xwêndinga û le layen beîweberîşewe û her weha Kurdî qisekirdinî nene pîrozî azerî, nîşanegelî berçawî em rastîye n. Detwanîn bilêyn zimanî zalî sêjekan lem deqe da Kurdî ye. Belam le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* da pêçewanekey debînîn û nek her zimanî zalî damezrawekanî ser be dewlet, tenanet zimanî bazaî û nêw xêzanîş Turkî ye. Lem deqe da, îdeolojîy zimankujî, zal û piçek e û îdeolojî zimanparêzî lawaz û bêdeselat e û rengdanewey tenya le helwêstekanî Sertac û Yasemîn da derkewtûn. Ewan, wek dû sêjey hoşyar û destajonekiraw, têdekoşin perdey reşîy îdeolojî le pêş çawî sêje xapênrawekan la biden, belam tenya û bê piştîwan in û le beramber îdeolojîy zalî zimanî û nezani û tenanet dijayetîy sêjekan da çi akamêk we dest nahênin û ewey boyan demênêtewe tûeyî, nahumêdî û doiane. Her bem pêye, deqî berbas be amancî leqawdanî layene şarawekanî paktawî zimanî ke le layen dezga îdeolojîkekanewe beîwe deçêt, nûsrawe; wate be serincdan be rewşî Bakûr û pişmarîy sêjey zimanî, le metirsîye gewrekey ewê dedwêt. Belam le *Gaboî* da ew sêje zimanîyane çê nebûne û heîşey serekîy le ser ziman, her qedexey zimanî nivîskîy Kurdî ye. Le rastî da, deselatî Turkiya le sazîkirdinî sêjey zimanî da, piştî qonaxî serkutkarî, qonaxî îdeolojî û besêjekirdinî be serkewtûyî tîpeîandûwe û em rastîye le romaneke da rengî dawetewe. Keçî le şîwênî rûdawekanî romanekey tir da, dewlet le qonaxî yekem da ye û xelk nebûnete sêjey destajoy zimanî; eger çî rewşî zimanî Kurdî le şarekanî wek Kirmaşan da ciyawaze û dewlet îdeolojîy zimanîy xoy be başî serxistûwe.

Be giştî, keşî zalî romanî *Gaboî*, serkutî fîzîkî û lêpêçînewey dezgay îdeolojîkî xêzan û xwêndinge û le beramber da, hoşyarîy zimanî û şoiş bawêî û milnedan û serheldanî sêje serbizêwekane. Keşî zalî *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* jî, cêgîrbûnî îdeolojî zal le bin bandorî dezgayên serkut û îdeolojîk, çewaşekarî û çawbestkirdin be hoy dezgay ayînî, fêrkari û malbatewe ye û le beramber da, kelkeley zimanparêzî û kolnedan û berxodanî sêjeyekî tenyay bin berdaşî zimankujî û doianî berdewam û nahumêdîyetî le şoiş. Sertac sereta deyewêt le rêgay şoiş û îdeolojîy dijberaneewe rûbeîy îdeolojîy zal bêtewe û amancekanî le pê naw dewlemendkirdinî kitêbxaney Kurdî, wedî bîne, belam hîçî bo desteber nabêt. Keçî le *Gaboî* da, şoiş wek rêgay geyîştin be amanc wêna kirawe û serleheng paş kewtinerber heîşey dezgay

serkut, tenya rêy berdewamî û têkoşanî, desthelgirtin le xebatî şar û hebijardinî xebatî şax. Le *Gaboî* da, gêianewey hawterîbî kuştarga û serbiînî ga û gwêlkekan be destî Seyide Sûrî sellax, dîsan selmênerî keşî tejî le tundûtîjîy fizîkîy şiwên-katî deqeke ye. Wate, le rastî da, em dû gêianeweye basî barûhelûmdoxêk deken ke têy da bindestan sellaxî dekirên; le kotayîş da cwanega bedemaxe zelamekey bin çeqoy Seyide Sûr û Hejîr û Kerîmî ber heşey çek û çekdar û sêdare û bendîxane, serheldeden û zincîrî koyletî deqirtênin û heldên. Le deqekey tirîş da, rewş û witekanî “Pîra Na”, bûnewerêkî derasayî ke nawe nawe be deng û le kotayî da be ceste derdekewêt, amajeyekî rastewxo ye be barûdaxî naxoş û nalebarî û bînpêkirawî Kurdistan; ew katey le riwaletî pîrejnêkî qîêj da legel Sertac da debête şeicnêw û demeqreyan, pêy delêt: “Ez dapîra te me. ... Ez dya te me. ... Ez welatê te yê kavihbûyî me Ez şoreşa we ya têkçûyî me” (Ozmen, 2010: 139).

Ciyawazîyekî dîkey em dû deqe, le çalakîy dezga îdeolojîkekan da rengî dawetewe; le *Gaboî* da, rengdanewey dezgay ayînî be berawird legel binemale û xwêndinge da keme û tenanet Mîrza Hadî ke pêdagirîy le ser nawî “Ebdulmutelîb” dekat, wek sûjeyekî mêşktenrawî ayînî wêna nekirawe. Be giştî, lem deqe da, dezgay ayînî le çekirdinî sûjey gwêlemist da zor çalak nîye; keçî le deqe Kurmancîyeke da, dezgay îdeolojîkî ayînî le karîgertirîn amrazekanî çawbestkirdin e û zortirîn kêşe bo serlehengî roman dirust dekat. Sertac ziman û wêjey Kurdîy gelêk bo girîng e û her weha hogirî bîrî çep e û le jêr rûnakîy ew kitêbaney xwêndûnyetewe, le pêwendîe çewsênerane û nadadperweranekanî nêwan dû çînî serdest û bindest degat; boye mil be lêpêçînewey dezgay pîlayengirî ayînî nadat. Em helwêstey nawbiraw, be serincdan bewey bo xoy mamostay xwêndingeyekî ayînî ye, dijayetîy tundî sûje ayînîyekanî lê dekewêtewe û le kotayî da giyanî le ser dadenêt. Ke wa bû, debînîn ke henûkeş dewlet le em dezgaye û sûje hêlsazrawekanî bo geyîştin be amancekanî zortirîn kelk debînêt û be şeweyekî xurt piştîwanîyan dekat. Hawolîy netewey serdest û bindest, detwanêt bibête derfetêkî baş bo deselat, ta bitwanêt zûtir amancekanî bipêkêt. Em rastîye sebarete be Kurdanî Bakûr berçawe û zalêtîy ayîn le Kurdistan; qazancî deselatî lê kewtûwetewe û wek dezanîn le hebijardinekan da hîzbî serdest em hele be baştîn şewe deqozêtewe. Rewşî Kurdanî beşî Rojavaî Kurdistanî bin destî Êranîş, nimûneyekî başî em doxe ye; wek dezanrêt, xelkî hendê le şarekan, be taybet Kirmaşan, le barî zimanîyewe ta radeyekî zor kewtûnete bin bandorî lêpêçînewey dezga îdeolojîkekan û le bîînî zimanî zarokên xo da çalakane beşdar in. Ke wa bû, detwanîn bilêyn ayînzay ciyawaz detwanêt wek amrazêkî bergirî bêt le beramber deselat da û asteng bixate ser rêy rewî paktawîy zimanî,

wek çon le beşî serûy Rojhelatî Kurdistan da we ber çaw dekwet.

Her wek le deqî romane Kurmancîyekeş da xuya ye, pêvajoy perawêzxistinî zimanî Kurdî le Bakûr da be berawird lege Rojhelatî Kurdistan serkewtûtir bûwe. Em rastîye tale detwanêt çendîn hokarî hebêt û pêwîst e le riwange û ciyaciya lêy bikolrêtewe. Belam ewey zor berçawe, pêdagirîy qurs bûwe le ser paktawîy zimanî. Le çîwarçêwey Turkiya da, her le salî 1923ewe ta salanî kotayî sedey bîstem haşa le bûnî Kurdan kirawe û naw û nasname û nîştîman û zimanyan le qamûsî siyasî û ferhengî wîlat da reş kirabûwewe. Em dijayetîye lew aste da bûwe ke tenanet axaftinî nêw mal û kolan û bazîfş qedexê bû û sizay qanûnîy le ser danirabû. Em siyasete zimanîye ke sereta be serkutî dasepawe, diwayî be hoy îdeolojîyewe cêgîr kirawe û le layen dezga îdeolojîkekanewe berdewam berhem hatûwetewe, heta be em akame tale geştûwe. Le Êran da, eger çî siyasatî Farsî tewerî û perawêzxistinî zimanekanî tir, beîewe çûwe, belam dijayetîy zimanekan nebûwete qanûn û tundûtîjîy dewletî be şêwey rêkxiraw le dijî zimanî axaftin pêiew nekirawe. Be witey Metîn, “le Êran da, be hoy dewlemendî û mêjînebûnî ziman û ferhengî Farsî, pêwîst be pêdagirîy resmî û stratêjîk le ser ‘xenophobia’ yan ‘lewîdî toqawî’ le gutarî nasîyonalîzmî Êranî da, bew corey le Rûsya, Elman û Turkiya rûy da, nekira” (“Nasîyonalîzmî Êranî û Mafî Çarey Xo Nûsînî Netewî”, 2013). Em ciyawazîy helûmerce, be dîniyayîyewe, karîgerîy le ser barûdoxeke danawe, belam natwanêt tenya hokar bêt.

le encam da, pêwîst e pence le ser em rastîye dabînirêt ke, eger çî le her dû romaneke da, sêje zimanparêzekan le nêw gelêk sêje destajoy zimanî da gemaro dirawin û be şêwey ciyaciya berewîy hêrişî her dû dezgay serkut û îdeolojîkî dewlet debinewe, belam serheldanî em take serbizêw û serberzane, sîtavêk e le nêw tarîkistanî serkut û îdeolojîy zimankujî da. Serlehengî *Gaboî*, sereîay hêlûkewtî tundûtîjî sêje hêlûzrawekanî malbat û qutabxane û le jêr çepokî qusî serkut da, nasnamey xoy dedozêtewe û lege hawîêkey da, be fêrbûnî zimanî dayikî û xwêndinewey berhemî şaîranî nîştîmanperwer, siyasatî çend salep sepandinî zimanî deselat le ser xoyan pûçel dekenewe. Le kotayîş da, sereîay ewey wek dû sêje naferman, be tawanî milkeçnebûn dekwine ber şalawî heîşe, desthelgîrî amanc nabin û rêgey xebat degirneber. Le *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* jî, palewanî roman le bin tewijmî tundî zimankujî da û wek takêkî tenyay nêw gelêk sêje çawbestkirawî dezgay ayînî û malbat û mîdiya û xwêndinge, serheldedat û be girîngîdan be edebî modêrnî Kurdî û berhemhênanî çîrok be zimanî xoy, hewî rizgarkirdinî kitêbxaney hejarî Kurdî dedat; keçî le encam da be hoy qolbestkiran û eşkencey dezgay serkut û

azarî derûnîy sêjekanî dewrûberyewe tûşî şîzofêrnya debêt û le kotayî da, be destî sêjeyekî destajoy dezgay ayîn dête kuştin. Serlehengî em deqe, eger çî serî le rêy amanc da deçêt, belam Elî Osmanî xwêndkar û dostî caran û bikujî êstay, le bin bandorî bîr û biîway ew da, temî îdeolojîy pêş çawî deîewêtewe û rûy reş û qîêjî handeranî bo aşkira debêt. Peşîmanî û têgeyiştinî nawbiraw, nîşaney berdewamîy bîrî berhelistkaraney Sertac û nekujanewey pişkoy berxodan e.

Le kotayî da, be mebestî lêkolînewey ziyatir le ser pîrsgirêkî pêwendîdar hendêk pêşniyar arastey twêjeran dekeyn. *Gaboî û Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*, be serincdan be awîrdaneweyan le pîrsî nasname û ziman û pêwendî navberî deselatî baladest û netewey Kurd, dekirêt le goşenîgay tirewe û be pêy riwange û çemkî rexneyî dîkeş bixwênrênewe. Twêjeranî em biware detwanin deqên berbas be piştbestin be teorî û boçûnên rexneyî wek derûnşîkarî, paşpêkhatexwazî, paş kolonyalîzim û fêmênîzim rave biken. Her wehaş, çemke rexneyîyekanî ‘Hêz/Deselat’î Foucault, ‘Hegemony’î Gramsci û ‘Habitus’î Bourdieu bo em mebeste guncaw in. Xwêndinewey dû romanî berbas be gwêrey teorîy rexneyî Althusser û çemkekanî, le pêwendî lege karîgerîy îdeolojî û pêvajoy lêpêçînewe û besûjebûn da, selmênerî şiyawbûnî em boçûne bo lêkolînewey hawşêwe ye. Ke wa bû, detwanîn em çemkane bikeyne keristey xwêndinewey romangelî tir, be taybet ewaney pîrsî hawşêweyan wirûjandûwe. Lêkolêran bo em mebeste detwanin le romanekanî *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* berhemî Mehmed Uzun, *Gulî Şoran* nûsînî Eta Nehayî, *Êwarey Perwaney Bakhtiar* Elî, *Hesar û Segekanî Bawikim* nûsînî Şêrzad Hesên, *Labîrenta Cinan* berhemî Hesênê Metê, *Kobanê* nûsînî Jan Dost û htd. kelk weribgrin.

## ÇAVKANÎ

### Kitêb û Witar:

Acar, Hayrullah. “Di Serdema Komara Tirkîyê Rewşa Kovarên Kurdî”. Le *Komele Witarî Yekemîn Koî Nêwneteweyî Edebî Kurdî*. Sine: Zanistgey Kurdistan, Twêjîngey Ziman û Edebî Kurdî, 2010.

Alan, Remezan & Ergîn Opengîn. *Tîr û Armanç: Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*. Stenbol: Peywend, 2014.

Althusser, Louis. “Ideology and State Ideological Apparatus” in *Lenin and Philosophy and Other Essays*. Trans. Ben Brewster. New York: Monthly Review Press, 1971.

---. “Is it Simple to be a Marxist in Philosophy?” in *Essays in self-criticism*. Translated by Grahame Lock. NLB, 1976. (Pdf version by [malst@abv.bg](mailto:malst@abv.bg), March 2006)

---. *Êlm u Ideolojî*. Vekolîn û Helbijardin û Wergêranî Mecîd Mededî. Tehran: Nîlûfer, 2017.

Badiou, Alain. “Althusser: Sûbjektîvîteyê Bêdûnê Sûjê”. Wergêranî Saleh Necefî. Le *Badiou: Felsefê-Siyaset-Huner-’êşq*. Helbijardin û Wergêranî Murad Ferhadpûr, Saleh Necefî û Elî Ebasbeygî. Tehran: Ruxdadê New, 2009.

Barak, Weysî. “Siyasetên Zimannasîyê û Kurdî”. Le komele witarî *Konferansali ser Zimanê Kurdî*. Cologne: Weşanên Komkar, 2002, rr. 62-87.

Bertens, Johannes Willem. *Nezeryeyê Edebî*. Wergêranî Ferzan Sucûdî. Tehran: Ahengê Dîger, 2003.

Bourdieu, Pierre. *Derbareyê Television u Sulteyê Journalism*. Wergêranî Nasêr Fekûhî. Tehran: Aşîyan, 2008.

Çîçek, Cuma. *Zimanek Çima Tê Qedexekirin?: Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkîyeyê ji Înkare Ber bi Nasînê*. Stenbol: Peywend, 2013.

Debaxî, Şehla. “He|weşandinewey Gabo”. ?, 2019. (pdf)

Ehmedzade, Haşim. “Romanî Kurdî le Kurdistanî Êran”. Wergêranî Ebdulxaliq Yeqûbî. Govarî *Raman*, j. 107 (Nîsanî 2006), rr. 78-88.

---. *Cîhanî Roman*. Silêmanî: Endêşe, 2015.

---. “Roman û Riwange”. *Sêberî Zindûy Nûsîn: Komelêk Witar le ser Romanî Gabo*. Seqiz: Gutar, 2018a.



---. *Ez Roman ta Mellet (Nation and Novel)*. Wergêranî Bakhtiar Sadjadi. Çapî dûwem. Seqiz: Gutar, 2018b.

Ferretter, Luke. *Louis Althusser*. Wergêranî Emîr Ehmedî Aryan. Çapî dûwem. Tehran: Neşrê Merkez, 2013.

Guler, Emîn. *Karakter di Romana Kurmancî de: Girê Şêran, Mirina Bêsi, Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî, Qerebafon, Sobarto*. Teza Lîsansa Bilind bi şêwirmendiya Prof. Dr. Abdurrahman Adak, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, 2019.

Hassanpour, Amir. *Nationalism and Language in Kurdistan 1918-1985*. San Francisco: Mellen Research University Press, 1992.

---. "Language Rights in the Emerging World Linguistic Order: The State, the Market and Communication Technologies". In Miklos Kontra, Robert Philipson, et al (eds.), *Language: A Right and a Resource, Approaching Linguistic Human Rights*, Central European University Press, 1999, pp. 225-241.

Hidayetî, Seyid Qadir. *Gabo*. Çapî sêyem. Seqiz: Gutar, 2019.

Kelan, Emîr. *Kê le Flrkarîy Çendzimane Detirsêt? (Çe Kesî ez Amûzêşê Çendzebanê Mîherased?)*. Gotûbêj legel Tuwe Askutnab-Kangas, Jim Cummins, Ajit Mohanty û Stephen Bahry le ser Êran û Hendêk Wilatî din. 2018. (Be şêwey faylî pdf le ser internet bilaw bûwetewe)

Klages, Mary. *Dersnameyê Nezeryeyê Edebî*. Wergêranî Celal Suxenver, Êlahê Dêhnevî û Se'îdSebzyan. Çapî dûwem. Tehran: Neşrê Exteran, 2015.

Malmisaniy, M. *The Past and the Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey*. Next Page Foundation, 2006.

Metîn, Kameran. "Nasionalismî Êranî û Mafî Çarey Xo Nûsînî Netewî" (Nasionalism Îranî û Heqê Te'înê Sernêvêşt Mêlî). Malperî BBC Farsî (14/ 03/ 2013) ( Niha le ser malperî baskiraw la birawe û nûser bo xoy be şêwey pdf bilawî kirdûwetewe)

Miller, Peter. *Sûje, Êstîla u Qudret*. Wergêranî Nîkû Serxuş û Efşîn Cehandîde. Tehran: Neşrê Ney, 2009.

Nawxoş, Selam. "Linguicide û Diyalêktî Kirmancî Bakûr le Qonaxî Kolonyalewe". Govarî *Raman*, j. 250 (5/ 3/ 2018), rr. 109-115.

Nehayî, Eta. *Gulî Şoran*. Bane: Mang, 2015.

Ozmen, Şener. *Pêşbaziya Cîrokên Neqediyayî*. Stenbol: Lîs, 2010.

Payne, Michel. *Barthes, Foucault, Althusser*. Wergêranî Peyam Yezdancû. Tehran: Neşrê Merkez, 2000.

Polat, Kazim. *Êşa Zimanê Min*. Stenbol: Şemal, 2015.

Sadjadi, Bakhtiar. *The Lacanian-Althusserian Dialectic: Theoretical Problems and Premises in Invesigating the Subject's Identity*. Saarbrucken: Lambert, 2012.

---. "Xudî Aydiolocîk Wek Berêweberî Nasname". *Govarî Bîr û Hizir*, s. 1, j. 1(Xakelêwey 2016), rr. 97-100.

---. "Subjêktîvîte le Nêwan Îpêfênî û Sinûrekan da". *Sêberî Zîndûy Nûsîn: Komelek Witar le ser Romanî Gaboî*. Seqiz: Gutar, 2018a.

---. Ziman û Îdeolojî: Hevpeyvîn leger Dr. Bakhtiar Sadjadi. Amadekirdinî Saman Direfş. *Govarî Bîr û Hizir*, s. 4, j. 8&9 (Gulanî 2018b), rr. 106-115.

Sadjadi, Bakhtiar & Alireza Ahmadirad. "Subjectivity and Ideological Interpellation: An Althusserian Reading of Bozorg Alavi's *Her Eyes*". *International Journal of Applied linguistics & English Literature*, Volume 7, Issue 1 (January 05, 2018). Pp. 203-210.

Sadêqî, Emîr Huseyn. "Pêdersalarî der *Bamdadê Xumar* ba Tekyê ber Nezeryatê Althusser". *Pejûhêşê Zebanhayê Xarêcî*, j. 46 (Payîzî 2008), rr. 85-100.

Sefayî, Elî û Êlham Karger. "Berresîyê Guftêmanê Amûzêşî Dastanê "Lebxendê Enar" Hûşeng Muradî Kêrmanî ber Mebnayê Nezeryeyê Ideolojî Althusser". *Edeb u Zeban Zanistgey Bahuner Kêrman*, sal. 19, j. 40 (Payîz û zistanî 2016), rr. 436-42.

Seydo Aydogan, Îbrahîm. *Guman 2: Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*. Stenbol: Rûpel, 2014.

Tacbexş, Pervîn û Sumeyê Qaêmîpûr. "Berresîyê Dastanê "beçeyê Merdum" Celal Al Ehmed ber Mebnayê Nezeryeyê Ideolojî Althusser". *Edeb u Zeban Zanistgey Bahuner Kêrman*, sal. 17, j. 35 (behar û hawîn 2014), rr. 118-99.

Tyson, Lois. *Nezeryehayê Neqdê Edebîyê Mu'asêr*. Wergêranî Mazyar Huseynzade û Fatême Huseynî û pêdaçûnewey Dr. Huseyn Payende. Tehran: Nêgahê Êmrûz, 2015.

Weber, Max. *Êqtesad û Camê'e*. Wegêranî Ebas Menûçêhrî û Hawkaran. Tehran: semt, 2005.

## Malper:

Emcedî, Saman. "Çilon bû be *Gaboî*? (Şikirdinewey Romanî *Gaboî* be Xwêndinewey Teorî Gêfanewenasîy Roland Barthes)". <http://kurdishbookhouse.com/ku/100-53/> [11 March 2019]

Mentik, Heme. “Gemey Cênawekan le Romanê *Gaboî-î Seyid Qadir Hidayetî* da”.  
<http://azhans.krd/> [22 June 2019]

Sedir, Şadî. “Dêmkirasî ba Temamê Tebe'atê An: Der Neqdê Muxalêfanê Heqê Te'înê Sernêvêşt”. <http://www.tribun.one/teori-menu/teori-demokirati/2053-2014-06-04-13-33-11> [24 March 2019]

Semed, Xelîl. “*Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî*”.  
[http://www.amidakurd.net/ku/tekst/p%C3%AA%C5%9Fbaziya\\_%C3%A7%C3%AErok%C3%AAAn\\_neqediyay%C3%AE](http://www.amidakurd.net/ku/tekst/p%C3%AA%C5%9Fbaziya_%C3%A7%C3%AErok%C3%AAAn_neqediyay%C3%AE) [10 March 2019]

Şêr, Ferzan. “Çîrokên Şenêr Yên Neqediyayî”.  
[http://www.academia.edu/3363233/%C3%87%C3%AErok%C3%AAAn\\_%C5%9Een%C3%AAAr\\_Y%C3%AAAn\\_Neqediyay%C3%AE](http://www.academia.edu/3363233/%C3%87%C3%AErok%C3%AAAn_%C5%9Een%C3%AAAr_Y%C3%AAAn_Neqediyay%C3%AE) [14 March 2019]

Vural, Orhan. “*Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî û Şener Ozmen*”.  
<https://bendname.wordpress.com/2018/04/07/pesbaziya-ciroken-neqediyayi-u-sener-Ozmen/> [10 March 2019]

Zêdo, Çetoyê. “Notên ji *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî- Şener Ozmen*”  
<https://cetoyezedo.blogspot.com/2013/08/noten-ji-pesbaziya-ciroken-neqediyayi.html> [11 March 2019]



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**Louis Althusser’in Eleştirel Teorisi Bağlamında  
*Pêşbazîya Çîrokên Neqedîyayî ve Gabor* Adlı Romanlar**

Seyed Mazhar Ebrahimi

(17711011)

Doç. Dr. Hayrullah Acar - Doç. Dr. Seyed Bakhtiar Sadjadi

Mardin – 2019